


## Kürtçe Dil Dersleri

# ***DERSÊN ZMANÊ KURDÎ***

***Baran (Kemal Burkay)***



### **Xwendevanên delal, î**

Ev "Dersên Zmanê Kurdî" yek ji berhemên Kemal Burkay e. Berî sala 1980 li welat hatibû hazirkirin û cara pêşîn, li der welat di sala 1980 da dest pê kir û di Dengê KOMKAR da û bi navê "Baran" meh bi meh hat weşandin. Piştra di sala 1988 da di nav weşanên Roja Nû da wek kitêb çep bû. Piştî wê jî li «stambolê di nav Weşanên Deng da derket, eleqeyek mezin dît û giha çapa çaremîn. Nuha em van dersan di rûpela xwe ya înternetê da bi cî dikin, da ku Kurdên li çarkeşeyê dinyayê bikaribin jê feyde bistînin.

Gulan 2000

### **Sevgili okurlar,**

Burada sunduğumuz "Kürtçe Dil Dersleri" Kemal Burkay`ın ürünlerinden biridir ve daha 1980 yılı öncesi yurt içinde hazırlandı. İlk kez yurt dışında, 1980 yılından başlayarak Dengê KOMKAR da dizi halinde ve "Baran" adıyla yayınlandı. 1988 yılında ise Roja Nû Yayınları arasında kitap halinde basıldı.

Daha sonra ise İstanbul`da Deng Yayınları arasında yeni baskıları yapıldı.

Bu dersleri, okurlarımızın yararlanması için internet sayfamıza da koyduk. Onların Kürtçeyi öğrenmek ve geliştirmek isteyenlere yararlı olacağını umarız.

Mayıs 2000

## PÊŞGOTIN

Xwendevanên delal,  
Şerê çandî jî parçek ji şerê azadîyê ye. Dijminek mezin jî nezani ye. Heke dijmin firsend ne daye dibistanên me hebin, divê em wan bi xwe çêkin. Meriv ku bixwaze dikare di zîndana nêda jî hînbe. Berî her tiştî dikirin e, cehd e, qîret e.

Di emrê merivan da bo hînbûnê demek xweser (xusûsî) tune; zaro bin, xort bin, yan kal bin; jin bin yan mêr bin, sistîyê nekin û hînbîn. Hînbûn ronahîyek mezin e, we ji tarîyê xilas dike, dinêyek nu û delal li ber we vedike. Hînbûn di rîya azadî û rizgarîyê da we xwedî çek dike. Bo miletekî ji zanîne mezintir dewlemendî tune.

Xwîşk û brano!

Bona hînbûna zmanê me çi lazime bê kirin? Bi bîr û bawerîya me ev tişt lazîm in:

1. Em bi tek tenê bin jî, dest pê bikin û xwendin û nivîsandina Kurdî hînbîn. Çima em cehd dikin zmanê bîyanîyan hîn dibin û bo zimanê xwe vê cehdê nîşan nadin?

Divê em ji vê kêmasîyê fedî bikin. Hînbûna zmanê me ji yê xelkê hêsantir e.

2. Divê em alîkarîya hevalên xwe, merivên xwe, nas û dostên xwe bikin. Yê ku piçekî dizanin divê zanîna xwe hînî heval û hogirên xwe jî bikin. Zanina ku di cîyê xwe da dimîne çira dibe. Ew mîna zêrê windayî ye di bin axê da. Ev kitêb bona vê armancê hatîye hazir kirin. Ev bo hînbûna zmanê Kurdî ye bi alîkarîya Tirkî.

Kurdên ku xwendin û nivîsandina zmanê xwe qet nizanin, lê bi Tirkî dizanin, dikarin bi alîkarîya vê kitêbê hêdî hêdî hînbîn. Ji ber ku ev kitêb bi alîkarîya Tirkî fêrî we dike û di her dersekî da ji bo bêjeyên (gotin, pirs) nu ferhengok heye.

Yên ku Kurdî hindik dizanin jî dikarin pêşva bibin. Hin kes dikarin bi Kurdî bixwînin û piçekî binivîsinin jî. Lê ew ji wan ra ne bes e. Ew di vî karî da gelek xeletî jî dikin. Bona vê yekê divê ew jî bixebitin ku xwendin, nivîsandin û peyîvandina zmanê xwe bi pêşva bibin.

Xelkê bîyanî jî yên ku bi Tirkî dizanin, dikarin bi cehda xwe û bi alîkarîya van dersan - piçek jî bi alîkarîya hevalên xwe yên Kurd - zmanê Kurdî hînbîn.

Di dersan da, her ku diçe para Tirkî kêr dibe û pirs û problemên zmanê bi Kurdî tene eşkere kirin. Ev ji tiştêki rast

e. Xwendevan ku piçek hazîrîya xwe kir şûnda, heke di dersan da Kurdî bi kar bîne, dikare zmên çêtir hîn be û pêşve bibe.

Tîrmeh 1988  
BARAN

## ÖNSÖZ

Değerli okurlar,  
Kültür kavgamız da özgürlük kavgamızın bir parçasıdır. Başlıca düşmanlarımızdan biri de bilgisizliktir. Eğer okullarımızın olmasına fırsat verilmemişse, onları biz kendimiz oluşturmalıyız. İnsan dilerse zindanlarda bile öğrenir. Herşeyin başı istek, çaba göstermek ve kararlı davranmaktır.

İnsan yaşamında öğrenmek için özel bir dönem yoktur; çocuk, genç ya da yaşlı olun, kadın ya da erkek olun, tembellik etmeyin, öğrenin. Öğrenmek büyük bir ışıktır, kişiyi karanlıktan kurtarır, önüne yeni ve güzel bir dünya açar. Bilgi size özgürlük kavgasında güçlü silahlar verir. Bir halk için bilgiden daha büyük zenginlik olamaz.

Dilimizi öğrenmek ve geliştirmek için ne yapmalı?

Kanımca ilk elde şunlar gerekli:

Birincisi, tek başımıza olsak da, dilimizi öğrenmek için hemen başlamalıyız. Başka dilleri öğrenmek için birhayli çaba harcarken kendi dilimize gelince neden gevşek davranalım? Bu gevşeklik utanç verici olmaz mı? Kendi dilimizi okuyup yazmasını, güzel konuşmasını öğrenmek hem çok gerekli, hem de diğer dillere göre daha kolaydır.

İkincisi, bu konuda kendi arkadaşlarımıza, yakınlarımıza, dost ve tanıdıklarımıza yardımcı olmalıyız. Dili bir ölçüde bilenler, başkalarına da öğretmek için çaba göstermeli. Kendi yerinde duran bilgi neye yarar? Böylesi bilgi toprak altında yitik altınlar gibidir.

Bu kitap işte bu amaçla hazırlandı. O, Türkçe'nin yardımıyla Kürtçe'yi öğrenmek içindir.

Kürtçe okuma yazmayı hiç bilmeyenler, eğer Türkçe biliyorlarsa, bu derslerin yardımıyla öğrenebilirler. Çünkü kitap, Türkçe'nin yardımıyla öğretmekte ve her derste yeni kelimeler için bir de küçük sözlük bulunmaktadır.

Kürtçeyi az bilenler de bu derslerin yardımıyla geliştirebilirler. Bazıları, bir ölçüde Kürtçe okuyup yazmasını da biliyor. Ama bu yetmiyor; onlar birçok hata da yapıyorlar. Onlar da Kürtçe konuşmayı ve okuma yazmayı geliştirmek için çaba göstermeli. Türkçe bilen

yabancılar da, bu derslerin yardımı ve kendi çabalarıyla - aynı zamanda Kürtçe bilen arkadaşlarının desteğiyle- Kürtçeyi öğrenebilirler.

Dersler ilerledikçe açıklamalarda Türkçenin payı giderek azalıyor, bu iş için de Kürtçe kullanılıyor. Bu da doğal. Belli bir hazırlıktan sonra, kişinin öğrenim sürecinde tümünden Kürtçeyi kullanması, onun dili öğrenmesi ve geliştirmesi için yararlıdır.

Temmuz 1988  
BARAN

## KÜRTÇE ALFABE

Günümüzde Kürtçenin yazılışında üç tür alfabe kullanılmaktadır; Latin, Kiril ve Arap alfabesi. Sovyetler Birliği'nde yaşayan Kürtler, Kiril alfabesini, İran ve Irak Kürtleri Arap alfabesini, Suriye Kürtleri hem Arap hem Latin alfabesini, Türkiye Kürtleri ise yalnızca Latin alfabesini kullanmaktalar. Diğer yandan, Kiril ve Arap alfabelerini kullanan kesimlerde de aydınlar genellikle Latin alfabesini bilmekte ve Latince yazılmış metinleri anlamaktadırlar. Bu nedenle Kürtçe alfabenin gelecekte esas olarak Latince olacağı söylenebilir. Burada kullandığımız alfabe de latince olanıdır.

Kürtçe alfabede 31 harf vardır:

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Bu harflerden 8'i sesli, diğerleri sessizdir.

Sesli harfler şunlardır:

a e ê i î o u û

Harflerin okunuşu:

**a** Türkçedeki a gibi okunur.

**b** Türkçedeki b gibi okunur.

**c** Türkçedeki c gibi okunur.

**ç** Bu harfin biri Türkçedeki ç sesi vurgusuz, diğeri vurgulu olmak üzere iki tonu vardır. Örnek:

vurgusuz: **çend** (kaç), **keçik** (kız)

Vurgulu: **çêlek** (inek), **çal** (çukur)

Vurgulu olanında dil ucu damağa bastırılır.

**d** Türkçedeki d gibi okunur.

**e** Türkçedeki e gibi okunur. Ancak vurgulu bir tonu daha vardır ki e ile a arasında bir ses verir. **Eli** kelimesinde (Alî'nin Kürtçe söylenişi) olduğu gibi. Ses genizden gelir.

**ê** Bu ses Türkçede yoktur. ancak yabancı dillerin etkisiyle bazı sözcüklerde rastlanabilir. El (yabancı), eloğlu, kelimelerindeki e gibi. Dudaklar çok hafif aralıktır ve üst dişler alt dişleri kısmen kapatır. Örnek:

**çê** (iyi), **bêr** (kürek), **kêr** (bıçak)

**f** Türkçedeki f gibi okunur.

**g** Türkçedeki g gibi okunur.

**h** Türkçedeki h gibi okunur.

**i** Türkçedeki i gibi okunur.

**î** Türkçedeki i gibi okunur.

**j** Türkçedeki j gibi okunur. (Aslında Türkçede bu ses yoktur, bu dile dışardan giren bazı kelimelerde kullanılmaktadır.)

**k** Bu sesin biri Türkçedeki k, diğeri ise genizden gelen vurgulu biçimi olmak üzere iki tonu vardır.

**Örnek:**

Vurgusuz: **ker** (eşek), **kar** (iş)

Vurgulu: **ker** (sağır), **kar** (oğlak)

**l** Türkçedeki l gibi okunur.

**m** Türkçedeki m gibi okunur

**n** Türkçedeki n gibi okunur

**o** Türkçedeki o gibi okunur

**p** Bu harfin vurgulu ve vurgusuz olmak üzere iki tonu vardır. Vurgulu olanında dudaklar kuvvetle bastırılır.

**Örnek:**

Vurgusuz: **pir** (çok), **şerpeze** (peşişan)

Vurgulu: **pani** (topuk), **siping** (yemlik otu)

**q** Bu harf Türkçe alfabede yoktur. Genizden gelen k sesine yakın bir ses verir.

**Örnek:**

**Teqin** (patlama), **beq** (kurbağa)

**r** Bu sesin biri vurgulu, diğeri vurgusuz olmak üzere-sert ve yumuşak- iki biçimi vardır.

**Örnek:**

Vurgusuz: **Hunar** (nar), **Bêrivan** (isim- süt sazan kız)

Vurgulu: **Pir** (çok), **kirîn** (satın almak)

**s** Türkçedeki s gibi okunur.

**ş** Türkçedeki ş gibi okunur.

**t** Bu harfin biri vurgulu, diğeri vurgusuz olmak üzere iki tonu vardır. Vurgusuz olanı Türkçedeki t sesini verir. Vurgulu olanında dil ucu üst ve alt dişler arasında öne doğru uzatılır ve telaffuz edilirken dişler tarafından dile bastırılır.

**Örnek:**

Vurgusuz: **Sifil** (kazan), **kurt** (kısık)

Vurgulu: **Tenik** (ince), **tû** (dut), **tahl** (acı)

**u** Bu ses Türkçede yoktur. Türkçedeki u ile ı harflerinin okunuşu arasında bir ses verir.

**Örnek:**

**Gul** (gül), **Quling** (turna), **Gur** (kurt)

**û** Türkçedeki u gibi okunur.

**v** Üst dişler alt dudağın üstüne bastırılarak çıkarılan bir ses. Almandadaki v harfine yakın bir okunuşu vardır.

**Örnek:**

**Nav** (ad), **evîn** (sevgi), **veşarî** (saklı)

**w** Türkçedeki v sesini verir.

**x** Bu harfin de iki tonu vardır. Biri Türkçedeki ğ (yumuşak g) sesini verir. Diğeri ses daha serttir ve Türkçede yoktur.

**Örnek:**

Yumuşak g (ğ) gibi okunan: **axa** (büyük toprak sahibi, ağa), **xezal** (geyik)

Sert okunan x: **Naxir** (sığır sürüsü), **xorf** (delikanlı), **xurt** (güçlü)

**y** Türkçedeki y sesini verir.

**z** Türkçedeki z sesini verir.

Bazı harflerin değişik tonlarının bulunuşu ve bunların özel işaretle gösterilmeyiş, başlangıçta okuyucuya güç görünebilir. Ancak okuyucu, Kürtçe metinleri okuyup yazmakta belli bir deney kazandıktan sonra, kelimelerin cümle içindeki yerlerine göre birini diğlerinden kolayca ayırabilmektedir. Sovyet Kürtlerinin kullandığı Kiril alfabesinde bu tür çift tonlu sesler için özel işaretler kullanılmaktadır.

Kürtçede iki harften oluşan, ama tek bir ses veren bir

**diftong** da vardır: **xw**

**Örnek:**

**Xwe** (kendisi), **xwîn** (kan), **xwarin** (yemek)

Ev : *Bu, bunlar*  
 Ew : *O, onlar*  
 Qelem: *Kalem*  
 Pirtûk: *Kitap*  
 Ez: *Ben*  
 Tu: *Sen*  
 Nav: *isim*  
 Min: *Ben*  
 Çi: *Ne*  
 Kî: *Kim*  
 Çawa: *Nasıl*  
 Çawa yî?: *Nasılsın?*  
 Ba ş: *iyi*  
 Spas: *Teşekkür*  
 Spas dikim: *Teşekkür ederim*  
 Sêv: *Elma*  
 Dar: *Ağaç*  
 Çivîk: *Kuş*  
 Xwendekar: *Öğrenci*  
 Ez Hesên im.  
 Tu Elo yî.  
 Navê te çi ye?  
 Navê min Hesên e.  
 Tu kî yî?  
 Ez Hesên im.  
 Çawa yî?  
 Ba ş im, tu ç awa yî?  
 Ez jî ba ş im, spas dikim.  
 Tu kî yî?  
 Ez Elo me.  
 Ev çi ye?  
 Ev qelem e.  
 Ev çi ne?  
 Ew sêv in.

Kürtçe´de iki gurp şahıs zamiri vardır:

### 1. GRUP

Ez: *Ben*  
 Tu: *Sen*  
 Ew: *O*  
 Em: *Biz*  
 Hûn: *Siz*  
 Ew: *Onlar*

Kürtçe´de **bûn** (olmak) fiilinin şimdiki zamanı şahıslara göre şöyle belirlenir:

Ez im: *Benim*  
Tu yî: *Sensin*  
Ew e: *Odur*  
Em in: *Biziz*  
Hûn in: *Sizsiniz*  
Ew in: *Onlardır*

**Bûn** fiilinin olumsuzluk biçimi iki türlü yapılır:  
1) smin veya sıfatın başına (**ne**) edatı getirilerek.

Örnek: Ez **ne** Hesên im.

2) Fiilin başına (**nin**) olumsuzluk öneki getirilerek.

Örnek: Ez Hesên **ninim**.

**Çi** ve **kî** soru zamirlerinin kullanılışında (**bûn**) fiili tekillerde (**ye**), çoğullarda (**ne**) biçimini alır:

Ev çî **ye**?  
Ew çî **ne**?  
Ew kî **ye**?  
Ew kî **ne**?

Bûn fiilinin birinci tekil şahısla kullanıldığında sesli harfle bitmesi haline (**me**) biçimini alışına dikkat edelim::

Tu kî yî?	<i>Ez Hesên im.</i>
Tu kî yî?	<i>Ez Elo me.</i>
Tu kî yî	<i>Ez Eyşan im.</i>
Tu kî yî?	<i>Ez Zerê me.</i>

### **Alıştırma**

Aşağıdaki cümlelerde boş yerleri doldurun:

Ez Hesên ....., tu Zerê ....., ez Elo ....., em xwendevan ..... tu kî.....? ev çî ....., ew çî .....? hûn kî .....? ev ..... e, ew ..... in, em ..... in, tu ..... î, ez ..... me, ew ..... ne? hûn .....ne?..... Zerê me, ..... Hesên î, ..... sêv in, ..... xwendevan in, ..... dar e, navê te ..... ....., navê ..... Hesên .....



### III

Roj	: <i>Gün, güneş</i>
Şev	: <i>Gece</i>
Rojbaş	: <i>Günaydın</i>
Şevbaş	: <i>İyi geceler</i>
Mamoste	: <i>Öğretmen</i>
Reng	: <i>Renk</i>
Sor	: <i>Kırmızı</i>
Zer	: <i>Sarı</i>
Kaxiz	: <i>Kağıt</i>
Sipî	: <i>Beyaz, ak</i>
Reş	: <i>Kara</i>
Kurdî	: <i>Kürtçe</i>
Tırkî	: <i>Türkçe</i>
Kê	: <i>Kimin</i>
Û	: <i>Ve</i>
Mal	: <i>Ev</i>
Zman	: <i>Dil</i>
Xwîşk	: <i>Kız kardeş</i>
Bira	: <i>Erkek kardeş</i>
Xwarin	: <i>Yemek (fill)</i>

- Rojbaş Hesên!
- Rojbaş Mamoste!
- Çawa yî?
- Baş im, spas dikim.
- Navê te çi ye?
- Navê min Zerê ye.
- Ew çi ne?
- Ew sêv in.
- Sêv çi reng in?
- Ew sor û zer in.
- Ew çi ye?
- Ew kaxiz e.
- Kaxiz çi reng e?
- Kaxiz sipî ye.
- Qelem çi reng e?
- Qelem reş e.
- Navê te çi ye?
- Navê min Teyro ye.
- Zmanê te çi ye?
- Zmanê min Kurdî ye.

**İkinci grup şahıs zamiri:**

Min	Ben	Benim
Te	Sen	Senin
Wî (eril) Wê (dişil)	O	Onun
Me	Biz	Bizim
We	Siz	Sizin
Wan	Onlar	Onların

Fiil türlerine ve zamanlarına göre birinci veya ikinci grup şahıs zamirleri kullanılır. Kürtçe'de malikiyet sıfatları ikinci grup zamirlerle aynıdır.

Min sêv xwar : Elma yedim.  
Sêva min sor e : Elmam kırmızıdır.

**Min** birinci cümlede şahıs zamiri (ben), ikinci cümlede malikiyet sıfatı (benim) niteliğindedir.

### Cins edatı

Cins edatı eril için (**ê**), dişil için (**a**)dır. Her iki cinsin çoğulu için (**ên**)dır.

Xwîşk : Xwîşk**a** min  
Bira : Biray**ê** te  
Xwîşk**ên** min, biray**ên** te

İsim (bira) örneğinde olduğu gibi sesli harfle biterse araya (y) ilave edilir. Kürtçe'de tüm isimler eril veya dişil olarak cins edatı alırlar. Örneğin sêv (elma) dişil, zman (dil) erildir.

Sêva min  
Zmanê te

### Alıştırma

Min sêv xwar	Me sêv xwar
Te sêv xwar	We sêv xwar
Wî sêv xwar	Wan sêv xwar
Wê sêv xwar	

Sêva min sor e.  
Qe lema te reş e.  
Pirtûka wî zer e.  
Navê wê çi ye?  
Navê wê Eyşan e.  
Mala we çi reng e?  
Mala me sipî ye.  
Zmanê wan çi ye?  
Zmanê wan Tirkî ye.  
Sêvên we çi reng in?  
Sêvên me sor û zer in.

Navê xwîşka te çi ye?  
Navê wê Eyşan e.  
Navê birayên te çi ne?  
Navên wan Ehmed û Elî ye.  
Ew çi ye?  
Ew pirtûk e.  
Ew pirtûka kê ye?  
Ew pirtûka Elî ye.  
Pirtûka Elî çi reng e?  
Ew sor e.  
Ew çi ne?  
Ew dar in.  
Ew darên kê ne?  
Ew darên me ne.

### Aşağıdaki soruları cevaplandırın:

Navê te çi ye?  
Tu kî yî?  
Ev çi ye?  
Sêv çi reng e?  
Ew kî ye?  
Ehmed birayê kê ye?  
Ew qelesa kê ye?  
Qelesa te çi reng e?

### İşaret Sıfatları:

Ev	: <i>Bu, bunlar</i>
Ew	: <i>O, onlar</i>
Çekim halinde:	
Vê sêvê	: <i>Bu elmayı</i>
Vî seyî	: <i>Bu köpeği</i>
Van pirtûkan	: <i>Bu kitapları</i>
Wê sêvê	: <i>O elmayı</i>
Wî seyî	: <i>O köpeği</i>
Wan pirtûkan	: <i>O kitapları</i>

**Vê, wê** dişil için; **vî, wî** eril için; **van, wan** çoğul için kullanılır.

## IV

Li	: <i>Yer biriren edat</i>
Jêr	: <i>Aşağı</i>
Jor	: <i>Yukarı</i>

Ber	: Ön
Pêş	: Ön
Paş	: Arka
Ser	: Üst
Bin	: Alt
Der	: Dışarı
Hundir	: İ çeri
Deri	: Kapı
Ku?	: Nere?
Jî	: De, da (dahil)
Xalîçe	: Halı
Ode	: Oda
Keçik	: Kız
Lawik	: Oğlan
Kesk	: Yeşil
Kûçik	: Köpek
Gewr	: Gri
Şîn	: Mavi
Dîwar	: Duvar
Yan	: Ya da

Qelem li ku ye?  
 Qelem li ser masê ye.  
 Pirtûk li ku ye?  
 Ew jî li ser masê ye.  
 Xalîçe li ku ye?  
 Xalîçe li bin masê ye.  
 Kursî li ku ye?  
 Kursî li ber masê ye.  
 Pençire li ku ye?  
 Ew li paş masê ye.  
 Lambe li ku ye?  
 Ew li jor e.  
 Mase li ku ye?  
 Ew li hundir odê, li ber dîwêr e.  
 Keçik û lawik li ku ne?  
 Ew li hundir odê, li ser kursîyan in.  
 Ev mala kê ye?  
 Ev mala me ye.  
 Dîwar çi reng e? Dîwar sipî ye.  
 Xalîçe çi reng e?  
 Xalîçe kesk e.  
 Kûçik çi reng e?  
 Kûçik gewr e.  
 Pirtûk çi reng e?  
 Pirtûk şîn e.  
 Ew lawik e, Zerê keçik e.

## Alıştırma

Mase - Li ser masê  
Xalîçe - Li ser xalîçê  
Dîwar - Li ber dîwêr  
Derî - Li ber dêrî

Heke di kîtê paşîn da dengdêrên (e) û (a) hebin, ew dibin (ê)  
Son hecede (e) ve (a) seslileri varsa bunlar **(ê)** biçimini alırlar.

## Alıştırma

1) Aşağıdaki boş yerleri doldurunuz

Mase li .....odê..... dîwêr e.

Qelem li ..... masê .....

Kursî..... masê ye

Lampe..... e

Pençire li ..... ye?

Pençire.... masê.....

Kûçik.....ku..... ?

.....li ..... dêrî ye.

Dîwar sipî ye, kûçik... e, pirtûk.... e

2) Aşağıdaki soruları cevaplandırın

Xalîçe li ku ye?

Qelem li ku ye?

Lampe li ku ye?

Navê te çi ye?

Eî lawik e yan keçik e?

Kûçik çi reng e?

Kûçik li ku ye?

Keçik û lawik li ku ne?

Mase li ku ye?

## Kürtçede soru cümlesi:

1) Cümlelerin başına **ma, ka** gibi sözcükler getirilerek yapılır:

Ew mala we ye.

Ma ew mala we ye?

Ka te digot ez têm?

2) Cümlede ses düzeni yoluyla. Soru cümlesinde son heceden önceki bir veya ikinci hecede ses tizle şir:

Ew mala we ye

Ew mala we ye?

Qelem li ser masê ye.

Qelem li ser masê ye?

3) **Kî, çi çawa** gibi soru zamirleri veya sıfatları, basit ve bileşik zarflarza sınıflandırılmasıyla:  
Ew kî ye?  
Ew çi ye?  
Tu çawa yî?  
Qelem li ku ye?

## V

Di.... da : *Yer bildiren edat*

Belê	: <i>Evet</i>
Erê	: <i>Evet</i>
Na	: <i>Hayır</i>
Dê	: <i>Anne</i>
Bav	: <i>Baba</i>
Law	: <i>Oğlan</i>
Kur	: <i>Oğlan</i>
Keç	: <i>Kız</i>
Heval	: <i>Arkadaş</i>
Çend	: <i>Kaç</i>
Sal	: <i>Yıl</i>
Salinê	: <i>Yaşında</i>
Heye	: <i>Var</i>
Tune	: <i>Yok</i>
Çima	: <i>Neden</i>
Feqîr	: <i>Yoksul</i>
Dewlemend	: <i>Zengin</i>
Dersxane	: <i>Sınıf</i>
Dibistan	: <i>Okul</i>
Mezin	: <i>Büyük</i>
Piçûk	: <i>Küçük</i>
Yek	: <i>Bir</i>
Du	: <i>İki</i>
Sê	: <i>Üç</i>
Çar	: <i>Dört</i>
Pênc	: <i>Beş</i>
Şeş	: <i>Altı</i>
Heft	: <i>Yedi</i>
Heyşt	: <i>Sekiz</i>
Neh	: <i>Dokuz</i>
Deh	: <i>On</i>
Yanzdeh	: <i>On bir</i>
Danzdeh	: <i>On iki</i>
Sêzdeh	: <i>On üç</i>
Çardeh	: <i>On dört</i>

Panzdeh	: <i>On beş</i>
Şanzdeh	: <i>On altı</i>
Heftdeh	: <i>On yedi</i>
Heyştdeh	: <i>On sekiz</i>
Nozdeh	: <i>On dokuz</i>
Bîst	: <i>Yirmi</i>
Sî	: <i>Otuz</i>
Çil	: <i>Kırk</i>
Pêncî	: <i>Elli</i>
Şêst	: <i>Altmış</i>
Heftê	: <i>Yetmiş</i>
Heyştê	: <i>Seksen</i>
Nod	: <i>Doksan</i>
Sed	: <i>Yüz</i>
Bîst û yek	: <i>Yirmi bir</i>
Si û çar	: <i>Otuz dört</i>

- Tu Hesên î?
- Belê, ez Hesên im.
- Tu çend salinî yî?
- Ez heyşt salinî me.
- Navê bavê te çi ye?
- Navê wî Elo ye.
- Bavê te çend salinî ye?
- Ew çil û pênc salinî ye.
- Xwîşka te heye?
- Belê, heye.
- Xwîşka te piçûk e yan mezin e?
- Xwîşka min mezin e, panzdeh salinî ye.
- Baran kî ye?
- Baran hevalê min e.
- Hûn li ku ne?
- Em li dibistanê ne.
- Eyşan kî ye?
- Eyşan hevala min e.
- Eyşan lawik e yan keçik e?
- Eyşan keçik e.
- Tu jî keçik î?
- Na, ez lawik im.
- Pirtûka te heye?
- Na, tune.
- Çîma?
- Em feqîr in.
- Beko jî feqîr e?
- Na ew dewlemend e.
- Çend brayê te hene?
- Du brayê min hene.
- Navê wan çi ye?

- Navê wan Serdar û Gurgîn e.
- Serdar çend salinî ye?
- Ew piçûk e, çar salinî ye.
- Dîya te li kuye?
- Dîya min li mal e.

### Sayılar:

- 21 - *Bîst û yek*
- 22 - *Bîstûdu*
- 34 - *Sî û çar*
- 45 - *Çil û pênc*
- 58 - *Pêncî û heşt*
- 117 - *Sed û heftdeh*
- 364 - *Sê sed û şêst û çar*
- 2928 - *Du hezar û nehsed û bîst û heşt*

### Alıştırma

1) Aşağıdaki sayıları okuyunuz:

11, 18, 23, 40,5 2, 67, 75, 88, 91, 114,1 59, 398, 1219, 35241

2) Aşağıdaki soruları cevaplandırın:

- Tu kî yî?
- Tu çend salinî yî?
- Navê bavê te çi ye?
- Dîya te çend salinî ye?
- Çend xwîşkên te hene?
- Brayê te tune?
- Eyşan keçik e yan lawik e?
- Di dersxanê da çend xwendekar hene?
- Çend keçik in, çend lawik in?
- Di dersxanê da çend pençire hene?
- Di mala we da çend ode hene?
- Tu feqîr î yan dewlemend î?
- Baran hevalê te ye?
- Elîf xwîşka te ye?
- Navê bavê te Hesên e?

3) **Di** yer ve zaman bildiren bir edattır, **da** zarfıyla birlikte kullanılır.

- Di dersxanê da : *Sınıfta*
- Di mal da : *Evde*
- Di salê carê da : *Yılda bir kez*
- Di meha gulanê da : *Mayıs ayında*

Li adeti **Jêr**, **Jor**, **Pêş**, **Nav** vb. yer zarflarıyla birlikte, ya da tek başına kullanılır.



Li nav gund  
li gund  
li mal  
Li pêş malê

## VI

### DIBISTAN

Gundê me Golan e. Di gundê me da şêst mal hene. Di gund da dibistan jî heye. Dibistana me li nav gund e. Du dersxanên wê hene. Dora dibistanê dar û ber in. Ez di sinifa ewlîn da me. Eyşan jî di sinifa me da ye. Eyşan keçikek jîr e. Em panzdeh keçik û bîst lawik in. Serdar di mal da ye, ew piçûk e. Navê dersdarê me Bengîn e. Bengîn merivek baş e. Di bajar da dibistan pir in. Bajar mezin in. gund piçûk in. Di salekî da 12 meh hene. Di meheki da 30 roj hene. Roj bîst û çar saet in.

Gund	: Köy
Bajar	: Şehir
Jin	: Kadın
Nav	: İ çinde
Pir	: Çok
Mêr	: Erkek
Dersxane	: Sınıf
Deqqe	: Dakika
Dar û ber	: Ağaçlık
Jîr	: Çalışkan
Sal	: Yıl
Berx	: Kuzu
Sinif	: Sınıf
Meh	: Ay
Ewlîn	: Birinci
Saet	: Saat
Dor	: Çevre
Xort	: Delikanlı
Meriv	: Kişi
Keç	: Kız

#### Alıştırma

1) aşağıdaki soruları cevaplandırın:  
Navê gundê we çi ye?  
Gundê we çend mal e?  
Li gundê we dibistan heye?  
Hûn di dersxanekê da çend kes in?  
Çend xort in, çend keç in?

Dersdarê we kî ye?  
Dersdar merivek çawa ye?  
Eyşan keçek çawa ye?  
Li dora dibistana we çi hene?  
Di gundê we da dar û ber pir in?  
Serdar li dibistanê yê?  
Çima Serdar li mal e?  
Di salekî da çend meh hene?  
Di salekî da çend roj hene?  
Di saetekî da çende deqqe hene?

### **Küçülüm eki**

Kürtçede küçülüm eki (**ik**) tır.

Keç-keçik law-lawik jin-jinik berx-berxik  
Mêr-mêrik dar-darik kar-karik

Ancak çoğu kez kök kelime ile küçültülmüşü arasında anlam farkı ortadan kalkmıştır. Keçik sözcüğü "küçük kız" anlamına değil de, doğrudan "kız" anlamına kullanılır.

### **Belirsiz Tanım Harfi**

Kürtçede belirsiz tanım harfi (**ek**)tir.

Sal: Yıl Salek: *Bir yıl (belirsiz bir yıl)*  
Roj: Gün Rojek: *Bir gün (belirsiz bir gün)*  
Meriv: Adam Merivek: *Bir adam (herhangi bir adam)*

Çoğulu (**an**) dır.  
Salan, rojan, merivan...

Belli yörelerde çoğul takısı (**în**) dir.  
Hesp: Hespîn, çîya: Çîyayîn...  
**Hawar`** da da böyle kullanılmıştır.

## **VII**

### **DIBISTAN/2**

Sibe ye. Rojeke germ û xweş e. Ez diçim dibistanê. Dibistan ji min ra nêzik e.  
Xelîl jî tê dibistanê. Ew ji gundekî din tê. Di gundê wan da dibistan tune.

Dibistan ji wî ra dûr e. Her sibê tê û her êvarê diçe. Bo wî, çûn û hatin gelek bi zehmet e.

Em ji sibê heya êvarê di dibistanê da hînî xwendin û nivîsandinê dibin. Hînbûn û zanîn çiqas tiştekî baş e! Merivê nezan di nav tarîyê da ye, der û dora xwe nabîne. Zanîn wek ronahî ye.

Germ	: Sıcak
Xweş	: Hoş, güzel
Çûn (çuyîn)	: Gitmek
Nêzik	: Yakın
Dûr	: Uzak
Hatin	: Gelmek
Êvar	: Akşam
Hînbûn	: Öğrenmek
Xwendin	: Okuma
Nivîsandin	: Yazma
Din	: Diğer, başka
Sibe	: Sabah
Her	: Her
Gelek	: Oldukça, çok
Zanîn	: Bilgi, bilmek
Tişt	: Şey
Nezan	: Bilmez, cahil
Tarî	: Karanlık
Der û dor	: Çevre
Dîtin	: Görmek
Na	: Hayır, olumsuzluk ön eki
Ronahî	: Aydınlık, ışık
Xwe	: Kendi
Anîn	: Getirmek
Bo	: İçin

### 1) Ji....., ji.....ra

**Li** ve **di**....edatları durum belirttikleri halde , bu edat nesneden başlayan bir hareketi belirler.

Li mal	: Evde
Di mal da	: Evde
Ji mal	: Evden

### Örnek:

Hesen ji mal tê: Hesen evden geliyor.

**Ji.....ra** nesne ile bir ilişkiyi belirler.

Ji min ra nêzik e	: Bana yakındır.
Ji wî ra dûr e	: Ona uzaktır
Ji te ra ba ş e	: Senin için iyidir.
Ji min ra tîne	: Bana getiriyor.
Elo ji min ra sêvek anî	: Elo bona bir elma getirdi.

2) Kürtçede, Türkçeden farklı olarak, niteleme sıfatı isimden sonra gelir.

Roja germ	: Sıcak gün
Rojeke germ	: Sıcak bir gün
Gundê din	: Diğer köy
Gundekî din	: Diğer bir köy

3) **Çûn** (gitmek) fiilinin şimdiki zaman ı

Ez diçim	Em diçin
Tu diçî	Hûn diçin
Ew diçe	Ew diçin

**Olumsuz:**

Ez naçim	Em naçin
Tu naçî	Hûn naçin
Ew naçe	Ew naçin

**Hatin** (gelmek) fiilinin şimdiki zaman ı:

Ez têm	Em tên
Tu tê	Hûn tên
Ew tê	Ew tên

**Olumsuz:**

Ez nayêm	Em nayên
Tu nayê	Hûn nayên
Ew nayê	Ew nayên

Çûn û hatin: *Gidiş-geliş*

**Dîtin** (görmek) fiilinin şimdiki zaman ı:

Ez dibînim	Em dibînin
Tu dibînî	Hûn dibînin

Ew dibîne Ew dibînin

Olumsuzluk biçimi, (di) fiil öneki yerine (na) olumsuzu konularak yapılır:

**Örnek:** Ez nabînim, tu nabînî  
Şimdiki zamanın olumsuzluk öneki (na)dır.  
İstisnalar: Ez nizamim, ez nikarim.

### **Bi, bi .....ra**

Bu edat "*birlikte, ile*" anlamını verir.

Bi zehmet : *Zahmetli*  
Bi dar û ber: *Ağaçlık, yeşillik*  
Bi Elifê ra : *Elif`le birlikte*

**Zanin** fiilinin şimdiki zamanı :

Ez dizanim Em dizanın  
Tu dizanî Hûn dizanın  
Ew dizane Ew dizanın

Olumsuzda di önekinin yerini **ni** alır:

Ez nizamim, tu nizanî, em nizanin.

### **Xwendin- Nivîsandin:**

Ez xwendin û nivîsandinê dizanim.  
Em di dibistanê da **hînî** xwendin û nivîsadinê **dibin**.  
Xwendin tişteki başe.

**Xwendin** fiilinin geniş (ve şimdiki) zamanı:

Ez dixwînim Em dixwînin  
Tu dixwînî Hûn dixwînin  
Ew dixwîne Ew dixwînin

Olumsuzu: Ez naxwînim, tu naxwînî, ew naxwîne, em naxwînin...

**Nivîsandin** fiilinin geniş (ve şimdiki) zamanı :

Ez dinivîsînim Em dinivîsînin  
Tu dinivîsînî Hûn dinivîsînin  
Ew Dinivîsîne Ew dinivîsînin

Olumsuz: Ez nanivîsînim, tu nanivîsînî....

**Ödev:** Xwendin, nivîsandin, zanîn, dîtin, çûyîn, hatin fillerinden cümleler yapın.

## VIII

### MALA ELO

Mala me li gund e. Bavê min cotkarî dike. Navê bavê min Hesên e, dîya min Eysan e. Sê birayên min û du xwîşkên min hene. Erdê me tune. Em feqîr in. Bavê min û birayên min yên mezin di zevî û rezên axê da dixebitin. Axa dewlemend e. Qonaxek wî ya mezin heye. Qonax du qat e, bilind e; pençirên wê fireh in. Qonax di nav baxçekî mezin da ye. Çarmedorê bêxçe dîwarek bilind e.

Zaroyên axê di vî baxçeyî da difizin, sêvan û hêrûg û tirî dixwin.

Mala me piçûk e, mîna pîna mirîşkan e. Em di nav da tevî ker û golikên xwe dimînin.

Sêv û hêrûgên me tunin.

Kar	: İş
Cot	: Çift
Cotkar	: Çiftçi
Cotkarî	: Çiftçilik
Erd	: Toprak
Zevî	: Tarla
Rez	: Bağ
Xebat	: Çalışma
Qonax	: Konak
Qat	: Kat
Bilind	: Yüksek
Nizm	: Alçak
Fireh	: Geniş
Teng	: Dar
Tirî	: Üzüm
Çarmedor	: Dört yan, çepeçevre
Lîstin	: Oynamak
Hêrûg	: Erik
Xurek	: Yemek (isim)
Pîn	: Kümes, kulübe
Mirîşk	: Tavuk
Ker	: Eşek
Golik	: Dana
Mayîn	: Kalmak
Kirin	: Yapmak

Çiya : *Dağ*  
Xwendekar: *Öğrenci*

**Kirin** fiilinin şimdiki zaman ı :

Ez dikim Em dikin  
Tu dikî Hûn dikin  
Ew dike Ew dikin

**Olumsuzu:**

Ez nakim, tu nakî, ew nake, em nakin....

**Xebifîn** fiilinin şimdiki zaman ı :

Ez dixebitim Em dixebitin  
Tu dixebitî Hûn dixebitin  
Ew dixebite Ew dixebitin

**Olumsuzu:**

Ez naxebitim, tu naxebitî...

**Alıştırma:**

Tu çi karî dikî?  
Ez xwendekar im.  
Bavê te çi karî dike?  
Ew cotkar e cotkar - cotkarî  
Dersdar çi karî dikê? dersdar - dersdarî  
Ew dersdarî dike.  
Karê axê çi ye? axa - axafî  
Ew axafî dike, naxebite.

Birayê min : *Kardeşim*  
Birayê min yê mezin : *Büyük kardeşim*  
Birayên min : *Kardeşlerim*  
Birayên min yên mezin : *Büyük kardeşlerim*

Xwîşka min : *Kız kardeşim*  
Xwîşka min ya piçûk : *Küçük kız kardeşim*  
Xwîşkên min : *Kız kardeşlerim*  
Xwîşkên min yên piçûk:: *Küçük kız kardeşlerim*

**Örnekler:**

Hevalê min yê delal  
Qelema min ya reş

Mala me ya piçûk  
Qonaxa axê ya mezin  
Sêvên me yên sor  
Baxçeyê wan yê fireh  
Darên wan yên bilind

Konuşma dilinde gene lîkle kısaltmalı biçimler kullanılır:

Hevalê min ê delal  
Qelema min a reş  
Darên wan ên bilind

**Lîstin (leyîstin)** fiilinin çimdiki zamanı:

Ez dilîzim    Em dilîzin  
Tu dilîzî    Hûn dilîzin  
Ew dilîze    Ew dilîzin

**Olumsuzu:**

Ez nalîzim, tunalîzî, ew nalîze, em nalîzin...

**Xwarin:**

Ez dixwim    Em dixwin  
Tu dixwî    Hûn dixwin  
Ew dixwe    Ew dixwin

**Olumsuzu:**

Ez naxwim, tu naxwî, ew naxwe, em naxwin....

**Mayîn:**

Ez dimînim    Em dimînin  
Tu dimînî    Hûn dimînin  
Ew dimîne    Ew dimînîn

**Olumsuzu:**

Ez namînim, tunamînî....

**Aşağıdaki soruları cevaplandırın:**

Çend bira û çend xwîşkên Elo hene?  
Mala Elo li ku ye?



Bavê Elo çi karî dike?  
Ew feqîr in yan dewlemend in?  
Axa çima dewlemend in?  
Qonaxa Elo heye?  
Mala wan çawa ye?  
Dê û bavê Elo li ku dixebitin?  
Qonaxa axê di nav çi da ye?  
Di bêxçe da çi dar hene?  
Çarmedorê bêxçe çi ye?  
Mala Elo tevî çi dimînin?  
Sêv û hêrugên mala Elo hene?  
Mala we li gund e yan bajêr e?  
Mala we piçûk e yan mezin e?  
Çîya bilind in yan nizm in?  
Kî sêv û hêrûgan dixwin?

**Aşağıdaki cümleleri soru cümlesi haline getirin:**

*Örnek:*

Navê bavê Elo Hesên e.

Navê bavê Elo çi ye?

Sê birayên Elo hene.  
Bavê Elo cotkarî dike.  
Ew di zevî û rezê axê da dixebitin.  
Qonaxa axê mezin e, piçûk nine.  
Mala me li bajêr e.  
Bajar mezin e.  
Çarmedorê gund rez e.  
Dora qonaxê baxçe ye.  
Pençirên mala me fireh in.  
Mala Elo teng e, ne fireh e.  
Elîf tirî dixwe.

**Ödev:**

Kirin, xebifîn, listin, xwarin, mayîn fiillerinden üçer cümle kurun.

**IX**

**MALA ELO/2**

Çêlekek me, çar mîh û sê bizinê me hene. Dayik wan didoşe û şîrê wan dike mast. Ji mast rûn û penîr çêdike

Em zaro, têrî xwe şîr û mast, rûn û penîr naxwin. Ji ber ku bavo wan dibê li bajêr difroşe, ji me ra tişt-mişt dikire.

Kerek me jî heye, Bozê. Em genim û ceh lê bardikin û dibin êş. Aş li jêrî gund e, aşê avê ye.

Xwarina me, piranî, nan û dew, nan û sawar e. Pîvazên me jî kêr nabin. Çend mirîşkên me jî hene; ew hêkan dikin. Lê bavo, pircaran wan jî dibê, difroşe.

Ez ji goşt pir hezdikim, lê em salê carê yan du caran goşt dixwin; kîngê pezê cîranekî nexweş dibê...

Ga	: Öküz
Çêlek	: Inek
Mîh	: Koyun
Bizin	: Keçi
Dotin	: Sağmak
Şîr	: Süt
Mast	: Yoğurt
Rûn	: Yağ
Penîr	: Peynir
Kirin	: Yapmak
Têr	: Tok
Têrî xwe	: Doyunca
Nan	: Ekmek
Dew	: Ayrar
Ji ber ku	: Çünkü
Kêr	: Eksik
Birin	: Götürmek
Frotin	: Satmak
Genim	: Buğday
Ceh	: Arpa
Vexwarin	: İ çmek
Bar	: Yük
Barkirin	: Yükleme
Aş	: Değirmen
Piranî	: Çuğunluk
Çêkirin	: Meydana getirmek, yapmak
Sawar	: Bulgur
Hêk	: Yumurta
Ard	: Un
Ticar	: Tüccar
Pircaran	: Çoğu kez
Goşt	: Et
Hezkirin	: Sevmek
Pez	: Koyun-keçi
Ber	: Ön, ürün
Av	: Su
Cîran	: Komşu
Nexweş	: Hasta
Anîn	: Getirmek

Tîşt	: Eşya, şey
Tîşt -mişt	: Birşeyler
Hoste	: Usta
Îro	: Bugün
Pîvaz	: Soğan

**Dotin** fiilinin geniş (ve şim diki) zamanı:

Ezdidoşim Em didoşin  
Tu didoşî Hûn didoşin  
Ew didoşe Ew didoşin

Elîf mangê didoşe  
Dayîk bizinê didoşe  
Em diçin pêz didoşin.

**Olumsuzu:**

Eznadoşim, tu nadoşî, ew nadoşe, em nadoşin...

**Kirin** (Yapmak) fiilinin geniş (ve şimdiki) zamanı

Ez dikim Em dikin  
Tu dikî Hûn dikin  
Ew dike Ew dikin

Mirîşk hêk dikin  
Dayîk şîr dike mast  
Aş genim dike ard

**Olumsuzu:**

Ez nakim, tu nakî, ew nake, em nakin....

**Çêkirin** (yapmak, maydana getirmek, onarmak) fiilinin geniş (ve şimdiki) zamanı:

Ez çêdikim Em çêdikin  
Tu çêdikî Hûn çêdikin  
Ew çêdike Ew çêdikin

Dayîk ji çîr rûn û penîr çêdike.  
Em ji hêkan xwarinê çêdikin.  
Hoste diwêr çêdike.

**Olumsuzu:**

Ez çênakim  
Tu çênakî  
Ew çênake

Em çênakin  
Hûn çênakin  
Ew çênakin

**Birin** (götürmek) fiilinin geniş (ve şimdiki) zamanı:

Ez dibim    Em dibin  
Tu dibî    Hûn dibin  
Ew dibe    Ew dibin

Bavo rûn û penîr dibe bajêr.  
Ez pêz dibim çîya.  
Ew genim û cêh dibin êş.

**Olumsuz:**

Ez nabim, tu nabî, ew nabe, em nabin...

**Frotin** (satmak) fiilinin geniş (ve şimdiki) zamanı:

Ez difroşim    Em difroşin  
Tu difroşî    Hûn difroşin  
Ew difroşe    Ew difroşin

Bavo rûn, penîr û hêkan difroşe.  
Axa genim difroşe.  
Ticar solan û cêw difroşin.

**Olumsuz:**

Ez na froşim, tu na froşî...

**Kirîn** (satin almak) fiilinin geniş (ve şimdiki) zamanı

Ez dikirim    Em dikirin  
Tu dikirî    Hûn dikirin  
Ew dikire    Ew dikirin

**Olumsuz:**

Ez nakirim, tu nakirî...

Em şêkir û çayê dikirin.  
Bajarî avê dikirin.  
Elo, qelem û defterên xwe dikire.  
Perê min tune, ez goşt nakirim.

**Xwarin û vexwarin**

Kîngê ez birçî dibim, nan dixwim; kîngê fî dibim, avê vedixwim. Meriv tim dixwe û vedixwe.

Nan, hêk, goşt, tirî, rûn û penîr tèn xwarin. Av, şîr, dew, şerav, çay û qehwe tèn vexwarin. Cixare tê kişandin. Bavê min cixarê dikişîne. Ez piçûk im cixarê na kişînim.

Xwarina feqîran nan û dew e. Xwarina dewelemendan tore-tore ye. Perê wan pir e, ew têrî xwe rûn û hungiv, goşt, fêkî û şîranî dixwin.

Birçî	: Aç
Tî	: Susuz
Cixare	: Sigara
Kişandin	: Çekmek
Qahwe	: Kahve
Bar	: Yük
Mêvan	: Misafir
Şerav	: Şarap
Tore-tore	: Çeşit-çeşit
Hungiv	: Bal
Şîranî	: Tatlı
Makîne	: Makîna
Gundî	: Köylü
Tirş	: Ekşi

### **Barkirin**

Em kera xwe bardikin dibin êş.  
Cîranê me fêkîyên xwe li makînê bardikin dibin bajêr.  
Dewlemend barê xwe li feqîran bardikin.

### **Hezkin**

Ez ji xwendinê hez dikim.  
Dersdarê me ji min gelek hez dike, ji ber ku ez xweş dixebitim.  
Tu ji goşt pir hez dikî?  
Gundî ji axê heznakin, ew ne merivek baş e.  
Kurd ji pîvazê gelek hez dikin.

**Ne** olumsuz, bir sıfattan önce gelirse onu olumsuz yapar:

Ew merivek baş e.  
Ew merivekne baş e.  
Tirî şîrî e, ne tirş e.  
Dew ne şîrî e, tirş e.

Olumsuzlama **nine** ile de yapılır.  
Dew şîrîn nine.

### Ödev:

- 1) Dotin, çêkirin, birin, frotin, kirin, barkirin, hezkirin fiillerinden üçer cümle kurunuz.
- 2) Bilind, nizm, fireh, teng, jêr jor, şîrîn, tirş sözcükleriyle olumlu ve olumsuz cümleler kurun.

### Vexwarin

Ez tî me, avê vedixwim.  
Zaro, çîma şîr venaxwe?  
Tu dêw vedixwî?  
Mêvan çay û qehwê vedixwin.

### Kişandin

Ker barê xwe dikişîne dibe êş.  
Tu cixarê dikişînî?  
Na xêr, ez cixarê nakîşînim.

### Ödev:

Vexwarin, xwarin ve kişandin fiillerinin geniş zaman çekimini yapın ve cümle içinde kullanın.

**Bûn** (olmak) fiilinin şimdiki (ve geniş) zaman ı:

Ez dibim      Em dibin  
Tu dibî      Hûn dibin  
Ew dibe      Ew dibin

### Olumsuzu:

Eznabim, tu nabî, ew nabe, em nabin...

Not:

- 1) **Bûn** (olmak) fiilinin şimdiki (ve geniş) zaman ı, **birin** fiilinin şimdiki (ve geniş) zamanıyla aynıdır.
- 2) **Bûn** fiilini Türkçede "dır", "idiler" takılarının işlevini gören Kürtçedeki daha önce gördüğümüz "**bûn**" fiiliyle karıştırmayalım.

### Örnek:

1. Bûn fiiline örnek:  
Peznexweş dibe: Koyun hasta olur.  
Pîvaz kê m nabe: Soğan eksik olmaz.

## 2. Bûn fiiline örnek:

Ez im : Benim  
Ez bûm : Ben idim  
Ew pîvaz e : O soğandır  
Ew pîvaz bû: O Soğandı.

## X

### DEMÊN SALÊ

Demên salê çar in: Bihar, havîn, payîz û zivistan.

Bihar xweş e. Roj erdê germ dike. Dar û ber hêşîn dibin. Li baxçan, çolan û çîyan kulîlkên rengîn vedibin. Mîh û bizin, kar û berx, hesp û ker li ser mêrgên kesk diçêrin. Ji herderê dengê çivîkan tê bihîstin. Cotkar cotê biharê dajon, koçer ber bi çîyan diçin.

Havîn germ e. Ceh û genim li zevîyan zer dibin. Fêkî li daran digêhin. Cotkar û karker li zevîyan û baxçan dixebitin, wan komdikin. Havîn bi bîhn û bereket e. Payîz ku tê, germa rojê her diçe kêmtir dibe. Baran dest pê dike. Pelên daran zer dibin û deweşin. Li mêrgan gîya tê çinîn. Koçer ber bi deştan vedigerin. Gundî sawar û ardê xwe dikin cî; gîya û êzingên xwe komdikin, dikin lod. Dibistan vedibin û zaro diçin dibistanê.

Zivistan sar e. Berf dibare û erdê dipêçe. Av qeşa dijire. Pez dikeve hundir. Di malan da sowe dişewitîn. Li der bayê sar dike vîze-vîz, li derî û pençiran dixê. Li ser berfê gur, rovî û kewroşk li xwarinê digerin. Zaro li ber derîyan goyê berfê dilîzin.

Ku bihar hat serma diçe, berf dihele, erd hişyar dibe û dinê ji nuh va şên dibe. Demên salê hemû jî xweş in.

Demên salê: *Mevsimler*

Dem : *Dönem, süre*  
Bihar : *Bahar*  
Havîn : *Yaz*  
Payîz : *Sonbahar*  
Zivistan : *Kış*  
Çol : *Kır*  
Kulîlk : *Çiçek*  
Kar : *Oğlak*  
Berox : *Kuzu*  
Hesp : *At*  
Mêrg : *Çayır*  
Çêrîn : *Otlamak*  
Çivîk : *Kuş*

Deng	: Ses
Bihîstin	: Duymak
Ajotin	: Çift sürmek (ekmek)
Koçer	: Göçebe
Komkirin	: Toplamak
Nu	: Yeni
Gihan	: Yetişme, Olgunlaşma
Bîhn	: Koku
Bereket	: Bereket
Her diçe	: Gittikçe
Baran	: Yağmur
Qeşa	: Buz
Girtin	: Almak
Ketin	: Düşmek
Sowe	: Soba
Lêxistin	: Vurmak, çarpmak
Dest pê kirin	: Başlamak
Pel	: Yaprak
Weşîn	: Dökülmek
Çinîn	: Biçmek
Deşt	: Ova
Helîn	: Erimek
Hişyar bûn	: Uyanış
Hêşîn bûn	: Yeşermek
Vegeîn	: Dönmek
Bi cî kirin	: Yerleştirmek
Gîya	: Ot
Êzing	: Odun
Lod	: Yiğın
Vebûn	: Açılmak
Sar	: Soğuk (sıfat)
Serma	: Soğuk (isim)
Şênbûn	: Şenlenmek
Berf	: Kar
Barîn	: Yağmak
Pêçandin, (pêçîn)	: Sarmak
Şewitîn	: Yanmak
Şewitandin	: Yakmak
Ba	: Rüzgar
Gur	: Kurt
Rovî	: Tilki
Kewroşk	: Tavşan
Gerîn	: Dolaşmak
Lê gerîn	: Aramak
Go	: Top
Dinê	: Dünya
Hemû	: Hepsi



Tüm basit fiillerin emir hali başa **bi** eklenerek yapılır.

Çûn	: <i>Biçe</i>
Xwendin	: <i>Bixwîne</i>
Nivîsandin	: <i>Binivîse</i>
Zanîn	: <i>Bizane</i>
Xebitîn	: <i>Bixebite</i>
Lîstin	: <i>Bilîze</i>
Xwarin	: <i>Bixwe</i>
Kirin	: <i>Bike</i>
Mayîn	: <i>Bimîne</i>
Dotin	: <i>Bidoşe</i>
Pêçan	: <i>Bipêçe</i>
Girtin	: <i>Bigire</i>
Şewitîn	: <i>Bişewite</i>
Birin	: <i>Bibe</i>
Frotin	: <i>Bifroşe</i>
Kirîn	: <i>Bikire</i>
Kişandin	: <i>Bikişîne</i>
Bûn	: <i>Bibe</i>
Çêran	: <i>Biçêre</i>
Bihîstin	: <i>Bibihîse</i>
Weşîn	: <i>Biweşe</i>
Çinîn	: <i>Biçine</i>
Barîn	: <i>Bibare</i>
Ketin	: <i>Bikeve</i>
Gerîn	: <i>Bigere</i>

Eğer mastar sesli harfle başlıyorsa:

Ajotin	: <i>Bajo</i>
Anîn	: <i>Bîne</i>

### **Bileşik fiiller**

Kürtçede iki grup bileşik fiil vardır:

Birinci grup bileşik fiiller, basit fiillerin başına önekler konarak oluşturulur:

*Komkirin, çêkirin, vexwarin, vegerîn, vebûn.*

İkinci grup bileşik fiiller bir isim ya da sıfat ile, bir basit fiilden oluşurlar:

Ava kirin (inşa etmek, imaretmek)  
Rast kirin (düzeltmek, kurmak)  
Hîn bûn  
Hişyar bûn  
Şên bûn

Edatların yardımıyla yapılan, filler:

Lê xistin (li wê xistin)  
Lê gerîn (li wê gerîn)  
Lê bar kirin  
Jê hez kirin

Basit fiillerde şimdiki (ve geniş zaman) çekimi:

<b>Mastar</b>	<b>Emir</b>	<b>Şimdiki zaman</b>	<b>Takılar</b>
Çûn (çûyîn)	Bîçe	Ez diçim Tu diçî Ew diçe Em diçin Hûn diçin Ew diçin	di...im di ...î di...e di...in di...in di ...in

Bu kuralın bazı istisnaları da vardır.

### Örnek

<b>Mastar</b>	<b>Emir</b>	<b>Şimdiki zaman</b>	<b>Takılar</b>
Anîn	Bîne	Ez fînim Tu fînî Ew fîne Em fînin Hûn fînin Ew fînin	fî ...im fî...î fî...e fî...in fî...in fî...in

Hatin	Were	Ez têm Tu tê Ew tê Em tên Hûn tên Ew tên
-------	------	---

### Olumsuzu:

Ez fînim -Ez nayînim  
Ez têm -Ez nayêm

<b>Mastar</b>	<b>Emir</b>	<b>Şimdiki Zaman</b>
Komkirin	Kombike	Ez komdikim Tu komdikî Ew komdike

Em komdikin  
Hûn komdikin  
Ew komdikin

Jê hez kirin

Jê hez bike

Ez jê hez dikim  
Tu jê hez dikî  
Ew jê hez dike  
Em jê hez dikin  
Hûn jê hez dikin  
Ew jê hez dikin

### Etkin - edilgen fiil

Meriv rojên biharê dengê çivîkan dibihîse. Rojên biharê dengê çivîkan tê bihîstin.

Hesen nîn dixwe.

Nan tê xwarin.

Edilgen cümle **hatin** yordimci fiiliyle yapilir.

**Nan**

**tê**

**Xwarin**

Nesne

yordimci fiil

mastar

### Alıştırma:

Aşağıdaki cümleleri edilgen yapın.

Cotkar cotê biharê dajon

Gundî li mêrgan gîyê diçinin

Zaro fêkîyan komdikin

Payîzan gundî êzing û gîya lod dikin

Zivistanan zaro goyê berfê dilîzin

Meriv avê û dew vedixwe, cixarê dikişîne

Ku perê merivan pir be, meriv têrî xwe rûn û penîr, şîr û goşt, şîranî û fêkîyan dixwe.

**Ber bi.....:..... e dođru**

Zarok ber bi mal diçe

Biharî, koçer ber bi çîyan diçin

Payîzî, koçer ber bi deştan vedigerin.

### Dest pê kirin

Baranê dîsa dest pê kir.  
Kîngê dibistan vedibe, zaro dest bi xwendinê dîkin.  
Ber bi zivistanê serma dest pê dike.  
Hesen! Îro dinya xweş e, dest bi xebatê bike.

### **Alîştîrma:**

Aşağıdaki soruları cevaplandırın.

- 1) Demên salê çend in?
- 2) Bihar çawa ye?
- 3) Biharî roj çî dike?
- 4) Biharî dar û ber çî dibin?
- 5) Kufîlk li ku vedibin?
- 6) Tu dengê çivîkan dibihîsî?
- 7) Mêrg çî reng in?
- 8) Biharî ceh û genin çî reng in?
- 9) Ceh û genim, havînî dibin çî reng?
- 10) Cotkar havînî çî dîkin?
- 11) Havîn çawa ye?
- 12) Payîzî germa rojê çî dibe?
- 13) Baran kîngê dest pê dike?
- 14) Serma kîngê dest pê dike?
- 15) Berf kîngê dibare?
- 16) Av kîngê qeşa digire?
- 17) Havînî av qeşa digire?
- 18) Payîzî pelên daran çî dibin?
- 19) Gundî sawar û ardên xwe çî dîkin?
- 20) Gundî êzing û gîyê çî dîkin?
- 21) Ku dibistan vebû zaro çî dîkin?
- 22) Zaro ji berfê çî çêdîkin?
- 23) Zivistanî mal çawa germ dibin?
- 24) Di mala we da sowe heye?
- 25) Berf erdê çî dike?
- 26) Zivistanî pez li çîyan e yan li gundan e?
- 27) Zivistanî gur, rovî û kewroşk çî dîkin?
- 28) Gur goşt dixwin?
- 29) Heşp goşt dixwin?
- 30) Ku dîsa bihar hat çî dibe?

Bihar.....biharî (li biharê)

Payîz.....payîzî (li payîzê)

Zivistan.....zivistanî (li zivistanê)

Biharan: Baharları

Zivistanan: Kışları

## XI

### XELÎL Û AZAD

- Rojbaş, Xelîl!
- Rojbaş, Azad!
- Mala we li bajêr e?
- Na, em li gund rûdinin.
- Bavê te çi karî dike?
- Bavê min cotkar e.
- Tu ji xwendinê hez dikî?
- Belê, zehf hez dikim.
- Xwîşkê te jî heye?
- Belê heye.
- Navê wê çi ye?
- Gulîzar e.
- Ew jî diçe dibistanê?
- Na, ew neçe.
- Çima?
- Bavo dibêje, "tu bixwîne bes e..."
- Erdê we heye?
- Na, em erdê axê da dixebitin.
- Hûn pêz xwedî dikin?
- Belê, lê pezê me kême.
- Çima?
- Mêrg û zevî hemû yê axê ne.
- Gundê we li deştê ye, yan li çiyê ye?
- Ciyê gundê me deşt e, lê çiya jî nêzik in.
- Zivistanî berf dibare?
- Belê, zehf dibare. Rê hemû têne girtin.
- Tu mala me nas dikî?
- Belê nas dikim.
- Sibê keremke, were mala me. Em bi hevra dersa xwe dixwînin.
- Bavê te tiştêkî nabêje?

- Çima? Bavê min ji hevalê min hez dike.
- Bavê te çi karî dike?
- Karker e, di pavlîkê da dixebite.
- Pavlîke mezin e?
- Belê, tê da pênc sed karker dixebitin.
- Pavlîke ya wan e?
- De ha!...Ya yekî dewlemend e. Li gund axa, li vir jî patron ango sermîyandar hene. De Xelîl, êdî dereng e, ez diçim. Sibê were ha!
- Belê, têm.
- Niha xatirê te!
- Ser çavan!

Rûniştin	: Oturmak ikamet etmek
Zehf	: Çok
Gotin	: Söyleme
Bes	: Yeter
Xwedî kirin	: Beslemek
Rê	: Yol
Girtin	: Tutmak
Nas kirin	: Tanımak
Keremke!	: Buyur!
Hevra	: Birlikte
De ha!	: Nerede!...
Sermîyandar	: Burjuva
Herdu	: Ikisi
Heval	: Arkadaş
Pavlîke	: Fabrika
Patron	: Patron
Dereng	: Geç
Zû	: Erken
Êdî	: Artık
Sibe	: Yarın
Xatirê te!	: Hoşçakal!
Niha	: Şimdî
Ser çavan	: Güle güle
Çav	: Göz
Kursî	: Kûrsü, Sandalye

**Hebûn** (malik olmak) fiilin şimdiki (ve geniş) zaman ı:

Min heye  
 Te heye  
 Wî, wê heye  
 Me heye  
 We heye  
 Wan heye

Çoğul: Min, te, wî, wê, me, we, wan hene.

Olumsuzuz: tune, tunin.

Xwîşka min heye  
Mala wan heye  
Darên we hene  
Kulîlkên wê hene

Görüldüğü gibi hebûn fiili 2. grup zamirlerle kullanılır.

### Rûniştin

1) Keremke, rûne!  
Ew li ser kursî rûdine.

2) Hûn li ku rûdinin? (Mala we li ku ye?)  
Em li Diyarbekrê rûdinin.

Kurala uygun fiiller ve kurala uymayan fiiller:

Kürtçede bütün fiiller mazi zamanlarında kurala uygundurlar.

Bazı fiiller emir, şimdiki zaman ve gelecek zaman kiplerinde kurala uygunluk göstermezler. Bunlara kurala uymayan fiiller denir.

### 1) Kurala uygun fiiller:

<b>Mastar</b>	<b>Kök</b>	<b>Emir</b>	<b>Şimdiki zaman</b>
Çinîn	Çinî	Biçine	Diçinim
Gerîn	Gerî	Bigere	Digerim
Kirîn	Kirî	Bikire	Dikirim
Nivîsîn	Nivîsî	Binivîse	Dinivîsim
Pêçan	Pêça	Bipêçe	Dipêçim
Gihan	Giha	Bigihê	Digihêm
Çûn	Çû	Biçe	Diçim
Zanîn	Zanî	Bizane	Dizanim

### 2. Grup:

Girtin	Girt	Bigire	Digirim
Bijartin	Bijart	Bibijêre	Dibijêrim
Hejmartin	Hejmart	Bihêjmêre	Dihejmêrim
Givaştin	Givaşt	Bigivêşe	Digivêşim
Parastin	Parast	Biparêze	Diparêzim

Bijartin : Seçme  
Hejmartin : Saymak

### 3: Grup:

Çêrandin	Çêrand	Biçêrîne	Diçêrînim
Helandin	Heland	Bihelîne	Dihelînim
Kîşandin	Kîşand	Bikîşîne	Dikîşînim
Nivîsandin	Nivîsand	Binivîsîne	Dinivîsînim
Tirsandin	Tirsand	Bitirsîne	Ditirsînim

## 2. Kurala uymayan fiiller:

**1. Grup:** Bu grup fiillerin emir halinin oluşumu belli bir kurala uymaz ama şimdiki ve gelecek zaman kiplerinin çekimi kurala uyar.

### Örnek:

Mastar	Kök	Emir	Şimdiki zaman
Dotin	Dot	Bidoşe	Didoşim
Jîn	Jî	Bijî	Dijîm
Ajotin	Ajot	Bajo	Dajom
Gotin	Got	Bibêje	Dibêjim
Kirin	Kir	Bike	Dikim
Birin	Bir	Bibe	Dibim
Xwarin	Xwar	Bixwe	Dixwim

**2. Grup:** Bu grup fiillerde emir hali ya şimdiki zaman, ya da hem şimdiki hem de gelecek zaman kiplerinin çekimini sağlamaz.

### Örnek:

Mastar	Kök	Emir	Şimdiki zaman
Anîn	Anî	Bîne	Tînim
Hatîn	Hat	Were	Têm

Bileşik fiillerin çekimi, bu bileşke deki fiillere göre olur.

### Örnek:

Mastar	Kök	Emir	Şimdiki zaman
Gerîn	Gerî	Bigere	Digerim
Vegerîn	--	Vegere	Vedigerim
Kirin	Kir	Bike	Dikim
Çêkirin	-	Çêbike	Çêdikim
Xwarin	Xwar	Bixwe	Dixwim
Vexwarin	-	Vexwe	Vedixwim



**Gotin** filinî şîmdîkî (ve geniş) zaman 1:

Ez dibêjim Em dibêjin  
Tu dibêjî Hûn dibêjin  
Ew dibêje Ew dibêjin

**Olumsuz:** Ez nabêjim, tu nabêjî....

**Aliştîrma:**

Aşağıdaki soruları cevaplandırın.

Mala Xelîl li bajêr e?  
Bavê Xelîl çi karî dike?  
Navê xwîşkê Xelîl çi ye?  
Gulîzar diçe dibistanê?  
Mala Xelîl çima pez kêr xwedî dikin?  
Tu li gund rûdinî yan li bajêr?  
Agiî çîya ye, yan deşt e?  
Li welatê we berf dibare?  
Zivistan sar e, yan germ e?  
Navê hevalê te çi ye?  
Tu ji hevalê xwe hez dikî?  
Bavê Azad çi karî dike?  
Li vî bajarî pavlike hene?  
Karker çi dikin?  
Cotkar çi dikin?  
Xelîl hevalê kê ye?  
Ew herdu heval bi hevra çi dikin?

## XII

### ŞEV Û ROJ

Dema berbangê ye. Rojhilat sor dike. Dinê hêdî-hêdî ronak dibe û roj derdikeve. Hîv û stêr wînda dibin.  
Gundî û bajarî ji xewê radibin. Di gundan da ji pixêrîgan dû bilind dibe. Kewanî taştê çêdikin. Şivan pez ber bi çolan û zozanan dibin. Cotkar diçin bistan û zevîyan.  
Di bajaran da jî hemû xebatkar ji mal derdikevin diçin ser karê xwe. Hewa her diçe germ dibe. Wexta nivro xelk navroya xwe dike. Êvarê xebat diqede û xelk vedigere mala xwe. Roj diçe avan. Dinê tarî dibe. Li êzmîn bi

hezaran stêr xuya dikin û dibiriqîn. Hin şevan hîv dibe û dinê ronak dike. Lê germiya hîvê tune û ronahîya wê mîna rojê ne xurt e.

Piştî şîvê gundî zû radizên. Ji ber ku, ew sibê zû radibin. Bajarî şevan dereng radizên û dereng xew da diçin.

Roj bîst û çar saet in; nîvî roj e, nîvî şev e. Havînî roj dirêj in, şev kurt in; zivistanî roj kurt in, şev dirêj in. Salê du caran, di 21`ê Adarê û 21`ê Îlonê da şev û roj qasî hev in, her yek 12 saet in.

Berbang	: Şafak
Rojhilat	: Doğu
Roj	: Gün, gündüz, güneş
Ronak	: Aydınlik
Derketin	: Çıkmak
Hîv	: Ay
Stêr	: Yıldız
Xew	: Uyku
Rabûn	: Kalkmak
Pixêrig	: Baca
Dû	: Duman
Kewanî	: Ew kadını
Ta şî	: Kahvaltı
Şivan	: Çoban
Zozan	: Yayla
Bistan	: Bostan
Xebakar	: Emekçi
Hewa	: Hava
Xuya kirin	: Görünmek
Wext	: Zaman
Nîvro	: Öğlen
Xelk	: Halk
Navro	: Öğle yemeği
Qedandin	: Bitirmek
Rojava	: Batı
Hîn	: Henüz
Winda bûn	: Kaybolmak
Winda	: Kayıp
Nêrîn	: Bakmak
Gazî kirin	: Seslenmek
Nîsan	: Nisan
Gulan	: Mayıs
Pelg	: Yaprak
Tarî	: Karanlık
Ezman	: Gökyüzü
Hezar	: Bin
Hema	: Hemen
Biriqîn	: Parlamak
Xurt	: Güçlü
Piştî	: Sonra

Şîv : Akşam yemeği  
Razan : Uyumak  
Ji ber ku : Çünkü  
Xew da çûn: Uyumak  
Ji xew rabûn : Uyanmak, kalkmak  
Hişyar bûn : Uyanmak  
Nîv : Yarım  
Dirêj : Uzun  
Kurt : Kısa  
Adar : Mart  
Îlon : Eylül  
Qasî : Kadar  
Qasî hev : Birbiri kadar  
Her yek : Herbiri  
Hin : Bazi  
Pa şîv : Yatsı sırasında yenen yemek

### Rojhilat - Rojava

Dema sibê roj li ku ye? Li rojhilatê ye.  
Dema êvarê roj li ku ye? Li rojava ye.  
Dema berbangê rojhilat sor dike, lê rojava hîn tarî ye.  
Roj hilatin - Roj çûn avan  
Sibe ye, roj hiltê (roj derdikeve)  
Êvar e, roj diçe avan.

### Navro kirin, şîv kirin, taştî kirin

Germ	: Sıcak	Bilind	: Yüksek
Germî	: Sıcaklık	Bilindî	: Yükseklik
Şîrîn	: Tatlı,	Şivan	: Çoban
Şîrînî	: Tatlı şeyler	Şivanî	: Çobanlık

Kürtçede sıfat ve isimlere eklenen (î) harfiyle yeni isimler türetilir.

### Örnek:

Cotkar - Cotkarî	Nêzîk - Nêzîkî
Fireh - Firehî	Hêşîn - Hêşînî
Kurt - Kurtî	Dereng - Derengî
Karker - Karkerî	Dirêj - Dirêjî
	Feqîr - Feqîrî

### Razan - Rabûn

#### Xew da çûn - Ji xew rabûn

Xelîl êvarê zû radizê û xewda diçe.

## Azad dereng radizê

- Xewa te tê?
- Na, xewa min nayê.
- Tu kîngê radizê?
- Ez her şev saet 10`an da radizêm. Lê tu?
- Ez tim saet 9`an da radizêm û hema xew da diçim.
- Kingê radibî?
- Tim di saet 6`an da ji xew radibim.
- Dîya te kîngê radibe?
- Ew zû hişyar dibe.

Elo sibê ji xew radibe, denêre ku xwîşka wî Bes hîn xewê da ye. Dîya xwe ra dibêje.

- Dayê, Besê hişyar bike, dereng e. Wexta dibistanê tê.
- Baş e, ez niha wê hişyar dikim. Û gazî Besê dike: "Besê! Rabe, êdî dereng e."

## Nivîsandîna wext

Bîst û yek : 21  
Bîst û yekê Adarê : 21`ê Adarê  
Panzdeh : 15  
Panzdehê Gulanê : 15`ê Gulanê  
Heftê Nîsanê, sala 1979: 7`ê Nîsanê, sala 1979 - 7/4/1979

## Qasî - Qasî hev

Xelîl û Azad qasî hev in, herdu jî 14 safî ne.  
Deftera min qasî deftera te ye, herdu jî 40 pelg in. (Her yek 40 pelg in)

**Ödev:** Aşağıdaki soruları cevaplandırın:

- 1- Dema berbangê rengê rojhilatê çawa ye?
- 2- Sibê dinê çawa ronak dibe?
- 3- Ku roj derdikeve hîv û stêr çî dibin?
- 4- Şevan stêr li ku dibiriqin?
- 5- Meriv kîngê ji xewê radibe, sibê yan êvarê?
- 6- Wexta sibê ji pixêrîgan çî bilind dibe?
- 7- Kewanî çî karî dikin?
- 8- Şivan, dema sibê pez ber bi ku dibin?
- 9- Di bajaran da xebatkar wexta sibê çî dikin?
- 10- Navro kingê tê xwarin?
- 11- Şîv kingê tê xwarin?
- 12- Xelk taştê kingê dike?
- 13- Xelk navro kingê dike?
- 14- Gundî, piştî şîvê, paşîv jî dixwin. Bajarî jî pa şîv dixwin?
- 15- Roj kîngê diçe avan?

- 16- Roj ku diçe avan çi dibe?  
 17- Hîv jî mîna rojê dinê germ dike?  
 18- Ronahîya hîvê xurt e, yan ya rojê?  
 19- Gundî zû radizên, yan bajarî? Çima?  
 20- Gundî kîngê radizên?  
 21- Roj çend saet in?  
 22- Pirtûka te çend pelg e?  
 23- Havînî roj dirêj in, yan şev?  
 24- Kîngê şev dirêj in?  
 25- Kîngê şev û roj qasî hev in?  
 26- Sîpan qasî Agirî bilind e?

### Ödev:

Kurala uygun şu fillerin şimdiki zaman çekimini yapınız:  
 Girtin, zanîn, kirîn, bajaran, kişandin, nivîsandin.

	<b>Kök</b>	<b>Emir</b>	
Derketin	Derket	Derkeve	Ez derdikevim Tu derdikevî Ew derdikeve Em derdikevin Hûn derdikevin Ew derdikevin
Qedandin	Qedand	Biqedîne	Ez diqedînim...
Nêrîn	Nêrî	Binêre	Ez dinêrim...
Nihêrtin	Nihêrt	Binhêre	Ez dinihêrim...
Biriqîn	Biriqî	Bibiriqe	Ew dibiriqe...
Razan	Raza	Razê	Ez radizêm Tu radizê Ew radizê Em radizên Hûn radizên Ew radizên
Rabûn	Rabû	Rabe	Ez radibim Tu radibî Ew radibe Em radibin Hûn radibin Ew radibin

**Mehên salê:**  
Tebax,

Çileyê Paşîn, Sibat, Adar, Nîsan, Gulan, Hizêran, Tirmeh,  
Îlon, Çirîya Pêşîn, Çirîya Paşîn, Çileyê Pêşîn.

## XIII

### LI SÛKÊ

Roja şemîyê bû. Xezalê, ji kurê xwe Azad ra got:

-Ez diçim sûkê, tu jî bi min ra were. Alîkarîya min bike.

Wî û dîya xwe zembîl û tûr girtin û çûn. Sûk ji mala wan ne dûr bû. Berê çûn dikanekê ku tê da solan difroşin. Xezalê li solan nêrî û bi cotek qondire qayîl bû. Ji dikandar pirsî:

- Buhayê van çi ye?

- Hezar û du sed pangnot.

- Uff!.. Gelek buha ye.

- Ku dixwazî yê erzan jî hene. Ka binêre, got û cotek qondirê din nîşan da.

- Ew bi çi ne?

- Neh sed pangnot in.

- Bi heft sedî nabe?

- Nabe. Ji heyşt sed û pêncî kêmtir nafroşim.

Xezalê ew jî ne kirî û ji dikanê derketin. Dikandar bi dû wan destê xwe hejand û got:

- Li sûkê bigerin, dibê ku hûn yê erzantir dibînin!

Ew li hin dikanên din jî gerîn, lê wekî gotina dikandarê pêşîn bû. Sol li her derê buha bûn. Paşê dev ji sol kirîne berdan.

Lê tenê sol buha bûn? Hertişt usa bû. Sûk bi mêl tije bû. Her texlît tişt dihat frotin. Cilê mêran, cilê jinan, tiştên xwarinê, lîstok û heta trampêlan... Lê tu were bikire! Ew gofî feqîran ne bûn.

Çavê Azad di kiras û pantolekî da ma. Paşê, dê jê ra kirasekî erzan û cotek gore kirî.

-Em bo tiştên xwarinê hatin û ketin mesrefê! Got dîya wî.

Paşê çûn dikanekê ku li wir tiştên xwarinê tînin frotin. Xezalê penîrê Ruhayê nîşan da û pirsî:

-Ew penîr bi çi ye?

-150 pangnot.

-Ewa jorîn?

-90 pangnot.

-Jê kîlokî bide. Hêk bi çi ne?

-Şeş pangnot.

-Pênc hew jî hêk diwazim.

Xezalê û Azad li wir kîlok jî zeytûn, du kîlo şekir, kîlok tirî, çar hew jî nan girtin û ew kirin zembîlê û tûr, vegeirî hatin mal.

Sûk : Çarşı, pazar

Şemî	: Cumartesi
Kur	: Oğul
Alîkar	: Yardımcı
Tûr	: Torba
Dikan	: Dükkan
Dikandar	: Dükkançı
Berê	: Önce
Qayîl bûn	: Beğenmek
Pirsîn	: Sormak
Buha	: Fiyat, paha
Pangnot	: Lira
Alîkarî kirin	: Yardım etmek
Zembîl	: Sepet
Jêrîn	: Aşağıdaki
Dû	: Arka, gerî
Dest	: El
Hejandin	: Sallamak
Dîtin	: Görmek
Pêşîn	: Önceki, ilk
Dev	: Ağız
Berdan	: Bırakmak
Usa	: Öyle
Mal	: Mal
Tijî	: Dolu
Cil (Kinc)	: Elbise
Sol	: Ayakkabı
Cot	: Çift
Mêr	: Erkek
Jin	: Kadın
Lîstok	: Oyuncak
Heta (heya):	.....e kadar
Trampêl	: Otomobil
Lê vegerandin	: Cevap vermek
Jorîn	: Yukardaki
Gor	: Göre
Kiras	: Gömlek
Pantol	: Pantolan
Texlît	: Çeşit
Çakêt	: Ceket
Xwestin	: İstemek
Erzan	: Ucuz
Gore	: Çorap
Ketin	: Düşmek, girmek
Mesref	: Masraf
Ruha	: Urfa
Kîlo	: Kilo
Zeytûn	: Zeytin
Şekir	: Şeker

Lê xistin : *Vurmak*  
Dan : *Vermek*  
Bide : *Ver*  
(*Dan'ın emir hali*)  
Bersîv : *Cevap*  
Hew : *Tane*

**Kiyaslama sıfatı (Comperatif): tır**

Mezin : *Büyük*  
Mezintir : *Daha Büyük*

Erzan : *Ucuz*  
Erzantir : *Daha ucuz*

Kêm : *Az*  
Kêmtir : *Daha az*

Bilind : *Yüksek*  
Bilindtir : *Daha yüksek*

**Tê da : Di wê da**

Di wê dikanê da tiştên xwarinê hebûn.  
Tê da tiştên xwarinê hebûn.

**Jê ra : Ji wî ra**

Xezalê ji wî dikandaî ra got.  
Xezalê jê ra got.

Bunun gibi: Li wê : *Lê*

Bi wê: *Pê*

**Örnek:**

Min li wî zaraokî ne xist  
Min lê ne xist  
Ez bi wî ra çûm bajêr  
Ez pê ra çûm bajêr

**Özneye dönüştü zamir- Xwe (kendî)**

Ez dersa xwe dixwînim  
Dersa xwe: *Dersimi*  
Biçe hevalê xwe bibîne.  
Hevalê xwe: *Arkadaşını*  
Xezalê, kurê xwe Azad ra got.  
Kurê xwe Azad ra: *Oğlu Azad`a*



Wî û dîya xwe: O ve annesi...

Binêre: *Bak*

Ka binêre: *Bak bakalım, bir bak...*

Dev jê berdan: Pe şînî bırakmak, vazgeçmek

Paşê dev ji **sol kirîne** berdan

" " Ji wê "

" " Jê "

Çav tê da man: Onda gözü kalmak, imrenmek

Çavê Azad di kirasekî da ma.

" " **di wê da** ma.

**tê da** ma.

### Geçişli-geçişsiz filler

Geçişli fill, öznesinin yaptığı iş başka bir şeyi etkileyen fiildir. Diğer bir deyişle, nesnesi olan fiildir.

#### Örnek:

Min av vexxwar: *Ben su içtim*

Burada özne ben, fill içmek, nesne ise su'dur. İçmek fiilli ile su (nesne) etkilenmiştir.

Geçişsiz fill ise, başkasını etkilemeyen, diğer bir deyişle nesnesi olmayan fiildir.

#### Örnek:

Çûk difire: *Kuş uçar*

"Burada öznenin (kuş) yaptığı iş (uçmak) başkasını etkilemiyor.

Geçişli fillerin dili geçmiş zamanı:

### 1- Basit geçişli fiiller

#### Örnek kirin:

Min kir      Me kir

Te kir      We kir

Wî, wê kir      Wan kir      Olumsuz: Min ne kir..

Mazi zamanlarının olumsuzluk edatı (**ne**) dir.

Min xwar

Me xwar

Te xwar

We xwar

**Xwarin**      Wi, wê xwar

Wan xwar

Olumsuz: Min ne xwar

<b>Gotin</b>	Min got	Me got
	Te got	We got
	Wi, wê got	Wan got

Olumsuzu: Min ne got

Görüldüğü gibi geçişli basit fiillerin dili geçmiş zamanında fiil kökü takı almaz. Bunun gibi:

<i>Kirîn</i>	:	Min kirî (kök: kirî), te kirî, wan kirî	
<i>Frotin</i>	:	Min frot, te, wî, wê, me we, wan frot	
<i>Nêrîn</i>	:	Min, te wî, wê, me we, wan nêrî	
<i>Pirsîn</i>	:	" " " " " " " "	pirsî
<i>Xwastin</i>	:	" " " " " " " "	xwast
<i>Hejandin</i>	:	" " " " " " " "	hejand
<i>Berdan</i>	:	" " " " " " " "	berda
<i>Dan</i>	:	" " " " " " " "	da
<i>Girtin</i>	:	" " " " " " " "	girt

Bu gruba giren diğer bazı fiiller:

<i>Anîn</i>	:	<i>Anî</i>
<i>Avêtin</i>	:	<i>Avêt</i>
<i>Kuştin</i>	:	<i>Kuşt</i>
<i>Qedandin</i>	:	<i>Qedand</i>
<i>Çinîn</i>	:	<i>Çinî</i>
<i>Pêçan</i>	:	<i>Pêça</i>
<i>Zanîn</i>	:	<i>Zanî</i>
<i>Nivîsîn</i>	:	<i>Nivîsî</i>
<i>Parastin</i>	:	<i>Parast</i>
<i>Tirsandin</i>	:	<i>Tirsand</i>
<i>Hejmartin</i>	:	<i>Hejmart</i>
<i>Bijartin</i>	:	<i>Bijart</i>
<i>Givaştin</i>	:	<i>Givaşt</i>
<i>Çêrandin</i>	:	<i>Çêrand</i>
<i>Helandin</i>	:	<i>Heland</i>
<i>Kişandin</i>	:	<i>Kişand</i>
<i>Nivîsandin</i>	:	<i>Nivîsand</i>
<i>Dotin</i>	:	<i>Dot</i>
<i>Birin</i>	:	<i>Bir</i>

2) Basit geçişli fiillerle yapılan bileşik fiillerde de kural aynıdır.

<i>Kirin</i>	:	<i>Kir</i>	<i>Vekirin</i>	:	<i>Vekir</i>
<i>Anîn</i>	:	<i>Anî</i>	<i>Deranîn</i>	:	<i>Deranî</i>

<i>Dest pê kirin</i>	:	<i>Dest pê kir</i>
<i>Hez kirin</i>	:	<i>Hez kir</i>

## Geçişsiz fiillerde dili geçmiş zaman

Kökün son harfi sesli ise

### Çûn - Kök: Çû

Ez çûm	<i>m</i>
Tu çûyî	<i>yî</i>
Ew çû	-
Em çûn	<i>n</i>
Hûn çûn	<i>n</i>
Ew çûn	<i>n</i>

Kökün son harfi sesiz ise

### Hatin-Kök: hat

Ez hatim	<i>im</i>
Tu hafî	<i>î</i>
Ew hat	-
Em hatin	<i>in</i>
Hûn hatin	<i>in</i>
Ew hatin	<i>in</i>

Basit geçişsiz fiillerle yapılan bileşik fiillerde kural aynıdır.

## Örnek:

*Derketin:*

Ez derketim	Em derketin
Tu derketî	Hûn derketin
Ew derket	Ew derketin

Geçişsiz basit fiillerden diğer örnekler:

<i>Razan</i>	: Ez razam, tu razayî, ew raza, em razan....
<i>Rabûn</i>	: Ez rabûm, tu rabûyî
<i>Bûn</i>	: Ez bûm, tu bûyî
<i>Ketin</i>	: Ez ketim, tu ketî...

Görüldüğü gibi geçişsiz fiillerin mazi zamanlarında 1. grup zamirler, geçişli fiillerin mazi zamanlarında ise 2. grup zamirler kullanılıyor.

## Alikarî kirin

Azad alîkarîya dîya xwe kir.  
Tu alîkarîya hevalê xwe bike.

## Pê qayîl bûn

- Tu bi vî çakêfî qayîl bûyî?
- Na ew teng e.
- Ka li vî binêre, ev gora te ye?
- Belê, ez pê qayîl bûm.

Ez **bi vî** qayîl bûm.

Ez **pê** qayîl bûm.

### **Pirs, bersîv û lê vegerandin**

Dersdar ji Elo pirsî:

- Hîv û stêr li ku ne?

Elo bersîva wî da:

- Li êzmîn in.

Xezalê ji dikandar pirsî:

-Ev cotê qondirê bi çi ne?

Dikandar lê vegerand:

-Hezar û du sed pangnot in.

### **Jêrîn - jorîn**

Jêr - Jêrîn (aşağıdaki)

Jor - Jorîn (Yukardaki)

Zêr (altın) -zêrîn (altından)

Zîv (gümüş)- Zîvîn (gümüşten)

### **Bersîva pirsên jêrîn bidin:**

- 1) Xezal û kurê xwe kîngê (kîjan rojê) çûn sûkê?
- 2) Ewana, ji mal çi girtin û çûn?
- 3) Çima Azad tevî dîya xwe çû? Dîya wî jê ra çi got?
- 4) Sûk ji mala wan dûr e yan nêzîk e?
- 5) Ew berê çûn kîjan dikanê?
- 6) Xezalê ji dikandar ra çi got?
- 7) Dikandar çawa lê vegerand?
- 8) Ew cotê qondirê erzan bû, yan buha bû?
- 9) Mêrê Xezalê çi karî dike?
- 10) Buhayî, bo karker û sermîyandaran yek e? Çima?
- 11) Xezalê cotê qondirê kirî, yan ne kirî?
- 12) Di sûkê da çi tèn frotin?
- 13) Azad bi çi qayîl bû?
- 14) Dîya wî jê ra çi kirî?
- 15) Li dikana xwarinê Xezalê çi kirî?
- 16) Çima penîrê Ruhayê ne kirî?
- 17) Hêk bi çi bûn?
- 18) Wan çend hew hêk kirî?

Xezalê penîr kirî.

Xezalê pênc hew hêk kirî.

Azad sêvek xwar.

Azad du sêv xwarin.

Görüldüğü gibi nesne çoğul olunca, çoğul eki fiile yansır:

..... hêkek kirî                      ..... Sêvek xwar  
..... pênc hêk kirîn                ..... du sêv xwarin.

## XIV

### TIŞTÊN LI XWE KIRINÊ

Merivên dema şkeftan bê cil bûn. Ewana, berê heywanê kûvî kuştin, goştê wan xwarin û postê wan li xwe kirin. Piştî hêdî hêdî se, hesp, ker, pisîng, çêlek, mîh û bizin kedî kirin. Li hespan sîyar bûn, bi ga û hespan erd ajotin. hirîya mîh û bizinan rêstin û pê tiştên li xwe kirinê çêkirin.

Merivên îroyînî pir textîf tişt li xwe dikin.

Mêr çakêt, pantol, sako, êlek li xwe dikin, şewqa didin serê xwe. Jin fîstan û manto li xwe dikin. Lê li dewra îroyînî cilên jin û mêran nêzî hev e. Jin jî wek mêran, çakêt û pantol li xwe dikin. Lê dîsa jî, cilên mêran û yên jinan ji hev cuda dibin.

Meriv di bin da kiras û derpê li xwe dikin, sol û gore dikin pê. Kiras û derpê ji cawê tenik in. Sako û manto ji qumaşên stûr in, merivan germ dikin.

Tiştên li xwe kirinê, piranî ji pembu, hirî, û îbrîşim çêdibin. Sol ji çermê heywanan çêdibe.

Cilê Kurdan yê gelêrî şal û şapik e. Ew, şal û şapik li xwe dikin, koloz didin serê xwe û piştê girê didin. Jin jî kofî didin serê xwe û wê bi perên zêr û zîv û bi destmalên rengîn dixemilînin.

Li xwe kirin	: <i>Giyinmek</i>
Şkeft	: <i>Magara</i>
Dema şkeftan	: <i>Mağara çağı</i>
Bê cil	: <i>Elbisesiz</i>
Tazî	: <i>Çıplak</i>
Kûvî	: <i>Yabanî, vahşî</i>
Heywan	: <i>Hayvan</i>
Kuştin	: <i>Öldürmek</i>
Post	: <i>Deri</i>
Pisîng	: <i>Kedî</i>
Kedî	: <i>Ehli</i>
Kedî kirin	: <i>Ehlileştirme</i>
Sîyar	: <i>Binici, atlı</i>
Sîyar bûn	: <i>Binmek</i>
Ga	: <i>Öküz</i>
Hirî	: <i>Yün</i>
Rêstin	: <i>Örmek</i>

Çakêt	: Ceket
Sako	: Palto
Êleg	: Yelek
Şewqe	: Şapka
Kofî	: Kürt kadınlarının başlığı
Dan	: Vermek
Destmal	: Mendil
Rengin	: Renkli
Fîstan	: Entarî
Manto	: Manto
Cuda	: Ayrı, farklı
Cuda bûn	: Ayrılmak, fark etmek
Derpê	: Don
Pê	: Ayak
Ling	: Ayak, bacak
Pê kirin	: Giymek, (ayakabı)
Xemilandin: Sûslemek	
Ser	: Baş
Caw	: Bez
Tenik	: İnce
Stûr	: Kalın
Qumaş	: Kumaş
Pembu	: Pamuk
Îbrîşim	: İpek
Çerm	: Deri
Gelêrî	: Ulasal
Şal û şapik	: Pantolon ve cepkenden oluşan bir Kürt ulusal giysisi
Pîşt	: Bel, kuşak
Girê dan	: Bağlamak
Serqot	: Baş açık
Hevok	: Cümle
Vala	: Boş
Lêker	: Fiil

Tiştên li xwe kirinê	: Giyilecek şeyler
Tiştên xwarinê û vexwarinê	: Yiyilecek- içilecek şeyler
Tiştên frotinê	: Satılık şeyler

#### **Li xwe kirin:** Giyinmek

Çaketê xwe li xwe bike : Ceketini giy.  
 Sar e, ez sakoyê xwe li xwe dikim.  
 Elîfê du mantoyê xwe li xwe kir.  
 Merivên dema berê postê heywanan li xwe kirin.

#### **Cil lê kirin** : Giydirmek

Wexta dibistanê hat, cilê lawik lê bike.

Lê bike : **li wî** bike

**lê** bike

### **Av li xwe kirin:** Yıkanmak

Keçik avê li xwe dike.  
Min du av li xwe kir.

### **Dan serî**

Meriv şewqe didin serê xwe  
Ez şewqe nadim serê xwe, serqot digirim.  
Elifê kofî da serê xwe.  
Hesen, şewqê xwe bide serê xwe!

### **Pê kirin**

Xelîl, solê xwe bike pê!  
Meriv sol û gore dikin pê.  
Elifê qondireyên nu ne kir pê, ji ber ku, ew teng bûn.  
Te solê xwe pê kir?

Bu fiillerin kısaltılmış biçimlerine dikkat edelim:  
Solê xwe bike pê yerine - Solê xwe pê ke.  
Çakêtê xwe li xwe bike yerine - Çakêtê xwe li xwe ke  
Şewqê xwe bide serê xwe yerine - Şewqê xw serê xwe de.  
Cilê lawik lê bike yerine - Cilê lawik lê ke.

### **Ji xwe kirin - derxistin - tazî bûn**

Kürtçede elbise çıkarma yerine kullanılırlar.  
Wî çakête xwe derxist.  
Germ e, sakoyê xwe derxe.

"*Ji xwe kirin*" da çıkarmak, soyunmak anlamındadır; ancak ender kullanılır.  
Çakêtê xwe ji xwe bike.

"*Derpê ji xwe kirin*" hayasızlığı ele almak anlamına gelir:  
Te çi derpê ji xwe kirîye!  
"*Tazî bûn*" çıplak olma anlamındadır:  
Hemû cilên xwe derxe, tazî be!

### **Îroyînî - duhinî**

Îroyînî : *Bügünkü* Duhinî : *Dünkü*  
Dewra îroyînî: *Çağımızda, günümüzde*  
Tu zaroyê duhinî yî: *Sen dünkü çocuksun*

## Sîyar bûn

Hespek me heye, lez lê sîyar dibim.

Hesen li tîrenê sîyar bû hat Enqerê (Hesen bi tîrenê hat).

- Tu, heta Vanê bi çi çûyî?

- Ez li otobozê sîyar bûm, çûm. (Bi otobozê çûm)

## HALETÊN PÎVANÊ

Haletên pîvanê bo granîyê, dirêjahîyê, hêjayîyê û hwd... in. Meriv di saya van haletan da tiştan dipîve.

Di Kurdistanê da bo pîvandina giranîyê weqî û lîtir heye. Heyşt weqî lîtîrek dike. Weqîyek 400 dîrhem e.

Di Kurdistanê da bo pîvandina ceh û genim û tiştên wekî wan, çap, nîvçap kod heye.

Pere hêjayîyê dipîve. Meriv, di saya pere da hertiştî dide û distîne. Ji ber ku Kurdistan azad nîne, perê wê yê gelêrî tunin. Lê di Kurdî da, ji bo "lîra" pangnot, yan jî kaxit tê gotin.

Meriv dirêjahîyê bi mêtro dipîve.

Di Kurdistanê da fêkî, hêk û hwd. bi alîyê **zo** û **ber** ji tînen pîvandin: Wekî du zo, sê zo... Yan berek, du ber, sê ber... Zoyek du hew e, berek sî hew e.

Halet : *Araç, alet*

Hewce : *Gerekî*

Hewce bûn: *Gerekî olmak*

Pîvan : *Ölçmek*

Granî : *Ağırlık*

Dirêjahî : *Uzunluk*

Kaxit : *Lira, kağıt*

Nîvçap : *Çap`ın yarısı*

Kod : *Çap`ın dörtte biri*

Beroş : *Bakraç*

Standin : *Almak*

Dan û : *Alış-Veriş*

Standin

Weqî : *Okka (1283 gr.)*

Çap : *Tenekeden küçük bir hacim ölçüsü*

Lîtir : *Batman*

Zo : *Çift*

Hwd. : *Bunun gibi*

(Her wekî din)

Azadî : *Özgürlük*

Perê gelêr : *Ulusal para*

Çilê gelêr : *Ulusal giysi*

Mêtro : *Metre*

Ber : *Otuzluk grup*



## Çi tê gotin?

Kurdî, ji "lîra" ra pangnot tê gotin.

- Di Tirkî da bo haletên pîvanê çi tê gotin?

- Di Tirkî da bo haletên pîvanê "ölçüm araçları" tê gotin.

## Yardımcı fiiller

*Bûn, hatin, kirin, dan*, filleri birçok durumda yardımcı fiill görevi yaparlar. Cümleyi edilgen yapmakta da *hatin* fiili yardımcı fiil olarak görev yapar.

### Örnek:

Kurd ji "lîra" ra pangnot dibêjin.

Di kurdî da, ji "lira" ra pangnot **tê** gotin. (Burada **tê**, *hatin* fiilinin geniş zamanının üç üncü tekil şahsa uygun biçimidir.)

Tê gotin : Denir

Tê xwendin: Okunur

Tê nivîsandin : Yazılır

Bileşik kiplerin yapımında görev alan *bûn* fiili ile bileşik fiillerin yapımına katılan *bûn, hatin, dan, kirin* filleri yardımcı fiillerdir.

### Hînkirin:

Di hevokên jêrîn da cîyên vala tije bikin:

1-Roja şemiyê Xezal û kurê xwe.... .....sûkê.

2.-Xezalê ji dikandar..... Buhayê van çi ye?

3- Êvarî roj.....avan.

4- Sibê dinê hêdî hêdî ronak..... û roj.....

5- Zivistanî berf.....û erdê.....

6- Kar û berx li ser mêrgan.....

7- Payîzî pelên daran.....

8- Ez ji hevalê xwe.....

9- Perê Xezalê tune bû; wê ji xwe ra cotek sol.....

10- Gundî êvarî zû.....

11- Min 200 pangnot..... û weqîk rûn.....

12- Di dikanê da tiştên xwarinê.....

13- Meriv kiras û derpe....., sol û gore.....

şewqe.....

14- Sol ji çermên heywanan.....

15- Jin serê xwe bi perên zêr û zîv.....

16- Meriv dirêjahiyê bi mêtro.....

17- Du min beroşek rûn bir li cem dikandar....., rûnê min çar û nîv weqî.....

û

18- Nan tê.....,av tê.....cixare tê.....

Bersîva pirsên jêrîn bidin:

- 1- Merivên dema şkeftan çî li xwe dikirin?
- 2- Merivên berê heywanê kûvî çî dikirin?
- 3- Merivên berê heywanê kûvî çî dikirin?
- 3- Merivan kîjan heywan kedî kirin?
- 4- Gur kûvî ye yan kedî ye?
- 5- Kewroşk kûvî ye yan kedî ye?
- 6- Meriv li hespan çî dike?
- 7- Meriv bi gan çî dike?
- 8- Meriv bi çêlekan çî dike?
- 9- Meriv hirîya mîh û bizinan çî dike?
- 10- Meriv şîrê kerê vedixwin? Ew bi kerê çî dikin?
- 11- Mêr çî li xwe dikin?
- 12- Mêr fîstan li xwe dikin?
- 13- Jin çî li xwe dikin?
- 14- Meriv çî dikin pê?
- 15- Mêr çî didin serê xwe?
- 16- Meriv li hevînê sako li xwe dikin? Çima?
- 17- Meriv di bin da çî li xwe dikin?
- 18- Gundîyan berê caw çêdikirin. Niha ji çêdikin?
- 19- Pelgê pirtûkê tenik e, yan stûr e?
- 20- Tiştên li xwe kirinê ji çî çêdibin?
- 21- Sol ji çî çêdibin?
- 22- Cilê Kurdan yê gelêrî çî ye?
- 23- We çawan pişt girê da?
- 24- Jinê Kurdan çî didin serê xwe û wê çawa dixemilînin?
- 25- Haletên pîvanê çira dibin?
- 26- Di Kurdistanê da bo pîvana granîyê çî halet hene?
- 27- Lîtîrek çend weqî ye?
- 28- Di Kurdistanê da ceh û genim bi çî tên pîvandin?
- 29- Pere çî dipîve?
- 30- Dewra îroyînî dan û standin di saya çî da dibe?
- 31- Perê Kurdistanê yê gelêrî heye? Çima?
- 32- Stranên Kurdan yê gelêrî hene?
- 33- Meriv dirêjahîyê bi çî dipîve?
- 34- Pênc zo sêv çend hew dike?
- 35- Du ber gûz çend hew dike?

Mala Şahan li Diyarbekrê ye. Bavê wî di dibistanê da dersdar e. Ew di kirê da rûdinin. Mala wan piçûk e; du ode û mitbaxek wê ya piçûk heye. Mal ji wan ra gelek teng e, lê çî bikin, kirêya malên fireh pir buha ye; ew pê nikanin. Mala wan piçûk e, lê paqij e. Dîya Şahan, Zelal, gelek jêhafî ye, ji paqijiyê hez dike. Malê dimale, kincan dişo, fere û folan dibiriqîne. Dîya Şahan, her sibê saet heftan da wî hişyar dike. Şahan ji nivînê radibe û dev û rûyê xwe bi sabûnê dişo, diranê xwe bi firçê paqij dike û porê xwe şe dike. Piştî wê, cilê xwe li xwe dike û tê sifrê. Xwarina wan di taştê da nan, çay û zêytûn an jî çay û penîr e. Dîya wî carcaran jî hêkan dikelîne. Şahan ji şîr û hungiv gelek hez dike, lê bavê wî dibêje ew buha ne. Şahan 8'an da ji mal derdikeve, diçê dibistanê. Nivro, ku dersên wan xilas bû, vedigere mal, Xwarina xwe dixwe û darsa xwe dixwine. Hingê diya wî dihêle û ew diçe bi hevalê xwe ra dilîze. Êvarî ku vegeî mal, solê xwe li ber dêrî derdixe, dest û piyê xwe û goreyên xwe dişo. Rojên şemiyê û yekşemiyê naçine dibistanê. Di van rojan da Şahan sibê dereng radibe. Dîya wî avê lê dike û kincên wî diguhure. Bavê wî tim jê ra dibêje: "Paqij be! Ji qirêjyê nexweşî pêktên." Şahan jî guh li dê û bavê xwe dike. Ew gedeyek paqij e.

Kirê	: Kira
Mitbax	: Mutfak
Kanîn	: Yapabilmek
Pê kanîn	: Gücü yetmek
Paqij	: Temiz
Paqijî	: Temizlik
Jêhafî	: Becerikli
Miştin	: Süpürmek
Şûştin	: Yıkamak
Fere	: Kab
Fere û fol	: Kab-kacak
Biriqandin	: Parlatmak
Nivîn	: Yatak
Rû	: Yüz
Sabûn	: Sabun
Diran	: Diş
Firçe	: Firça
Por	: Saç
Şe	: Tarak
Şê kirin	: Taramak
Sifre	: Sofra
Kelandin	: Kaynatmak
Xwedî	: Sahip
Çek	: Silah
Gêzî	: Süpürge

Hiştin	: Müsaade etmek
Yekşemî	: Pazar
Rastî	: Doğruluk
Av lê kirin	: Banyo yaptırmak
Kinc	: Çamaşır
Qirêj	: Kir
Qirêjî	: Kirlik
Heftik	: Hafta
Pêkhatin	: Meydana getirmek
Revîn	: Kaçmak
Guh lê kirin	: Dinlemek, dediğine uymak
Gede	: Oğlan çocuğu
Dan kirê	: Kiralamak
Kirê dan	: Kiraya vermek
Xanî	: Bina
Qat	: Kat
Salon	: Salon
Dîtin	: Görmek
Guhartin	: Değiştirmek
Xilas bûn	: Bitmek

### **Kirê kirin**

Bavê Şahan malek kirê kir, ew di kirê da rûdinin.

- Te mal bi çi kirê kir?

- Bi çar hezarî.

Kirêya malan gelek buha ye.

### **Kirê dan**

- Hûn çiqas kirê didin?

- Çar hezar.

### **Dan kirê**

- Tu mala xwe didî kirê?

- Na, ez bi xwe tê da rûdinim.

- Di vî xanî da malên kirê hene?

- Belê, di qatê dudoyan da yek heye.

- Çend odayê wê hene?

- Sê ode û salonek xwe heye.

- Kirê ya wê çi ye?

- Ez pê nizanim, ji xwedî bipirsin.

### **Kanîn - pê kanîn**

Rovî ji gur direve, pê nikane (Rovî bi gur nikane).

- Tu dikanî 5000 pangnot kirê bidî?
- Na ez nikanim.

*Kanîn* fiili kimi bölgelerde "*karîn*" biçiminde telaffuz edilir. Kanin fiili birçok durumda yardımcı fiil görevi yapar.

**Dev û rû şûştin** : El-yüz yıkama  
Meriv her sibê dev û rûyê xwe dişon.  
- Kuro hesen, dev ê rûyê xwe bişo!

**Dest û pî şûştin**: El-ayak yıkama

### **Por şe kirin**

Meriv her sibê porê xwe şe dike.  
Dê, porê zaroyên xwe yên piçûk şe dikin.

### **Miştin**

Meriv bi gêzîyê malan dimalin.  
Elo, berfa ser xênî bimala!  
Min ber dêrî mişt.

### **Navê rojan**

Heftikî da heft roj hene: *Şemî, Yekşemî, Duşemî, Sêşemî, Çarşemî, Pêşemî, Îni*.  
Heftik ra, li hin cîyên Kurdistanê "heyştik" tê gotin.

### **Biriqîn - Biriqandin** (parlamak - Parlatmak)

Roj dibiriqe (biriqîn)  
Zelal fere û folan dibiriqîne (biriqandin)

### **Helîn - Helandin** (Erimek - Eritmek)

Berf dihele  
Roj berfê dihelîne

### **Kelîn - Kelandin** (kaynamak - kaynatmek)

Av dikele  
Tu hêkan dikelînî

### **Hiştin** fiilin şî mdikî (ve geniş) zamanı

Ez dihêlim Em dihêlin  
Tu dihêlî Hûn dihêlin  
Ew dihêle Ew dihêlin  
Emir : Bihêle

Olumsuzu: Ez nahêlim...

### Dili geçmiş Zamanı:

Min hişt      Me hişt  
Te hişt      We hişt  
Wî, wê hişt      Wan hişt

**Şûştin** fiilinin şimdiki (ve geniş) zamanı

Ez dişom      Em dişon  
Tu dişo      Hûn dişon  
Ew dişo      Ew dişon  
Emir: Bîşo

**Dili geçmiş Zamanı:** Min, te, wî, wê, me, we, wan şûşt

Av li xwe kirin      : *Yıkanmek (banyo yapmek)*

Av lê kirin      : *Yıkamak (başkasını)*

Zelal, roja yekşemîyê avê      **li Şahan** dike.

**Li wî**

**lê**

**Av dan** : Sulamak

Ez sê rojan da carê daran av didim.

- Xelîl, îro bêxçe      **av bide.**

*av de (kısalmalı)*

**Guh lê kirin - Guh dan**

Şahan gedeyek baş e. Ew guh li dê û bavê xwe dike.

Tu guh li min bike, meçe Stembolê!

Guh **li wî** meke lo! Ew tiştêkî nizane.

**lê**

Guh bide hevalê xwe, ew rastîyê dibêje.

Min çend caran jê ra got, lê guh nade min.

**Lê çi bikin:** Ne paysınlar...

Mala wan teng e, ji wan ra malek fireh hewce ye; lê çi bikin, perê wan kême.

- Gur berxik xwar.

- Şivan li ku bû?

- Şivan jî dît, lê çi bike, çekê wî tune bû.

**Dîtin**

Ez dibînim, tu dibînî, ew dibîne, em dibînin....

Min dît, te dît; wî, wê, me, wan dît.

## FERE Û FOL

Meriv bi alîkarîya fere û folan xwarinê çêdike û dixwe.

Kewanî aşê malê di tencik û tewê da dipêjin. Di gundan da bo nan pehtinê sêl heyê. Quşxane tencika piçûk e. Kewanî bi kêrê pîvazan, temetêzan, balcanan, îsotan û hêşinayîyên din hûr dikin. Aşê nav tencik û sîtilan bi kevçî û hesikê tevdidin.

Di malan da gelek tas, tesmî, îskan û fîncan hene.

Şorbe di tasê da bi kevçî tê xwarin. Meriv çayê bi îskanan, qehwê bi fîncanan vedixwe. Li gundan xwarinê li ser sênîyan tînin sifrê. Meriv di sifrê da bi alîkarîya kevçî, çetel û kêrê dixwe.

Çay di çaydanê da, qehwe di cezwe da tê çêkirin.

Aş	: Yemek
Tencik	: Tencere
Pehtin	: Pişirmek
Tewe	: Tava
Birîn	: Kesmek
Hûr kirin	: Doğramak
Sîtil	: Kazan
Kevçî	: Kaşık
Sêl	: Sac
Quşxane	: Küçük tencere
Kêr	: Bıçak
Temetêz	: Domates
Çaydan	: Çandanlık
Cezwe	: Cezve
Balcan	: Patlıcan
Îsot	: Biber
Hêşinayî	: Yeşillik, sebze
Pêçî (bêçî)	: Parmak
Hesik	: Kepece
Tevdan	: Karıştırmak
Tas	: Tas
Tesmî	: Tepsi
Îskan	: Çay bardağı
Fîncan	: Fincan
Şorbe	: Çorba
Gêrmî	: Çorba
Sênî	: Sini
Çetel	: Çatal
Xawlî	: Havlu

## Pehtin

Ez dipêjim, tu dipêjî, ew dipêje  
Em dipêjin, hûn dipêjin, ew dipêjin  
Min peht, te peht, wî, wê, me, we, wan peht

### **Tevdan**

Ez tevdidim, tu tevdidî, ew tevdide  
Min, te, wî, wê, me, we, wan tevda

### **Birîn**

Kêr dibire.  
Kêrê bêçîya min birî  
Min darik birî.

### **Hûr kirin**

Ew daran hûr dike. Kewanî pîvaz hûr dikin.

-|-

### **Hînkirin:**

Li hevokên jêrîn cîyên vala tijî bikin.

- 1- Min ev mal bi sê hezarî ..... ..
- 2- Em çar hezarî..... ..
- 3- Di vî xanî da..... .. hene?
- 4- Bi dû sêşemîyê.....tê.
- 5- Berî şemîyê.....tê.
- 6- Min ji Elo ra got, "dersa xwe bixwîne"lê wî..... .. min ne kir.
- 7- Guh.....bavê xwe, meçe Stembolê.
- 8- Rovî bi gur dikane?....., ew..... ..
- 9- Rabe, ..... û ..... xwe bişo!
- 10- Porê xwe.....
- 11- Zelal bi gêzîyê odê.....
- 12- Zelal, heftê da carê avê..... Şahan.....

II

Ji nav van kelîman yên minasiw bibijêrin û li hevokên jêrîn cîyên vala tijî bikin:

*Fîstan, mitbax, hesp, pavîke, sabûn, gur, fere, şal û şapik, kinc, sol, şe, fêkî, ga, şewqe, se, destmal.*

- 1- Meriv dev û rûyê xwe bi..... dişo.
- 2- ..... bo şekirinê ye.
- 3- ..... bo pêkirinê ye
- 4- ..... bo çêkirina xwarinê ye.
- 5- ..... têne şuştin,.....têne biriqandin, ..... têne xwarin.



- 6- ..... kûvî ye, ..... kedî ye.
- 7- Mêr..... didin serê xwe, jin..... li xwe dikan.
- 8- Meriv li ..... sîyar dibe, bi..... cot dike.
- 9- Karker di..... da dixebitin.
- 10- Çilê Kurdan yê gelêr ..... e.
- 11- Wî destê xwe şûşt û bi ..... za kir.

Bersiva pirsên jêrîn bidin.

- 1- Bavê Şahan çi karî dike?
- 2- Mala ku ew tê da rûdinin salona xwe heye?
- 3- Mala ku ew tê da rûdinin ya wan e?
- 4- Çima ew malekî fireh kirê nakin?
- 5- Mala wan qirej e yan paqij e.
- 6- Dîya Şahan kewanîyek çawa ye?
- 7- Dîya Şahan kîngê wî hişyar dike?
- 8- Şahan ku ji xewê rabû çi dike?
- 9- Ew di taştê da çi dixwin?
- 10- Çima bavê wî şîr û hungiv nakire?
- 11- Ew kîngê ji dibistanê vedigere?
- 12- Şahan ku ji dibistanê hat çi dike?
- 13- Şahan bi kê ra dilîze?
- 14- Şahan ku ji listinê vegeerî çi dike?
- 15- Roja şemiyê Şahan zû yan dereng radibe? Çima?
- 16- Dayika Şahan kîngê avê li wî dike û kincê wî diguhure?
- 17- Ji qirêjîyê çi pêk tê?
- 18- Şahan guh li dê û bavê xwe dike?
- 19- Rovî, wexta ku gur dibînin çi dikan?
- 20- Qelema te wînda bû, te ew dît?
- 21- Tu jî êvarî lingê xwe û goreyên xwe dişoyî?
- 22- Hûn caran alîkarîya dîya xwe dikan?
- 23- Di heftikî da çend roj hene? Navê wan çiyê?
- 24- Bexçê we heye?
- 25- Tu caran daran av didî?
- 26- Tu caran kulîlkan av didî?
- 27- Meriv bi destmal û xawîyê çi dike?

**XVI**

**BÊRÎVAN**

Bi navê Bêrivan xweşkeke Şahan heye. Bêrivan hîn çar salî ye. Ew hertiştî pir mereq dike û dixwaze hîn bibe.

Wê rojekî ji bavê xwe pirsî:

-Tu çima ewqas dirêjî?

Bavê wê kenî û lê vegerand:

-Ez mezin im. Çend salan şunda tu jî dirêj dibî.

-Çima Mamê Elî qasî te dirêj nine?

-Hemû kes mezin dibin, lê bejna wan ne yek e. Ez bejndirêj im, ew navçebejn e.

-Çima porê te reş e, yê min kej e?

-Porê dîya te jî kej e. Tu li dîya xwe çûyî.

-Lê çavê wê şîn in, yê min.....?

Yê te reş in.

-Çima?

Bavê wê sekinî:

- Hii... ez çi bêjim? Hertişt yek nabe. Li bêxçe binêre: Pir texlît gîya, fêkî û kulîlk hene.

-Çima, em kulîlk in?

-Na, lê ew jî jînî ne. Canê wan jî heye.

-Can çi ye?

-Bavê wê dîsa sekinî, li dora xwe nihêrî, ji ser masê fîncanek girt û got:

-Binêr eva fîncana gir dibe?

-Na.

-Dimeşe?

-Naa.

-Jînî mezin dibin, wekî gîya û daran. Hin dimeşin, wekî heywan û merivan. Û rojek tê dimirin.

-Mirin çi ye?

-Mirin? Ka dapîra te tê bîra te? Par mir.

-Belê.

-Meriv wekî xew da diçe û cardin ranabe. Êdî nalive û bîhn nagire.

-Bîhn girtin çiyê?

-Meriv bi pozê xwe digire. Wekî ha:

Bîhna xwe girt û da, gotina xwe ajot:

-Li alîyê din, bîhna tiştan heye. Binêre, ev sêv e... Çavê xwe bigire! Te girt?

-Belê.

Bavê wê sêv dirêjî lêv û pozê wê kir û pirsî:

-Çawa ye?

-Bîhna wê xweş e.

-Tam çiyê?

-Meriv bi zimanê xwe tam dike. Bigre vê sêvê bixwe û li tama wê binêre. Hin tişt şîrîn in, hin tahl in. Şekir şîrîn e, îsot tahl û tûj in, lêmon tirş e, xwê şor e. Li alîyê din, meriv bi guhê xwe dangan dibihîse; bi destê xwe li tiştan dide, hişkî û nermîya wan, germîya wan hîn dibe... Meriv ....

Aqlê Bêrivanê di tişteki din da bû, wê, êdî guh ne dida gotinên bavê xwe.

Gotina wî birî:

- Ba vo, ez şe kir dixwazim, şe kir!

Ken	: Gölüş
Kenîn	: Gülmek
Gîrî	: Ağlamak
Şunda	: Sonra
Mam	: Amca
Bejn	: Boy-bos
Bejndirêj	: Uzun boylu
Navçebejn:	<i>Orta boylu</i>
Lê çûn	: Benzemek
Sekinîn	: Durmak
Kej	: Kumral
Jînî	: Canlı
Can	: Can
Lê nihêrîn	: Bakmak, araştırmak
Fikirîn	: Düşünmek
Me şîn	: Yürümek
Mirin	: Ölmek
Tirşik	: Tuşu
Alî	: Taraf, yan
Li alîyê din	: Diğer yandan
Hişk	: Sert
Hişkî	: Sertlik
Nerm	: Yumuşak
Nermi	: Yumuşaklık
Germî	: Sıcaklık
Kurt	: Kısa
Serhişk	: Dik kafalı
Mêjo	: Beyîn
Dapîr	: Büyükanne
Par	: Geçen yıl
Xew da çûn	: Uyumak, sönmek
Cardin	: Bir kez daha
Livîn	: Kimildamak
Bîhn girtin	: Nefes almak, koku almak
Bîhn	: Nefes, koku
Wekî ha	: Bunun gibi
Çav girtin	: Göz kapamak
Dirêj kirin	: Uzatmak
Poz	: Burun
Lêv	: Dudak
Tam	: Tat
Tahl	: Acı
Tahlik	: Acı elma
Tûj	: Acı, sivri
Lêmon	: Limon
Xwê	: Tuz
Şor	: Tuzlu
Guh	: Kulak

Dest lê dan	: <i>Dokunmak</i>
Aqil	: <i>Akıl</i>
Mereq	: <i>Merak</i>
Mereq kirin	: <i>Merak etmek</i>
Tiral	: <i>Tembel</i>

Bi navê Bêrivan xwîşkeke Şahan heye: Xwîşkeke Şahan heye, navê wê Bêrivan e.

### **Xew da çûn**

Şahan her şev di saet 9`an da radizê û hema di xew da diçe.  
Ba hat û lambe di xew da çû.

### **Dest lê dan**

Zarok dest li sowê da, destê wî şewitî.  
Binêr, dest lê bide, çiqas nerm e.

## **MERIVATÎ**

Cemal bavê Şahan e. Elî mamê Şahan e. Cemal û Elî bira ne. Şahan birazîyê Elî ye. Nadir, kurê elî (Nadirê Elî), pismamê Şahan e. Gul, keça Elî (Gula Elî), dotmama Şahan e.

Xatûn jina Elî ye, amojina Şahan e.

Zelal û Mircan xwîşkê hev in. Mircan xalfîya Şahan e. Mem, kûrê Mircan pîsxalfîyê Şahan e.

Bavê Cemal bapîrê Şahan e. Bavê Zelalê jî bapîrê wî ye. Dîya Cemal û dîya Zelalê herdu dapîrên wî ne. Şahan newîyê wan e.

Ev kes hemû merivên hev in. Di nav wan da merivatî heye.

Merivatî	: <i>Akrabalik</i>
Mam	: <i>Amca</i>
Amojin	: <i>Amca karısı</i>
Pismam	: <i>Amca oğlu</i>
Dotmam	: <i>Amca kızı</i>
Brazî	: <i>Yeğen (Erkek kardeş çocuğu)</i>
Xal	: <i>Dayı</i>
Xalojin	: <i>Dayı karısı</i>
Xarzî	: <i>Yeğen (kızkardeş çocuğu)</i>
Xalfî	: <i>Teyze</i>
Pisxalfî	: <i>Teyze oğlu</i>
Bapîr	: <i>Dede</i>
Newî	: <i>Torun</i>

## **Kenîn-Bikene**

Şimdiki zaman: Ez dikenim, tu dikenî...

### **Dili geçmiş zaman:**

1- Ez kenîm, tu kenî, ew kenî, em kenîn, hûn kenîn...

2- Ez kenîyam, tu kenîyayî, ew kenîya, em kenîyan, hûn kenîyan...

### **Gîrîn-Bigîre**

Şimdiki zaman: Ez digîrîm, tu digîrî...

### **Dili geçmiş zaman**

1- Ez gîrîm, tu gîrî, ew gîrî, em gîrîn...

2- Ez gîrîyam, tu gîrîyayî, ew gîrîya, em gîrîyan, hûn gîrîyan, ew gîrîyan

Zaro di bêxçe da dikenin û dilîzin.

Yekî ji min ra got "Kurdî ne ziman e". Ez kenîyam. Min jê ra got: "Mejoyê te şûştine!"

Şahan goyê xwe winda kirîye digîre. Bavê wî jê ra got "Megîre! Ez yekî nuh ji te ra fînim."

Bihistin ku bavê wan li Stembolê mirîye, hemû gîrîyan.

### **Livîn-Bilive!**

Ez dilivim, tu dilivî, ew dilive...

1- Ez livîm, tu livî, ew livî, em livîn, ew livîn

2- Ez livîyam, tu livîyayî, ew livîya, em livîyan...

Pising ji cîyê xwe nalive, herhal mirîye.

Bilive lo! Em dereng man.

Dar livîn û hirçek jê derket; hêdî hêdî meşîya û çû.

### **Çûn** fillin mişli geçmiş zamanî:

Ez çûme

Em çûne

Tu çûyî

Hûn çûne

Ew çûye

Ew çûne

### **Olumsuz**

Ez ne çûme, tu ne çûyî, ew ne çûye, em ne çûne...

### **Lê çûn - li hev çûn**

Porê te jî mîna dîya te kej e, tu li dîya xwe çûyî.

Ev jî pir serhişk e, li bavê xwe çûye.

Hesen û Ehmed bira ne, lê Hesen merivek jîr e, Ehmed tiral e; ew li hev ne çûne.

Lê çûn : *Benzemek*  
Li hev çûn : *Birbirine benzemek.*

### **Hînkirin:**

Bersiva pirsên jêrîn bidin:

- 1- Merivên dirêj ra çî tê gotin?
- 2- Ew kesên ku bejna wan zirav e, ji wan ra çî tê gotin?
- 3- Porê te çî reng e?
- 4- Çavê te çî reng in?
- 5- Çend çavê merivan heye?
- 6- Meriv bi çavên xwe çî dike?
- 7- Meriv di saya guhê xwe da çî dike?
- 8- Meriv di saya çî da bîhn digire?
- 9- Çend lêvên merivan hene?
- 10- Di devên merivan da çî heye?
- 11- Çend diranê merivan heye?
- 12- Meriv di saya çî da tiştan tam dike?
- 13- Ling çî ra dibin?
- 14- Dest çî ra dibin?
- 15- Çav û guhê merivan li ku ne?
- 16- Piştî xwe nîşan de.
- 17- Di destên te da çend tilî hene?
- 18- Kevirhişk e yan nem e?
- 19- Tama xwê çawa ye?
- 20- Îsot tûj e, yan tirş e?
- 21- Ew sêv şîrîn e, yan tahlîk e?
- 22- Bapîrê te xweş e, yan mirîye?
- 23- Mamê te heye? Navê xwe çî ye?
- 24- Tu caran xaltîya xwe dibinî?
- 25- Navê dotmama Şahan çî ye?
- 26- Şahan û Nadir pismamê hev in?
- 27- Tu ji xalê xwe hez dikî?
- 28- Tu li kê çûyî, li dîya xwe yan bavê xwe?
- 29- Kevir çîma nalive?
- 30- Tu çî difikirî, mala xwe mereq dikî?
- 31- Tu par li ku bûyî?
- 32- Hûn bi hevalê xwe ra çavgiirtik dilîzin?

## KURDISTAN

Kurdistan welatê me ye. Bav û kalê me bi hezar salan li ser axa Kurdistanê jîne. Ewana li vir cot kirine, pez çêrandine, bajar û gund ava kirine. Li bakûr ji Erzurumê û Qersê dest pêk dike, li başûr heya nêzikî Bexdayê diçe. Li rojhilat ji Gola Êrmîyê dest pê dike û li rojava digihe Sêvasê.

Kurdistan bi deşt û zozan, bi çîya û banî ye. Çîyayên wê bi nav û deng in. Çîyayên Torosê ji aliyê Meraşê heya Çolemêrgê, serbiser, di axa Kurdistanê da dirêj dibin, digihin çîyayên Zagros. Li aliyê Çolemêrgê û aliyê Dêrsim çîya li hev diqelibin, rê û dirb nadin, wekî cejnê dikin. Li aliyê rojhilata bakûr, dora Wanê, Mûşê, Girîdaxê, Qersê û Erzurumê deşt û zozan fireh dibin. Li wan deran têr giya heye, Kurd pir pez û dewar xwedî dikin. Agirî, çîyayê Kurdistanê herî bilind li vî alî ye. Bilindahîya wî 5165 mêtro ye. Li ber gola Wanê çîyayê Sîpanê bilind dibe, bilindahîya wî jî 4434 mêtro ye. Li ser van herdu çîyan tim berf û qeşa heye, pir caran serê wan ji ewran xuya nake.

Gola Wanê mîna behrekî fireh e. Ji xwe, xelkê dora wê, jê ra dibêje behr. Çemên Dicle û Ferat jî çîyayên Kurdistanê dizên, ber bi başûr diherikin, li aliyê Surîyê ji axa Kurdistanê derbas dibin û li Basrê digihin behrê. Ber bi başûr, Mezopotamîa tê gotin ji deşta nav van herdu çeman ra. Di Kurdistanê da gele çemên din jî hene; ew, bi aliyê avê gelek dewlemend e.

Ber bi başûra rojava, aliyê Dîyarbekir, Mêrdîn, Ruha, Cizîr û Entebê deşt e. Xelkê vê dorê him bi çandinîyê mijûl dibe, him jî pez xwedî dike. Pir cîyên Kurdistanê bi rez û baxçan xemilandî ye. Di çîya û daristanan da heywanên kûvî wekî hirç, gur, beraz, pezkûvî, rovî, kewroşk, kûze û kew pir in. Di avan da masîyên delal hene.

Kurdistan bi aliyê heyîyên bin erdê jî gelek dewlemend e. Li pir cîyan, xasima li dora Kêrkûk û Musûlê, dora Kîrmanşah û Dîyarbekrê têr nift derdikeve. Li aliyê Xarpitê sifar û krom, li aliyê Cizîr û Elbîstanê komir, li aliyê Sêvasê hesin, li aliyê Dêrsim krom, komir û hwd. derdikeve.

Lê ew hemû heyîyên sererdê û binerdê çira dibin?!

Dijminan Kurdistan di nav xwe da parçe parçe kirine, heryekî parçek kirîye bin lepê xwe. Ewana bend kirine stûyê me û welatê me talan kirine, hertiştê me dizîne û hîn jî didizin. Sifar di alîkî da diçe, nift di alîkî da. Çemên me diherikin û bi kêrî me nayên, Çîyayên me stûxar in..

Zozanên me tijî pez in, deştên me têr genim, birinc û pembu didin; lê dîsa jî em birçî û tazî ne. Rez û baxçeyên me têr tirî, têr sêv û mişmiş didin; lê em wan tam nakin.

Em dixebitin pêk finin, zordest li serê me dixin dibin. Bona vê ye ku welatê me ava nabe, xelkê me xizan e. Ku azadî ne bû xebat çira dibe?

Berî hertiştî em hewcedarî azadîyê ne.

Welat : Ülke, yurt  
Kal : Yaşlı, dede  
Ax : Toprak  
Nav : Ara  
Daristan : Orman  
Beraz : Domuz  
Pezkûvî : Yaban keçisi

Golik	: Dana
Ava kirin	: Yapmak, imar etmek
Bakûr	: Kuzey
Başûr	: Güney
Qers	: Kars
Bexda	: Bağdat
Banî	: Tepe
Bi nav û deng:	Ünlü
Çolemêrg	: Hakkari
Serbiser	: Baştanbaşca
Gihan	: Kavuşmak, yetişmek
Li hev qelibîn:	Birbirine karışmak
Rê	: Yol
Dirb	: Geçit
Cejn	: Bayram, festival
Têr	: Bol, tok
Dewar	: Sığır
Agirî	: Ağrı dağı
Sîpan	: Süphan dağı
Ewr	: Bulut
Xuya kirin	: Görünmek
Behr	: Deniz
Ji xwe	: Zaten
Dîcle	: Dicle
Ferat	: Fırat
Zayîn	: Doğmek
Herikîn	: Akmak
Çem	: Çay, ırmak
Imperyalîst	: Emperyalist
Kolonyalîst	: Sömürgeci
Stûxar	: Boynu bükük
Koşkar	: Ayakkabı tamircisi
Mijûl bûn	: Uğraşmak, meşgul olmak
Kışandin	: Çekmek
Kûze	: Sansar
Kew	: Keklik
Masî	: Balık
Xasima	: Özellikle
Heyî	: Varlık
Binerd	: Yeraltı
Sererd	: Yer üstü
Hesin	: Demir
Hesinker	: Demirci
Dijmin	: Düşman
Bend kirin	: Bağlamak
Bend	: «p, bağ
Sto	: Boyun
Talan	: Talan



Dizîn	: Çalmak
Birinc	: Pirinç
Birçî	: Aç
Mişmiş	: Kaysı
Xizan	: Yoksul
Azadî	: Özgürlük
Hewcadar	: Muhtaç
Firsend	: Fırsat
Kîngê	: Ne zaman
Hingê	: O zaman
Ber	: Ürün, ön
Titûn	: Tütün
Nêçîr	: Av
Nift	: Petrol
Sifar	: Bakır
Krom	: Krom
Parçe	: Parça
Lep	: El
Lepik	: Eldivan
Pir	: Köprü, çok
Derbaz bûn:	Geçmek
Sinet	: Sanat
Çandinî	: Ziraat

### Mişli geçmiş zaman

1) Geç işsiz fillerde:

Jîn Kök: **Jî**

#### Takı

Ez jîme	me
Tu jîyî	yî
Ew jîye	ye
Em jîne	ne
Hûn jîne	ne
Ew jîne	ne

Hatin Kök: Hat

#### Takı

Ez hatime	ime
Tu hafyî	iyî
Ew hatiye	ieye
Em hatine	ine
Hûn hatine	ine
Ew hatine	ine

2) Geç işli fillerde:

Kirin Kök: **Kir**

#### Takı

Min kiriye	ieye
Te kiriye	ieye
Wî, wê kiriye	ieye
Me kiriye	ieye
We kiriye	ieye

Dizîn Kök: **Dizî**

#### Takı

Min dizîye	ieye
Te dizîye	ieye
Wî, wê dizîye	ieye
Me dizîye	ieye
We dizîye	ieye

Wan kiriye

iyê

Wan dizîye ye

Görüldüğü gibi, kökte son herf sessiz ise, hem geçişli, hem geçişsiz fiillerde takının başına **(i)** harfii eklenir.

Diğer yandan geçişli fiillerde nesnenin çoğul olduğu durumlarda fill takısı değişir, çoğul hale gelir:

### **Dili geçmiş**

Min masî xwar (masîyek xwar)

Min du masî xwar**in**

Wan bajar ava kir (bajarek)

Wan bajar ava kir**in** (ji yekî zêdetir)

### **Mişli geçmiş**

Min masî xwarîye (Masîyek xwarîye)

Min du masî xwar**ine**

Wan bajar ava kiriye (bajarek)

Wan bajar ava kir**ine** (ji yekî zêdetir)

### **Ava kirin-ava bûn**

Karker malan, rêyan û piran ava dikan.

Welat bi xebatê ava dibe, lê zordest firsendê nadin me.

Kîngê Kurdistan azad bû, hingê em dikanin welatê xwe ava bikin.

### **Berhemîn (Superlatif)**

1- Reşko çîya kî **bilind** e.

Sîpan ji Reşko **bilindtir** e. (comperatîf)

Di nav çîyayên Kurdistanê da yê **bilindtirîn** Agirî ye. (Superlatîf)

Bu ekler kullanılmadan da şu şekilde anlatılabilir:

Di nav çîyayên Kurdistanê da yê herî bilind Agirî ye.

2- Ferat çemekî dirêj e.

Yê dirêjtirîn Mîsîsîpî ye (Yê herî dirêj Mîsîsîpî ye.)

### **Zayîn**

Çêleka me za, golikek bû.

Di mêrgan da av dizê.

### **Alî-bi alî**

Di nav herdu gundan da çem derbaz dibe. Gundê me li vî alî ye, gundê xalê min li wî alîyê çem e.

Ew, bi alîyê peran dewlemend e, lê bi alîyê mêjo xizantirê merivan e.

### **Mijûl bûn**

-Dapîra te çi karî dike?

-Ew bi zaroyan mijûl dibe.

Koçer pez xwedî dikin. Ew, ji sibê heya êvarê bi pêz ra mijûl dibin.

-Mamê te bi çî sinefî mijûl dibî?

-Ew koşkarîyê dike. Lê brazîyê min hesinker e.

**Heyîyên bin erdê:** Tiştên ku ji ben erdê derdivekin û bi kêrî merivan tên. Wekî nift, hesin, sifar, komir, zêr, zîv û hwd...

**Heyîyên ser erdê:** Axa çandinîyê, mêrg û zozan, daristan û heywanên nêçîrê, av û masî; û tiştên ku meriv çêdike, tîne meydanê: Wekî berên çandinîyê (pembu, titûn, genim û ceh, fêkî), pez û dewar û hwd...

### Têr bûn

-Keremke em şîva xwe bikin.

-Spas dikim, ez têr im.

Biharî li çîyan têr gîya heye.

### Bi kêr hatin-bikêrhatî

Tişt hene bi kêrî merivan tên. Wekî av û hewa: Meriv di saya wan da dijî. Meriv nîn dixwe, avê vedixwe, kincan li xwe dike, bi tirênê rê va diçe. Ew hemû, tiştên bikêrhatî ne.

Meriv hene, merivên bikêrhatî ne; ew, karên baş dikin.

Wekî karker, cotkar û dersdar, hemû sinetkar... Meriv jî hene di cîyê xwe da rûdinin, destê xwe li sar û germê naxin û dîsa jî dewlemend in. Wekî axa û patronan... Ew ne di saya xebata xwe da, di saya xebata xelkê da dijîn. Axa û patron merivên bikêrhatî ninin. Ew bi kêrî tu tiştî nayên.

Li Kurdistanê heyîyên sererdê û yên binerdê zehf in. Axa û sermîyandar, împeryalîst û kolonyalîst wan dikişînin dibin. Wekî nift, hesin, sifar... Ew bi kêrî tu tiştê me nayên.

**Lê xistin:** *Vurmak*

Emir: *Lê xe!*

*Şimdiki zaman*

Ez lê dixim

Em lê dixin

Tu lê dixî

Hûn lê dixin

Ew lê dixe

Ew lê dixin

Dîlî geçmiş zaman:

Min lê xist

Me lê xist

Te lê xist

We lê xist

Wî, wê lê xist

Wan lê xist

*Mîşli geçmiş zaman:*

Min lê xistîye

Me lê xistîye

Te lê xistîye

We lê xistîye

Wî, wê lê xistîye

Wan lê xistîye

**Cûmle içinde:**

Ew **li serê me** dixin û heyîyên me dibin.

Ew            **lê**            dixin  
 Wan **li serê me** xist û heyîyên me bir.  
 Wan            **lê**            xist  
 Wan **li serê me** xistîye û heyîyên me birîye.  
 Wan            **lê**            xistiye

Hewcedar: Em hewcedarî azadîyê ne.  
 Welat hewcedarî axa û patronan nine.  
 Veya: Welat, ne hewcedarî axa û patronan e.

**Belanî** (olumlu)  
 Hewcedar e

**Neyînî** (Olumsuz)  
 Hewcedar nine

Veya

Ne hewcedar e  
 Tırş nine  
 Ne tırş e.

Tırş e

### Hinkirin:

Di hevokên jêrîn da cîyên wala tije kin:

- 1- Meriv di saya..... xwe da dibihîse, di saya.....xwe da dibîne, di saya.....xwe da tam dike, di saya.....xwe da bîhn dike.
- 2- Meriv di saya..... xwe da difikire.
- 3- Hungiv....e, îsof..... û .....e, xwê....e, lêmon....e.
- 4- Kevir.....e, pembû.....e, qeşa .....e, roj.....e.
- 5- Ferat ji Dîclê.....
- 6- Di nav çîyayên Kurdistanê da.... .... Agirî ye.
- 7- Brayê bavê min..... min e, keça wî..... min e. Xwîşka dîya min.... min e.
- 8- Bajarê Wanê li..... gola wanê ye, Qers li..... Kurdistanê ye.
- 9- Dîcle û Ferat ber bi..... diherikin.
- 10- Di Kurdistanê da li dora Kerkûkê....., li Sêvasê..... li nêvîkî Xarpitê....û .....derdikeve.

--II

Ji nav van lêkeran, yên minasiw bibijêrîn û li hevokên jêrîn cîyên vala tije bikin.  
*Hûr kirin, pehtin, guh lê kirin, av li xwe kirin, xew da çûn, lê çûn, dest pê kirin, ava kirin, mijûl bûn, lê xistin, bi kêr hatin, herikîn, dizîn, pê kanîn, şûştin.*

- 1- Bav û kalê me gelek bajar û gund.....
- 2- Av ber bi jêr.....
- 3- Ez, rojên yekşemîyê tim..... û kincê xwe.....
- 4- Kewanî her roj nanê malê.....
- 5- Ew .....dîya xwe.....; dîya wê bejndirêj e, ew kurt e.
- 6- Kewanî bi kêrê pîvazan.....
- 7- Bavê te bi çi.....?
- 8- Divê meriv têr hêşînayî bixwe. Ew gelek..... merivan.....

- 9- Ez çer radizêm, heme.... ..
- 10- Şeva duhinî yek ke fîye mda me û gele tişt.....
- 11 -Bindest.....zordestan....., kîngê ew dibin yek.
- 12- Şahan gedekî baş e, ew .... .. dê û bavê xwe.....
- 13- Wî mehekî berê.....xwendinê.....û êdî dikane bixwîne.
- 14- Wê.....keça xwe.....,lê rind nekir.

### III

Hevokên jêrîn bikin hevokên pirsê:

- 1- Bav û kalê me li Kuridstanê jîne.
- 2- Kurd pir pez û dewar xwedî dikin.
- 3- Xelkê dora Mêrdîn û Entebê bi çandiniyê mijûl dibin.
- 4- Pezkûvî li çîyan diçêrin.
- 5- Nêçîra kewan payîzî û zivistanî dibe.
- 6- Masî di avê da dijîn.
- 7- Bapîrê min par mir.
- 8- Na, mamê min tune.
- 9- Brazîyê min danzdeh salî ye
- 10- Tirên heya Dîyarbêkrê çar saetan da diçe.
- 11- Ez ji gund bi hespê hatim.
- 12- Hesên kera xwe birîye êş.
- 13- Şahan çûye dibistanê.
- 14- Deştên me têr genim û pembu didin.
- 15- Welat di bin lepê zordestan da ye.
- 16- Axa û sermîyandar tu karî nakin.
- 17- Axa û sermîyandar di saya xebatkaran da dibin dewlemend.
- 18- Xelkê me bindest e, bona wê xizan e.
- 19- Postê hirçê û ya kûze gelek buha ye.
- 20- Xelkê dora golê jê ra dibêjin behr.

### Örnek

- 1- Bav û kalê me li ku jîne?  
veya; Bav û kalê me li kîderê jîne?
- 2-Tu ji gund bi çî hatî?

**Soru zamirleri:** Kî: kim, çî: ne

Başlıcaları **kî** ve **çî** dir. Kî şahıslar, çî şeyler için kullanılır. Kî çekildiği zaman **kê** olur.

Kî hat? Hesên hat.

Çî dibare? Baran dibare.

Tu kî yî? Ez Serdar im.

Ew çî ye? Ew hesp e.

Te ji kê ra got? Min ji Elo ra got.

**Kîjan:** Hangisi

- Ehmed, mamê te li mal e?
- Tu kîjanî dipirsî?
- Mamê te, Xidir?
- Belê, li mal e.

- Ez îsotan dixwazim.
- Tu kîjanan dixwazî, yên tûj yan ne tûj?
- Yên tûj dixwazim.

**Kîjan** zamiri isimler gibi çekilir, eril için **î**, dişl için **ê** çoğul için **an** takısını alır:  
*Kîjanî, kîjanê, kîjanan.*

**Soru sıfatları** (Rengdêrên pirsîyarkî)

Soru sıfatları **çend, çi, kîjan** dir:

Salekî da çend meh hene?

Çavê te çi reng e?

Tu kîjan pirtûkê dixwazî?

**Kürtçede soru cümlesi:**

1- Daha önce gördüğümüz gibi söz düzenini değiştirmeksizin, ses düzeni yoluyla;

2- Soru zamirleri, sıfatları, basit ve bileşik zarflarıyla imıyla yayılır.

Tu Şahan î.

Tu Şahan î?

**Kî** Tu Şahan î - Tu kî yî?  
Ew mala elo ye - Ew mala kê ye?

**Çi** Ew rovî ye - Ew çi ye?

**Kîjan** Brayê mezin Hesên e - Brayê mezin kîjan e?

**Çend** Di gund da pêncî mal hene- Di gund da çend mal hene?

**Çi** Bavê min cotkar e-Bavê te çi karî dike?  
Gurgoşt dixwe- Gur çi dixwe?

**Ji ku, li ku, ji ku derê, li ku derê**

Şahan ji dibistanê tê - Şahan ji ku tê?

- Şahan ji ku derê tê?

Şahan li dibistanê ye- Şahan li ku ye?

- Şahan li ku derê ye?

Bi çi

Zaro bi qelemê dinivîsin - Zaro bi çi dinivîsin?

Bi kê ra	Elo bi Xelîl ra çû bajêr - Elo bi kê ra çû bajêr?
Çima dibistanê?	Ez nexweş im, îro naçim dibistanê. - Tu çima îro naçî?
Çawa Kîngê	Şahan gedeyek baş e Şahan Gedeyek çawa ye? Ez ji Bingolê duh hatim - Tu ji Bingolê kîngê hatî?

## XVIII

### MAR Û ÇIVÎKAN

Dapîra Şahan pir çîrokan dizane. Şahan ji çîrokên wê gelek hez dike. Şeveke zivistanê bû. Li der berf û serma hebû. Şahan ji dapîra xwe xwest ku jê ra çîrokekê bibêje. Wê jî dest pê kir û çîroka mar û çivîkan jê ra got: Wextekî daristanek hebûye. Ew daristan welatê çivîkan bûye. Her yekî tê da ji xwe ra hêlûnek çêkirîye. Ya kutkutikê û ya dîksilêmîn di nav koka daran da bûye. Ya bilbilê li ser çiklan, nav pelên daran da. Ya êlo li ser zinarekî bûye. Li daristanê xwarin û vexwarin zehf bûye. Daristan ji dengê wan şên bûye. Lê rojekê li daristanê marek peyda bûye. Marekî gewr û çav zer. Ew mara tim çûye hêlûnan û hêk û çêlik xwarîye.

Rojekê pepûg hatîye ku mar li dora hêlûna wê ye. Pepûgê kirîye qîrîn, gofîye: - Cîranino! Zû werin. Mar çêlê min xwarin!

Çivîkan dengê pepûgê bihîstîye, lê ji cîyê xwe ne livîne. Wan gofîye: "Ji me ra çi? Em ku biçin, mar me jî dixwe. Me nexwe jî, dibe dijminê me. Ji xwe em pê nikanin. Qe nebe, em li cîyê xwe rûnin û hêrsa wî neynin..." Bi vî awayî, çivîkan paç kirine guhê xwe û ne çûne hawara pepûgê. Mar çêlên wê xwarîye. Pepûga dilbirîn jî mala xwe barkirîye û ji wê derê çûye.

Lê mar dev ji hêlûnan bernedaye. Roja dinê li qijqijikê bûye mêvan... Îcar wê kiriye qîje-qîj, lê çi çare?. Marê me bi vî awayî, bê tirs, her roj çûye hêlûnekê, zikê xwe têr kirîye, bûye lox. Çivîk jî kelogirî bûne, ketîne şînê, nizanin ku çi bikin....

Baz û êlo di kêfa xwe da bûne. Gotine: "mar nikane bê hêlûna me; em çavê wî derdixinin!" Paşê, mar çûye, hêlûna wan jî...

Rojekê çivîkek piçûk derketîye ortê û usa gofîye: "Lao, teresîyê mekin! Em ewqas çivîk di heqê marekî da nayên. Usa nabe. Bi revîn û tirsê em ji dest wî xilas nabin. Bi vî awayî mar koka me tîne."

Çivîkên din jê pirsîne:

- Tu ji me ra çi dibêjî? Em çi bikin?

- Yek bin û bajon ser wî! Mirin ku mirin e, va xirexir çi ye?

Paşê çivîkan gotina xwe kirine yek, tirs ji dilê xwe avêtine. Wan, nûkilên xwe tûj kirine û bi hevra di ser mar da girtine. Mar xwe şaş kirîye, bi lez kişîye, revîye ku biçe kuna xwe. Yekî li çav xistîye, yê din li serî; ew kuştine. Leglegê jî, bi nûkila xwe ya dirêj leşê wi girtîye, birîye avêtîye newalekê.

Wê şûnda çivîk ji tirsê xilas bûne. Her yek firdaye çûye hêlûna xwe. Demên şahîyê dîsa dest pê kirîye.

Çïrok	: Masal
Mar	: Yılan
Hêlûn	: Yuva
Kutkutik	: Ağaçkakan
Dîksilêman	: Çavuş kuşu
Dîk	: Horoz
Kok	: Ağacın topraktan dal ayrımına kadar kısmı
Bilbil	: Bülbül
Çikil	: Dalcık
Şax (gulî)	: Dal
Êlo	: Kartal
Zinar	: Kaya
Peyda bûn	: Peydah olmak
Gewr	: Kül rengi
Çêl, çêlik	: Kuş yavrusu
Pepûg	: guguk kuşu
Qîrîn	: Haykırış
Cîran	: Komşu
Qe nebe	: Hiç değilse
Qe	: Hiç
Hêrs	: Öfke
Bi vî awayî	: Böylece
Paç, paçık	: Bez parçası
Hawar	: Çağrı, imdat
Dil	: Yürek
Birîn	: Yara
Dilbirîn	: Yüreği yaralı
Dev jê berdan	: Vazgeçmek
Qijqijik	: Saksığan
Mêvan	: Misafir
Îcar	: Bu kez
Çïrokbêj	: Masalcı
Qîjîn	: Avaz avaz bağırma
Zik	: Karın
Lox	: Dam taşı, loğ
Kelogîrî	: Ağlamaklı
Şîn	: Yas
Baz	: Şahin
Kêf	: Keyf
Orte	: Orta
Teresî	: Tereslik
Xire-xir	: Ölüm horultusu
Di heqê wî da hatin	: Hakkından gelmek
Tirs	: Korku
Kok anîn	: Kökünü getirmek
Yek bûn	: Birleşmek
Yekîfî	: Birlik



Nûkil	: Gaga
Tûj kirin	: Bilemek
Tûj	: Keskin
Ser da girtin:	Saldırmak, üstüne üşüşmek
Lez	: Acele
Lez kirin	: Acele etmek
Kışîn	: Sürünmek
Kun	: Delik, in
Kunê mar	: Yılan deliği
Kuna gur	: Kurt ini
Leş	: Leş, gövde
Xwe şaş kirin:	Şaşırmaq
Legleg	: Leylek
Newal	: Dere
Xilas bûn	: Kurtulmek
Firdan	: Uçmak
Firîn	: Uçmak
Şahî	: Neşe, şenlik
Per	: Kanat
Vêxistin	: Yakmak
Vebûn	: Açılmak
Çetin	: Çetin
Qîret kirin	: Gayret etmek
Rizgarî	: Kurtuluş
Rizgar kirin	: Kurtarmak
Xwendin	: Ötmek, okumak

### **Dilek kipi** (şimdiki ve gelecek zaman)

Şahan xwest ku dapîra wî jê ra çîrokekê bibêje.

*Mastar:* Gotin (söylemek), *Emir:* bibêje

Ez bibêjim	im	Em bibêjin in
Tu bibêjî	î	Hûn bibêjinin
Ew bibêje	e	Ew bibêjin in

Wî xwest ku dapîra wî..... bibêje.  
(O istedi ki büyük annesi..... söylesin)

### **Emir kipi**

bibêje  
bixwaze  
biçe (here)  
bixwe  
(hez) bike

### **Dilek kipi**

Ew bibêje (o desin)  
Ez bixwazim  
tu biçî (tu herî  
ew bixwin  
em hez bikin.

Görüldüğü gibi, istek ve dilek kipinin çimdiki ve gelecek zamanı emir halinin yardımıyla yapılır.

Takılar : *im, î, e, in, in, in.*

Not: (Dilek, gereklilik ve şart kiplerinin tümünün çimdiki ve gelecek zamanlarında fiil aynı biçimi alır. Kipler, diğer yardımcı sözcüklerle ayrılır:

Ez dixwazim biçim Parîsê : Parîs`e gitmek istiyorum  
(istek- dilek)

Divê, ez biçim Parîsê : Paris`e gitmeliyim. (gereklilik)

Ku ez biçim Parîsê : Parîsê gitsem.. (şart)  
(Ez ku biçim)

Em çi bikin : *Ne yapalım?*

Divê, em çi bikin : *Ne yapmalıyız?*

Ku em çi bikin : *Ne yapsak?*

**Olumsuzluk** edatı (**ne**) dir. (Şimdiki ve gelecek zamanın da)

Em dixwazim îro biçim : Ku neçin.... (gitmezsek)

Mar me dixwe : Ku nexwe jî, dibe dijminê me.

Hesen cixarê dikşîne : Ku nekşîne hêrs dikeve.

Not: Kurala uymayan 2. grup fiillerde durum farklıdır. Bunlar **bi** öncüsü almazlar. Örnek: *Hatin* (gelmek)

Hatin Kök Emir  
*Hat* *Were*

Ez bê m : *Geleyim*

Divê ez bê m: *Gelmeliyim*

Ku ez bê m : *Gelsem*

### Emir Biçimi

Emir biçimi fiil kökünün başına bi ön eki getirilerek ve tekil için **e**, çoğul için **in** takılarının yardımıyla yapılır.

<u>Mastar</u>	<u>Kök</u> _____	<u>Emir</u>	
		<u>Tekil</u> _____	<u>çoğul</u>
Qîrîn	Qîrî	biqîre	biqîrin
Kirin	Kir	bike	bikin
Dan	Da	bide	bidin
Bûn	Bû	bibe	bibin

Bileşik fiillerde emir ön eki, fiilin başına gelir.

### Mastar

Vexwarin  
Çêkirin  
Derketin  
Vebûn  
Hûr kirin  
Lê dan  
Xilas bûn

### Emir biçimi

Vebixwe  
Çêbike  
Derbikeve  
Vebibe  
Hûr bike  
Lê bide  
Xilas bibe

Ancak bileşik fiillerde genellikle kısaltmalı biçimler kullanılır. Örneğin, **vexwe** yerine, bir atılarak kısaca **vexwe** denir. Bunun gibi:

Çêbike : Çêke  
Derbikeve : Derkeve  
Vebibe : Vebe  
Xilas bibe : Xilas be  
Dest pê bike : Dest pê ke  
Lê bide : Lê de  
Hûr bike : Hur ke

Kısaltma yoluna bazan basit fiillerde de başvurulur:

Bibêje: Bêje Jê ra bibêje  
Jê ra bêje

Emir biçiminde olumsuzluk edatı **me** dir:

Bike : Meke Vebixwe (vexwe) : Vemexwe  
Bibe : mebe Çêbike (çêke) : Çêmeke  
Bigre : Megre Dest pê bike : Dest pê meke

Diğer yandan:  
Bavêje: Mavêje

**Alıştırma:** Aşağıdaki fiillerin emir kipini ve dilek kiplerinin şimdiki (ve gelecek) zamanını çekiniz:

Çêrin Derketin Ava kirin  
Xwarin Vexwarin Lê xistin  
Me şîn Vebûn Hişyar bûn  
Jîn Çêkirin Ser da girtin  
Kirîn Vêxistin

**Qe nebe**

Eyşan dibêje dersa min çetin e û naxebite. Dersdar jê ra got: "Eyşan bixebite. Qe nebe, tu dikanî bersîva çend pîrsan bidî."  
Mehmûd got: "Ez naçim bajêr. Qe nebe di gund da av û hewa paqij e..."

### **Bi vî awayî**

Rojek birçî, rojek têr, bi vî awayî sal derbaz bûn û çûn.  
Tu bo dersa xwe qîret nakî; bi vî awayî, tu nikanî hîn bî.

### **Dev jê berdan**

Dijmin dev ji me bernadin.  
Tu ji gede çî dixwazî? Dev jê berde lo!  
Ew merivek serhişk e. Tu nikanî tişteki bikî serê wî. Dev jê berde!

### **Di heqê da hatin**

Ew keçîkek jêhatî ye, di heqê her karekî da tê.  
Tu ji min ra bêje, di heqê wî seyî da ez tîm!  
Wietnamî di heqê dijmin da hatin, welatê xwe rizgar kirin.

### **Tûj-tûj kirin**

Kêr tûj e, dest lê mede.  
Birek xweş nabire, wê tûj bike.

### **Ser da girtin**

Komandoyan di ser gundê me da girtin.

Roja dinê	: <i>Ertesi gün</i>	Betir pêr	: <i>Üç gün öncesi</i>
Hefta dinê	: <i>Ertesi hafta</i>	Par	: <i>Geçen yıl</i>
Meha dinê	: <i>Ertesi ay</i>	Pêrar	: <i>iki yıl öncesi</i>
Sala dinê	: <i>Ertesi yıl</i>		: <i>önceki yıl</i>
Duh	: <i>Dün</i>	Betir pêrar	: <i>Üç yıl öncesi</i>
Pêr	: <i>Evelsi gün</i>		

### **Hînkirin**

I

Di vê çîrokê da (Mar û Çivîkan) boîya çîrokî bikin boîya berdest. (Bu hikayede -Mar û Çivîkan- mişli geç mişli dîll geç mişe çevirin.)

### **Kişîn - Firîn - Xwendin**

Mar dişikîn, çivîk difirîn.  
Çivîk bi saya perê xwe difirîn.  
Xwendina çivîkan daristanê şên dike.  
Bilbil ji hemû çivîkan xweştir dixwîne.

Bersîva pirsên jêrîn bidin:

- 1- Dapîra Şahan pir çîrokan dizane û dibêje. Ji karê wê ra çi tê gotin?
- 2- Şeveke zivistanê Şahan ji dapîra xwe çi xwest?
- 3- Dapîrê jê ra kîjan çîrok got?
- 4- Li daristanê çi hene?
- 5- Ji mala çivîkan ra çi tê gotin?
- 6- Kutkutik hêlûna xwe di ku da çêdike?
- 7- Êlo hêlûna xwe di ku da çêdike?
- 8- Fêkî li ku derê dibin?
- 9- Dengê kîjan çivîkê xweştir e?
- 10- Lingê maran heye? Ew çawa rêva diçin?
- 11- Mala maran ra çi tê gotin?
- 12- Di çîrokê da mar çi dike?
- 13- Pepûgê ku mar dîfîye çi kirîye?
- 14- Çivîkên din çima ne hatine hawara pepûgê?
- 15- Ew ji mar tirsîn, lê tirsê ew ji dijmin parastin?
- 16- Roja dinê mar çû hêlûna kê?
- 17- Êlo û baz çima dengê xwe dernexistin?
- 18- Wan hêlûna xwe ji mar parast?
- 19- Mar di hêlûnan da çi xwar?
- 20- Çivîka piçûk ji yê din ra çi got?
- 21- Meriv çawa ji dijmin xilas dibe?
- 22- Çivîkan guh dane gotina çivîka piçûk?
- 23- Paşê wan çi kir?
- 24- Mar çawa ji ber wan revî?
- 25- Ewana çawa mar kuşt?
- 26- Leglegê çi kir?
- 27- Pişfî ku mar mir çi bû?

### **Paç kirin guhê xwe**

Çivîkan paç kirine guhê xwe. Ango gazîya hevalê xwe bihîstin, lê xwe li nebihîstinê danîn. Guh nedan gazîya wê.  
Ez Elo ra ewqas dibêjim, lê wî paç kiriye guhê xwe. (Qe guh nade min).

### **Kok anîn**

Lo, rabin! Dijmin koka me anî.  
Rovî ku kete pînê koka mirîşkan fîne.

## **XIX**

### **ZMANÊ ME**

Zman bo merivan hevcarekî hêja ye. Meriv di saya zman da daxwazên xwe ji hev û du ra dibêje, hev û du fêhm dike, dide û distîne.

Zanîn û hostafî di saya zman da winda nabe, ji bav û kalan derbazî me dibe. Zanîn di saya xeberdan û nivîsandinê da belav dibe, digihe merivên din.

Komela merivan tucar bê zman nabe.

Merivên herî kevn hîn xwedî ziman ne bûn. Ewana mîna heywanan deng derxistine. Heywan bi van dengan mane, merivan ew pêş va biitne. Bi vî awayî, hêdî hêdî zman derketine ortê. Merivan nivîs kifş kirine û hîn xwendin û nivîsandinê bûne.

Gelan, her yek zmanekî wî heye. Zmanê me Kurdî ye.

Xelîl di lîsê da dixwîne. Zmanê wî Kurdî ye, lê di xwendegehê da xwendin Tirkî ye. Çima? Xelîl, hîn ku zaro bû û di dibistana gund da dixwend, li ser vê pirsê fikirî: Em çima bi zmanê xwe naxwînin?. Wî rojekî ji dersdar pirsî: "Mamoste, em çima bi Kurdî naxwînin?" Dersdar, himber vê pirsê him şaş bû, him jî enîrî; usa lê vegehand: "Kurdî ne zman e!"

Ji wê rojê vir da gelek sal derbaz bûn. Xelîl îro êdî mezin e. Ew û hevalên wî, niha jî li ser pirsên han difikirin. Lê ew, êdî rastîyê dizanin. Li dinê hemû gel bi zmanê xwe dixwînin. Ew di zanîngehê da zmanê bîyanî jî hîn dibin, lê bîngeh zmanê bav û kalan e.

Kurd bi zmanê xwe naxwînin, ji ber ku ew îro bindestin. Kurdistan di bin nîrê bîyanîyan da ye. Bîyanî dixwazin ku Kurd zmanê xwe, çanda xwe ji bîr bikin, hişyar nebin û bona azadîyê nexebitin.

Xelîl û hevalê xwe jî vê yekê îro êdî baş dizanin. Ê ew dizanin ku Kurdî jî zmanek delal e. Zmanê me jî mîna dîroka me kevn e, ew ji hezar salan dinisile û tê. Rast e, îro Kurdî paş da maye. Ji ber ku zordestan firsend ne dane xwendin û nivîsandina wî. Dibistan û zanîngehên Kurdan tunin; kolonyalîstan ew qedexe kirine. Ew nahêlin ku bi Kurdî rojname û kovar derkevin, pirtûk çap bibin. Bona kirinê han ew cezayên mezin didin Kurdan. Lêdan, girtin, kuştin û menfî kirin bo me bûyerên her rojî ne. Em di radyo û tîlewîzyonê da zmanê xwe nebihîsin. Ew nahêlin ku di derê hukumetê da Kurd bi zmanê xwe xeberdin. Ê ew bila li wir bimîne, nahêlin ku em di cejn û dawetan da stranên xwe bi serbestî bêjin.

Lê dîsa jî, himber ewqas hovîfîyê, Kurdan zmanê xwe ji bîr ne kirin. Ewana bona xwendin û nivîsandina zmanê xwe, bona pêş va biitna çanda xwe xebatek mezin kirin. Li hundir û li derî welat rojname û kovar derxistin, pirtûk çap kirin. Di zanîngehê der da beşa zmanê Kurdî vekirin û tê da ders dan. Xelîl û hevalên xwe jî çend caran rojname, kovar û pirtûkên Kurdî bi dest xistin, bi dilgermî li wan nihêrin. Ew ji zmanê xwe gelek hez dikin. Niha ew xwendin û nivîsandina Kurdî dizanin. Ê dizanin ku di sazûmanên zordest da meriv gelek rastîyan di xwendegehê da hîn nabe. Divê meriv bi xwe cehd bike û rastîyê hîn be.

Belê, rewşa gelê Kurd jî usa namîne. Gelê me bi lez hişyar dibe, bona azadîyê dixebite. Roj wê bê, emê welatê xwe rizgar bikin, zor û tedayê ji ser xwe rakin. Hingê dibistan û zanîngehên Kurdî jî wê vebin, bi zmanê me jî tê rojname, û pirtûk wê çap bin. Çanda me wê pêş va biçe û gelê me wê ji nezaniyê xilas be, bigihe azadîyê.

Xelîl û hevalên xwe, îro gelê xwe hişyar dikin û bona rojên pêş yê azadî û serfirazîyê dixebitin.

Hevcar	: Araç
Hêja	: Değerli
Daxwaz	: İstek
Fêm kirin	: Anlamak
Winda bûn	: Kaybolmak
Hostatî	: Ustalık
Xeberdan	: Konuşmak
Belav bûn	: Dağılmak
Komel	: Topluluk
Kevn	: Eski
Xwedî	: Sahip
Nivîs	: Yazı
Kifş kirin	: Keşfetmek
Lîse	: Lise
Xwendegeh	: Okul
Mamoste	: Öğretmen
Himber	: Karşı
Şaş bûn	: Şaşırmak
Şa ş	: Yanlış
Enirîn	: Kızmak
Rast	: Doğru
Rastî	: Doğruluk
Zanîngeh	: Üniversite
Bîyanî	: Yabancı
Bingeh	: Temel
Bindest	: Bağımlı, köle
Kûr	: Derin
Nîr	: Boyundurmak
Çand	: Kültür
Ji bîr kirin	: Unutmak
Bi dest xistin	: Elde etmek
Dil	: Yürek
Dilgermî	: Coşku, sıcak ilgi
Serbest	: Serbest, Özgür
Bi serbestî	: Özgürce
Sazûman	: Düzen, rejim
Cehd kirin	: Çaba gösterme
Rewş	: Hal, durum
Rizgar kirin	: Kurtarmak
Rizgarî	: Kurtuluş
Derew	: Yalan
Derewîn	: Yalancı
Hişyar bûn	: Uyanmak
Delal	: Güzel, hoş
Dîrok	: Tarih
Nisilîn	: Süzülme
Zordest	: Zorba

Qedexe	: Yasak
Hiştin	: Bırakmak
Rojname	: Gazete
Kovar	: Dergi
Çap bûn	: Basılmak
Çap kirin	: Basmak
Ceza	: Ceza
Kirin (isim)	: İş, eylem
Lê dan	: Vurmak
Girtin	: Tutuklama
Nefî kirin	: Sürgün etme
Bûyer	: Olay
Radyo	: Radyo
Têlewîzyon	: Televiyon
Hukümet	: Hükümet
Dawet	: Düğün
Stran	: Şarkı, türkü
Zor	: Zor
Lez	: Hızlı, tez
Hov	: Vahşi
Hovîfî	: Vahşet
Beş	: Bölüm
Sazkirin	: Kurmak, düzenlemek
Ders dan	: Ders vermek
Paşda man	: Geri kalmak
Rakirin	: Kaldırmak
Serfirazî	: Başarı
Bo, bona	: İçin
Pêş va birin	: İlerletmek, geliştirmek
Teda	: Eziyet
Diz	: Hırsız
Dizî	: Hırsızlık
Rengdêr	: Sıfat
Hoker	: Zarf

**Hiştin** Kök, emir: bihêle

### Haber kipi

Şemdiki zaman	: Ez di hêlim
Dilî geçmiş	: Min hişt
Mişli geçmiş	: Min hiştîye
Gelecek zaman	: Ez ê bihêlim

### 1. Tekil şahıs

### Dilek kipi

Şimdiki ve gelecek zaman: Ez bihêlim



**Kirin** fiili  
Dilek kipi

### Şimdiki ve gelecek zaman

Ez bikim  
Tu bikî  
Ew bike  
Em bikin  
Hûn bikin  
Ew bikin

Haber kipinin gelecek zamanında dilek kipinden farklı olarak fiilden önce **wê**, **dê** veya kısaltmalı biçimiyle **ê** gelir

Ez ê bêm : *Geleceğim*  
Roj wê bê : *Gün gelecek*

Sözkonusu wê, dê, ê fiil öncüsü özneyi izler.

**Ez**                      **ê**                      **sibê saet çaran da bêm**  
özne                      fiil ö.                      tümleç                      fiil

**Hingê**                      **dibistan û zanîgehên Kurdî jî wê vebin**  
tümleç                      özne                      fiil ö.                      fiil

### Bazı fillerin haber kipi gelecek zamanı: Hatîn

1- Ez ê bêm	2- Ez ê werim
Tu ê bê	Tu ê werî
Ew ê bê	Ew ê were
Em ê bêm	Em ê werin
Hûn ê bêm	Hûn ê werin
Ew ê bêm	Ew ê werin

Hatîn fiilinin gelecek zamanının biri kurala uygun, biri uygun olmayan iki biçimi vardır.

### Çûn Bûn

Ez ê biçim  
Tu ê biçî  
Ew ê biçe  
Em ê biçin

### Xwestin

Ez ê bixwazim  
Tu ê bixwazî  
Ew ê bixwaze  
Em ê bixwazin

Ez ê bibim  
Tu ê bibî  
Ew ê bibe  
Em ê bibin

Hûn ê biçin

Hûn ê bixwazin

Hûn ê bibin

Ew ê biçin

Ew ê bixwazin

Ew ê bibin

### Ji bîr kirin - Ji bîrê çûn

- Serdar, te çima pirtûka xwe ne anî?
- Min ji bîr kir, mamoste.
- Cardin ji bîr me ke!

Ew dixwazin ku Kurd zmanê xwe ji bîr bikin.

Bavê min ji min ra got "Elo, du kîlo şeker bigre." Lê min ne girt. Ew ji bîra min çû.

### Bi dest xistin

Van rojana qehwe nayê dîtin, lê min pakêtek bi dest xist.

Di mala wan da xalçek heye, pir hêja ye, bi dest nakeve.

### Ji wê vir da

Xelîl par lîse xilas kir û çû Enqerê. Ji wê vir da me hev û du ne dît.

Merivê han

: *Ew meriv*

Vê yeka han

: *Vê yekê (vê meselê)*

Pirsa han

: *Ev pirs*

Ew bi kêrî tiştêkî nayê. Ez ji merivê han hez nakim.

Hevalo, rê dirêj e û çetin e; vê yeka han baş bizane û zû bêzar me be!

### Bona kirinê han:

Ew dizîyê dike û derewîn e. Bona kirinê han (dizî kirin û derew kirin) ez ji wê hez nakim.

### Bila

Hesen bixwîne! (Hasan oku)

Hesen bila bixwîne. (Hasan okusun)

Ew bila li wir bimîne... (O şurda kalsin)

- Van rojana qehwe nayê dîtin.

- Qehwe bila li wir bimîne, çay bi dest nakeve.

**Beşa zmanê Kurdî:** Li zanîngeha Sorbon û Lenîngradê beşa zmanê Kurdî heye. Li wir mamoste Kurdî hînî xwendekaran dikan.

### Sazkirin

Piştî sala 1917 di Rusîyê da sazûmanek nû hszabû; zordestî çû, azadî hat.

Em ê rojekî gelê xwe ji nîrê bindestîyê xilaskin û di welat da jînek nu sazkin.

### Fêm kirin

Meriv di saya zmîn da hev û du fêm dike.  
Min ji gotina te tiştêk fêm nekir.

### **Bûyer**

Duh êvarê têlewîzyonê bûyêrên Îranê nîşan da.  
Derketina "Roja Welat" bûyerek mezin bû.

### **Hînkirin**

#### **I**

Hevokên jêrîn biguhurînin demên din (demên ku hûn hînî wan bûne).

#### **Wekî ha:**

Ez diçim bajêr (dema niho-şimdîkî zaman)

- a) Ez çûm bajêr (borîya têdayî-dîlî geç miş)
- b) Ez çûme bajêr (borîya dûdar-mişlî geç miş)
- c) Ez biçim bajêr (raweya blanî-dilek kipi)
- d) Ez ê biçim bajêr (dema paşî-gelecek zaman)

- 1- Ez ji Mahabadê têm.
- 2- Pez li zozanan diçêre.
- 3- Cotkaran cotê payîzê kirine.
- 4- Par zivistanê pir berf barî.
- 5- Tu ê kîngê biçî sûkê?
- 6- Bila bavê wî rûn û penîr bifroşe.
- 7- Ez ê kîlok tirî bixwim.
- 8- Çivîk bi alîkarîya perê xwe fir didin (difirin).
- 9- Wan îro sibê çay vexwar.
- 10- Pêr, Şahan li mal bûye.

#### **II**

Bi hokerên jêrîn hevokan çêbikin:

*Jêr, jor, dor, ser, bin, paş, pêş, hundir, der, cem, hingê, kîngê, car car, çend, ewqas.*

Wekî ha:

Mala me li jêrî gund e.

#### **III**

Bi rengderên jêrîn hevokan çêbikin:

*Dirêj, kurt, bilind, nizm, kûr, nêzik, dûr, germ, sar, hişk, nerm, sor, zer, kesk, şîn.*

#### **IV**

Bi lekerên jêrîn hevokan çêbikin:

*Qijîn, gîrîn, di heqê da hatin, tûj kirin, vebûn, vêxistin, rizgar kirin, winda bûn, fêm kirin, ji bîr kirin, rakirin, saz kirin, pêş va birin, dizîn.*

Wekî ha:

Miîşk çima diqê?

XX

## MÎR CELAL

Navê gundê me Mircan e. Erdê wê nîvî deşt e, nîvî çîya û zozan e. Mircan gundekî xweş e, bi dar û ber e. Deştê da li cîyên avî titûn, pembu û kuncî dibe. Niha silq jî tê ajotin. Li cîyên bejî ceh, genim û nîsk rind dibe. Li quntarên çîyan, li ser mêrg û zozanan keriyên pez diçêrin.

Mircan, bi temamî ya Mîr Celal e. Kal û pîrekên me dibêjin ku bapîrê wî Mîr Mihemed xwedîyê 120 gundan bûye. Mîr Mihemed di wexta Osmanîyan da mîrê mîran bûye, li vê dorê hukim hemû di dest wî da bûye. Wî erdekî freh bi dest xistîye û li ser xwe tapî kirîye. Bi vî awayî ev gund bûne milkê wî.

Piştî mirina Mîr Mihemed milkê wî di nav kurên wî da parva bûye. Niha gelek newiyên wî hene. Ji wan Mîr Celal xwedîyê 15 gundan e. Ango wekî Mircanê 14 gundên wî yê din hene.

Gund berê 60 mal bû. Xelkê gund hemû colegê Mîr bûn. Mîr, her yekî erdek dabûyê û wana bi gan ew erda dajot.

7-8 sal berê, mîr traqtor anî gund. Êdî minetê wî bi cotê colegan ne ma. Wî, erdê gundîyan ji dest wan girt û xwest ku ji gund derkevin, biçin.

Gund kete şînê. Gundî li rawera Mîr gerîn, jê ra gotin: "Me ewqas sal xulamîya te û bav û kalê te kirîye. Niha tu me dikî der, em biçin kîderê? Qe nebe, hinek erd bifroşe me; em bajon û dênê xwe bidin"

Mîr guh ne da gofînên wan. Got: "Ji we ra şeş meh mihlet. Piştî şeş mehê kesî li gund nebînim!"

Şeş meh qedîya. Di vê mabêynê da qasî bîst malan barkirin çûn. Yê din digotin, dibe mîr tê rehmê... Lê Mîr hat û got "Zû ji erdê min derkevin, yan jî ez we bi zorê derdixim."

Hin kesan berê wî dan. Bi navê Misto gundîyek hebû, Wî got: "Lao gundîno, dernekevin! Heke em yekbin ew nikare me derxe." Gundîyan got:

- Erdê wî ye. Ku bixwaze me derdixe.

Misto got:

- Çi erdê wî ye? Erdê xwedê ye. Bapîrê wî bi çoyê zorê ew bi dest xistîye. Erdê em dajon, piştta me dişkê; ew di cîyê xwe da rûdine, destê xwe nade sar û germê. Em pêktînin, to ew dixwe, ji me ra dew dimîne... Hûn bi rastî dipirsin, erd heqê me ye.

Gundîyan pirsî:

- Lê em çi bikin, tiştêk ji dest me nayê. Mîr xurt e. Em pê nikanin.

Misto dengê xwe bilind kir:

- Pê dikanin! Çima ew yek meriv e, em bi sedan in. Gundên din jî mîna yê me ne. Em bi hezaran in. Yekbin û ber xwe bidin.

Lê piranîya gundîyan guh ne dane wî, qîreta hev ne kirin. Misto û çend hevalên xwe berê mîr dan, ji gund derneketin.

Di nav wan û Mîr da şer derket. Mîr berê xulamên xwe yên bi çek şande ser wan. Misto ew revandin. Paşê Mîr ji hukumetê alîkarî xwest. Cendirme kete gund. Li gundîyan tedayek mezin bû. Jin û mêr, kal û zaro ne gotin, lê xistin. 15 mêr, Misto jî di nav wan da, birin mapisê.

Paşê gund vala bû. Tenê çend xulamên Mîr bi mal va di gund da man. Ew jî di rez û baxçeyê mîr da dixebitin, pezê wî xwedî dikin û hin erdên wî dajon ku traqtor nikane lê bigere. Hin jî xizmet û azetê mala wî dikin û wî ji dijminan diparêzin.

Malên gundîyên çûyî di bin berf û baranê da hilweşîn, bûn pag. Li gund ga, ker û hesp kêmbûn. Nîrhevcar di tûrtan da ji bîr bûn, gîşinan jeng girtin. Niha karê wan traqtor dikin.

Piştî ku Misto ji mapisê derket, li Mîr xist, ew kuşt û tevî du hevalên xwe revî çîyê. Lê niha, cîyê Mîr Celal çar kurên wî girtine. Ew li bajêr rûdinin. Yek toxtor e, yek abûqat e, yek jî ticarîyê dike, otêl û aşxanên xwe hene. Yê çaran, deh sal e ku li parlamentoya Tirkîye mebûs e. Ew bi rayê gundîyan tê bijartin...

Gundîyên ku mal barkirin, hin çûn alîyê Edenê, hin Stenbol û Îzmîrê. Hin jî li Dîyarbêkrê bi cî bûn. Piranîya wan bûn êrxat û karker. Hinan jî kar ne dîtin, seffîl bûn, bi parsê ketin.

Di gund da dîsa titûn, pembu, kuncî, genim û nîsk dibe, pez li çîyan diçêre, baxçe û rez ber didin û jê bi mîlyonan qezenç pêk tê. Ew jî digihe destê mîran û di nav wan da parva dibe...

Mîr	: Bey
Kuncî	: Susam
Silq	: Şeker pancarı
Nîsk	: Mercimek
Avî	: Sulu toprak
Bejî	: Susuz toprak
Quntarê çîya:	Dağ eteği
Kerî	: Sürü
Pîrek	: Yaşlı kadın
Pîr	: Yaşlı
Osmanî	: Osmanlı
Mîrê mîran	: Beyler beyi
Hukim	: Hüküm, egemenlik
Tapî kirin	: Tapu etmek

Milk	: Mülk
Parva bûn	: Bölünmek, pay edilmek
Parva kirin	: Bölüşmek, paylara ayırmak
Coleg	: Yarıcı
Erdek	: Bir toprak
Ga	: Öküz
Xwedî kirin	: Beslemek
Ber	: Mahsul
Qezenc	: Kazanç
Milyon	: Milyon
Meyxane	: Meyhane
Kerxane	: Genel ev
Xerc kirin	: Harcamak
Traqtor	: Traktör
Minet	: Mihnet
Li raweran	: Yalvarmak
geîn	
Xulam	: Hizmetçi
Der kirin	: Kovmak
Dên	: Borç
Mihlet	: Süre, mühlet
Qedîn	: Bitmek, sona ermek
Qedandin	: Bitirmek, sona ermek
Xizmet û azet	: Hizmet
Rehm	: Merhamet
Berê yekî dan	: Birine karşı direnmek
Ber xwe dan	: Direniş
Xwedê	: Tanrı
Ço	: Sopa
Bi çoyê zorê	: Sopa gücüyle, zorla
Pişt	: Bel
Şikestin	: Kırılmak
To	: Kaymak
Ji dest hatin	: Becermek, yapabilmek
Eşîr	: Aşiret
Eşîrfî	: Aşiretçilik
Edet	: Adet
Qîreta	: Birine yardım
yekî kirin	etmek
Şer	: Savaş
Bi çek	: Silahlı
Revandin	: Kaçırarak
Hukümet	: Hükümet
Cendirme	: Jandarma
Hilwe şîn	: Yıklamak
Pag	: Harabe
Nîrhevcar	: Karasaban
Mabeyn	: Ara

Türt	: Avlu
Ji bîr bûn	: Unutulmak
Jeng	: Pas
Jeng girtin	: Pas tutmak
Toxtor	: Doktor
Abûqat	: Avukat
Ticarî	: Tüccarlık
Ticar	: Tüccar
Otêl	: Otel
Aşxane	: Lokanta
Parlamento	: Parlamento
Mebûs	: Mebus
Ray	: Oy
Bi cî bûn	: Yerleşmek
Êrxat	: Irgat
Sefil	: Sefil
Pars	: Dilencilik
Parsek	: Dilenci
Pars kirin	: Dilenmek
War	: Yaylak
Sêwî	: Yetim
Pîhn	: Tekme
Betal	: İşsiz
Betalî	: İşsizlik
Xerîb	: Yabancı
Xerîbî	: Yabancılık
Mapis	: Hapis
Mapisxane	: Hapishane
Wala	: Boş
Bi mal va	: Evcek
Gîsin	: Saban demiri
Dijî	: Karşı
Zulm	: Zulüm
Seî hildan	: Baş kaldırmak
Bahoz	: Fırtına
Kûçe	: Sokak
Heq	: Hak
Neheq	: Haksız
Zik	: Karın

### Şimdiki zamanın hikayesi

Fill: *Gotin* Kök: *Got*

(**Dema niho**)

Şimdiki zaman

Ez dibêjim

Tu dibêjî

(**Borîya têdayî**)

Di`li geçmiş

Min got

Te got

Ew dibêje  
Em dibêjin  
Hûn dibêjin  
Ew dibêjin

Wî, wê got  
Me got  
We got  
Wan got

**(Boîya dûdar)**

*Miş`li geçmiş*

Min gotîye  
Te gotîye  
Wî, wê gotîye  
Me gotîye  
We gotîye  
Wan gotîye

**(Boîya berdest)**

*Şemidiki zamanın hikayesi*

Min digot  
Te digot  
Wî, wê digot  
Me digot  
We digot  
Wan digot

Şimdiki zamanın hikayesinde fiil **di** önekini alır. Geçişli fiiller takı almaz. Geçişsiz fiillerde ise kök son harfinin sesi veya seszoluşuna göre takı alırları şöyledir:

Gerîn- Kök:	<b>Gerî</b>	Ketin- Kök:
<b>Ket</b>		
Ez digerîm	<b>m</b>	Ez diketim
<b>im</b>		
Tu digerî	-	Tu diketî
<b>î</b>		
Ew digerî	-	Ew diket
-		
Em digerîn	<b>n</b>	em diketin
<b>in</b>		
Hûn digerîn	<b>n</b>	
Hûn diketin	<b>in</b>	
Ew digerîn	<b>n</b>	Ew diketin
<b>in</b>		

Not: 1-Geçişsiz fiillerde şimdiki zamanla hikayesi arasındaki farka dikkat ediniz.

**Şimdiki Zaman**

Ez digerim  
Tu digerî  
Ew digere  
Em digerin  
Hûn digerin  
Ew digerin

**Şimdiki zamanın hikayesi**

Ez digerîm  
Tu digerî  
Ew digerî  
Em digerîn  
Hûn digerîn  
Ew digerîn



2- Kûrtçede (î) seslisi ile biten fiillerin mazi zamanlarının çekimi farklı bir biçimde de yapılır.

<b>Mastar</b>	<b>Kök</b>	<b>dili geçmiş</b>	
Gerîn gerîyam		Gerî	Ez
Çêrîn		Çêrî	Ew çêrîya
Kirîn		Kirî	Te kirîya
Dizîn		Dizî	We dizîya
We şîn	We şî		Pel we şîya
Tirsîn	Tirsî		Şahan tirsîya

### **Mişlî geçmiş**

### **Şimdiki zamanın hikayesi**

Ez gerîyame		Ez dîgerîyam
Ew çêrîyaye		Ew diçêrîya
Te kirîyaye	Te dîkirîya	
We dizîyaye		We didizîya
Pel we şîyaye		Pel dîwe şîya
Şahan tirsîyaye	Şahan dîtirsîya	

### **Li raweran gerîn**

Alîşêr got "Ez ê biçim Elmanîyê". Jina wî jê ra got "Meçe". Li raweran gerî, kir-ne kir, ew ji daxwaza xwe venegerî û çû.  
Gundî li rawera mîr gerîn. Lê wî erd ne frote wan.

### **Mal Barkirin**

Dema biharê koçer malan bardikin, ber bi zozanan diçin. Straneke Kurdî da usa tê gotin:

"Malan barkir çûne waran  
Ez sêwî mam ber dîwaran.."

Gelek Kurd, bona xizanî û betalîyê, mala xwe bardikin diçin welatê xerîbîyê..

### **Berê yekî dan - Ber xwe dan**

Hesp li mêrgê diçêrîya. Gurek jî wî alî hat ku hespê bixwe. Lê hespê berê wî da, pîhnek lê xist û gur revî çû.

Kurdan gele caran dijî zulm û zordestîyê serî hildan. Wan li himber dijmin rind ber xwe dan, lê dijmin xurt bû, ne kanîn bigihên rizgarîyê.

### **Ji dest hatin**

Bahozê mala me hilweşand, tiştekan ji dest me ne hat. Gundîyan digot: "Mîr xurt e, me dike der. Tiştekan ji dest me nayê". Lê ku gundî yekbin, ew ji mîran û axan xurtir in. Hingê pir tişt jî dest wan tê.

### **Bi mal va**

- Tu ji Edenê yî?
- Na, em bi mal va li Sêrtê rûdinin.

### **Xizmet û azet**

Dîya Gulîzerê êdî pîr bûye û nexweş e. Ew di mal da disekine û xizmet û azeta dîya xwe dike.

### **Ji bîr bûn**

Nîrhevcar di tûrtan da ji bîr bûn.  
Merivên ku di rîya azadîyê da dimirin, navê wan tucar ji bîr nabe.

### **Bi cî bûn**

Hin gundî di Dîyarbekrê da bi cî bûn.  
Ewqas pez di tûrtê da bi cî nabe.

### **Pars kirin**

Ew cotkarek baş bû. Lê niha betal û birçî ye, di kuçê bajarê da parsê dike.

### **Qîreta yekî kirin - Pişt girtin**

Di mabêyna gundîyan û mîr da şer derket. Cendîrme qîreta Mîr kir. Ji xwe hukûmet tim pişt dewlemendan, axan û bûrjûwan digire, hukûmet ya dewlemendan e. Qezîya hukûmeta Tirk û ya feodalê Kurdan yek e. Herdu jî naxwazin ku Kurd û hemû xebatkarên Tirkîyê hişyar bin, li heqê xwe bigerin, azad bin. Bona vê yekê, divê gelê Kurd û xebatkarên Tirk jî, dijî hukûmeta zordest û axan yekî çêbikin, qîreta hev bikin.

Di dema eşîrîyê da her yekî qîreta eşîra xwa dikir, pişt merivê xwe digirt. Lê ew edeta kevn îro êdî ne tiştekan baş e. Divê meriv qîreta rastîyê bike, ya neheqan neke.

Li zikê meriv xistin, got: Ax pişt min!

### **Hînkirin**

Bersîva pirsên jêrîn bidin:

- 1- Mircan gundekî çawa ye?
- 2- Li Mircanê di cîyên avî da çi dibe, bejî da çi dibe?

- 3- Mircan milkê kê ye?
- 4- Çend gundê bapîrê Mîr Celal hebûye?
- 5- Wî, ew gundana çawa bi dest xistîye?
- 6- Gundîyên ku erdê mîr û axan dajon, ji wan ra çi tê gotin?
- 7- Mîr û axan ev milkên freh kirîne, yan di saya xebata xwe da bûne xwedîyê wan?
- 8- Ku bapîrê Mîr Celal mir, milkê wî çi bû?
- 9- Gundîyan û Mîr Celal, qezenc bi çi awayî parva dikirin?
- 10- Rewşa gundîyan çawa bû?
- 11- Qezencê Mîr Celal çawa bû?
- 12- Wî û kurên xwe, pere li ku û bi çi awayî xerc dikirin?
- 13- Çima minetê Mîr bi cotê colegan nema?
- 14- Wexta ku Mîr ji gundîyan ra got: "Ji gund derkevin" gundîyan çi kir?
- 15- Mîr, çiqas mihlet da wan?
- 16- Di vê mihletê da çend mal ji gund derketin?
- 17- Misto ji gundîyan ra çi got?
- 18- Di zevîyan da kî dixebite? Kî pez diçêrîne?
- 19- Axa û Mîr destê xwe li sar û germê dixin?
- 20- Gotina Misto rast e yan ne rast e?
- 21- Di mabêyna Mîr û gundîyan da çi derket?
- 22- Çima gundîyan şerwinda kir?
- 23- Cendirmê di gund da çi kir?
- 24- Ew ê şer tim winda bikin?
- 25- Kîngê gundî wê di heqê zordestan da bîn?
- 26- Misto û hevalê xwe çi bûn?
- 27- Di gund da kî ma? Ewana çi dikin?
- 28- Malên gundîyên çûyî çi bû?
- 29- Nîrhevcar û gîsin çi bûn?
- 30- Misto ku ji mapsê derket çi kir?
- 31- Bi kuştina mîrekî dawîya axatî û mîrtîyê tê?
- 32- Dawîya axatî û mîrtîyê bi çi awayî tê?
- 33- Mîr, axa û şêx heqê gundîyên reben diparêzin?
- 34- Çima gundî rayên xwe didin wan û wan dikin mebûs?

#### a) Sifat Fiil (geçmiş zaman ortacı)

Filler (i) eki alarak sıfat işlevi görürler:

Çû- Çûyî (Giden, gitmiş olan)- Sala çûyî  
 Xwar- Xwarî (Yemiş olan)- Merivê têr xwarî  
 Hat- Hatî (Gelmiş olan)- Zaroyê hatî  
 Şkest-Şkestî (Kırık, kırık olan)- Fîncana şkestî

#### b) «sim ve sıfatlardan (fî) ve (î) ekiyle yeni isimler türer:

Mîr- mîrtî (beylik)	Germ-germî (sıcaklık)
Axa-axatî (ağalık)	Dirêj-dirêjî (uzaklık)
Xulam-xulamî (uşaklık)	Giran-giranî (ağırlık)

Ticar-ticarî (tûccarlık) Rast-rastî (doğruluk)  
Bajar-bajaî (şehîrî)

## XXI

### MIRINA CEMO

Em sê heval bûn. Îso, Cemo û ez. Em diçûn Dostelê. Rojek germ û xweş bû. Li dorâlî rê gundîyan cot dikir. Li mêrgan pez diçêrîya. Dengê bilûra şivanan dihat. Li vir û wê kewan dixwend.

Li rê em rastî cendirman hatin. Ewana ji gundê Şervanê dihatin. Hayê me ji tişteki tune bû. Tevî wan gundî jî hebûn. Gundî jin û mêr bûn. Destê wan bi hevra grêdayî bû. Cendirman jê ra qezîyên xirab digotin û lê dixistin. Cilên wan peritî bû. Ser û çavê wan perçîfî bû. Ji pozê xortekî xwîn dihat. Mêr bédeng bûn, jin diqîrîyan û dilorîyan.

Em her sê jî gelek tirsîyan. Cemo got:

- Mesekinin, em birevin!

Min got:

-Na lo, me tirsîn, tişteknabe...

Lê hîn gotina min xilas ne bû ku, Cemo got çirp û bazda. Cendirman hema dest avêtin tîfingan û kirin qîre-qîr:

- *Dur len, gaçma!*

Walle Cemo ne sekinî. Ber bi jêr direvîya. Hindik mabû ku bigihe rêlan û jî çav winda bibe, du-sê tîfing teqîyan. Cemo çîkiya, pê piştî xwe girt, gavek du gavê din avêt, di ser çokan da ket, dirêj bû û bédeng ma.

Dengê kewan û bilûra şivanan hat birîn.

Hay jê hebûn	: Heberli olmak
Rast hatin	: Rastlamak, Karşılaşmak
Peritî	: Yırtık, pırtık, param parça
Lorîn, Lorandin	: Ağıt yakmak, ninni söylemek
Bi rê kirin	: Göndermek
Qîre-qîr kirin	: Bağırarak çağırmak
Bazdan	: Kaçmak, atlamak
Rêl	: Ağaçlık, fundalık
Gava	: Esnasında, anında
Teqîn	: Patlamak
Çîkîn	: Çığlık atmak
Walle	: Vallahi
Bilûr	: Kaval
Şivan	: Çoban
Gav	: Adım

Çok		: Diz
Tifing	: Tüfek	
Girê dan	: Bağlamak	
Girêdayî	: Bağlı	
Fayton	: Payton	
Bedesten	: Kale duvarı	
Mizgeft	: Cami	
Doralî	: Çevre	
Lê gerîn	: Aramak	
Zewicîn	: Evlenmek	
Name	: Mektup	
Perçifîn	: Şişmek	
Perçifî	: Şişkin	
Xwîn		: Kan
Qezî		: Söz
Xirab		: Kötü

### **Rast Hatin**

Em li rê rasfî cendirman hatin  
Tu rind rast hatî, ez jî li te digerîyam.

### **Lê gerîn**

-Ew li çi digere?  
- Wî kera xwe winda kiriye, lê digere.

### **Hay jê hebûn**

-Te bihîst? Beko û Sewlî dizewicin..  
-Dizanim, hayê min jê heye.  
Silêman ji bavê xwe ra name bi rê dike. Lê bavê wî mehek berê mirîye: hayê wî jê tune.

### **Qîre-qîr kirin**

Cendirman kire qîre-qîr  
Gava em heqê xwe dixwazin, zordest dikin qîre-qîr.

### **Got çirp û bazda**

Cemo tirsî, got çirp û bazda.  
Şahan çer destê xwe dirêjî hêlûnê kir, çivîkê got pirt û firda.  
Min kevirek avêt golê, kevir got gulp û di nav avê da winda bû.

Dilî geç mişin hikka yesi - Borîya Çîrokî

### **Geçişli fiillerde**

Kök son harfi sesli olanlarda:

Örnek: Anîn

Kök : Anî

Kök son harf sessiz olanlarda:

Örnek : *Kirin*

Kök : *Kir*

Min anî bû (*getirmiştim*)

Te, wî, wê anî bû

Me, we, wan anî bû

Min kiri bû (*yapmıştım*)

Te, wî, wê kiri bû

Me, wê, wan kiri bû

Görüldüğü gibi geçişli fiillerde asıl fiili **bû** yardımcı fiili izler. Kökü sessiz bir harfle biten geçişli fiiller (i ) takısı alır.

Eğer nesne çoğul ise **bû** yardımcı fiili (n) çoğul takısı alır.

Min pirtûkek anî bû.

Min du pirtûk anî bûn.

Hesen hesp kiri bû tûrtê (hespek)

Hesen hesp kiri bûn tûrtê (ji yekî zêdetir).

Geçişsiz fiillerde

*Revin*

Kök: *Revî*

Bû yardımcı fiilinin aldığı takılar

Ez revî bûm

**m**

Tu tevî bû

-

Ew revî bû

-

Em revî bûn

**n**

Hûn revî bûn

**n**

Ew revî bûn

**n**

**Ödev:** Aşağıdaki dili geçmiş fiilleri dili geçmişin hikâyesine çevirin.

(Lêkerên jêrîn yên borîya têdayî bikin borîya çîrokî)

Xelîl li otobozê sîyar bû, çû Dîyarbekrê. Li bajêr xalê wî hebû. Xelîl ji xalê xwe ra zembîlek tirî dibir. Ew, kîngê gihîşte bajêr, ji otobozê peya bû û çû malê. Xalo, kîngê ew dît gelek şa bû, bona tirî ji xarziyê xwe ra gelek spas kir. Xelîl, çend rojan li mala xalê xwe bû mêvan. Xalê wî ew li faytonê sîyar kir û li bajêr gerand. Bedestenê mezin û mizgeftên kevn şanî wî da. Xelîl, xasima ji bedesten gelek hez kir. Xalo jê ra got ku " Dîyarbekir bajarekî Kurdan e, gelek kevn e û bi nav û deng e. Zemanê berê navê xwe Amed bû."

**Örnek:** Xelîl li otobozê sîyar bû bû, çû bû Dîyarbekrê.

## ŞÊXÊN GIZANÊ

Li hêla me, li gundê Gizanê ocaxa şêxan heye. Şêxên Gizanê îro sê bra ne. Şêx zeddîn, Şêx Tahir û Şêx Nûreddîn.

Wekî tê zanîn, gundî şêxan wek merivên bimbarek dihesibînin. Diçine dest û pîyên wan, diayên wan distînin. Gora pir kesan şêx xwedî hêkmet in. Li ser hêkmetên şêxan gelek hikyat têne gotin.

Şêxên Gizanê, bi nijad, xwe digihînin Xalid bîn Welîd. Gora hikyatê, gava bapîrê wan ji Erebîstanê hatîye van doran li hirçekî sîyar bûye, di dest da jî mîna qamçî, marek hebûye. Wî, bi vî marî hirç dajotîye.

Nifûzên wan gelek mezin e. Li çaralî Bidlîsê, Sêrtê û Mûşê bi hezaran mirîdên wan hene. Hersê bran karên şêxtîyê di nav xwe da parva kirine.

Şêx Îzeddîn mezinê wan e. Ew bi karê ol mijûl dibê, hêkmetan nîşan dide. Gora gotina gundîyan, şêx Îzeddîn, rojekî zivistanê çûye gundê Milanê. Her der di bin berfa stûr da bûye. Şêx ji xwedîyê malê ra gotîye:

- Dilê min temetêz û xiyaran dixwaze!

Gundî şaş bûne. Jê ra gotine:

- Ma efendî, zivistan e; niha temetêz û xiyar tê dîtin?

Şêx çavê xwe girtîye, demekî usa sekinîye, paşê vegeîye wan gotîye:

-Biçin, li newala Kortan dareke gûzê ya mezin heye; li koka wê binêrîn...

Newala ku şêx gotîye li jêrî gund bûye. Çend gundî derketine, çûne newalê, li dora gûza mezin gerîne. Lê çî bibînin: xiyar û temetêzên teze di koka darê da disekin!

Ji wê rojê şunda hêkmeta şêx di nav gundan da belav bûye û navê wî gihîştîye welatên dûr. Mirîdên wî qat bi qat zêde bûne, li derê wî civîne. Îro mala şêxan mîna pêtaga mêşan dişuxule...

Gundîyên reben bêhay bûn ku li bajaran her dem, di rojên çille da jî hêşînayî, xiyar û temetêz têne dîtin. Ew li welatên germ û li camekanan dibin û di nav rojekî-du rojan da digihîjin sîfrê dewlemendan. Û wan ne dizanî ku, rojekî berê nasekî şêx ji Enqerê hati bû û jê ra temetêz û xiyar anî bûn; wî jî gava hati bû gund, ew li ser rêya xwe di koka gûzê da veşartî bûn...

Merivên ku bo dîtina şêx tîn, tim bi xwe ra xelatekê tînin: karek an berxek, mîh û bizin, merş û xalîçe, mast, rûn û penîr, dan û sawar.. Hin kes jî pere didine şêxan.

Berê mala şêxan du qat bû. Şêx Îzeddîn li Qatê jorîn rûdinişt. Merivên şêx, berê, mêvan li qatê jêrîn di odeyek freh da didan rûniştandin. Û wan, mirîd ji şêx ra çî anîye hîn dibûn û bi mikrofoneke dizî xeber didane şêx. Kîngê mirîd derkete hizûra şêx wî xal û xatir jê dipirsî û tiştê ku anîye nav lê dida û jê ra sipas dikir. Ango, mirîd ku beroşek rûn anîye, şêx wiha digot:

-Tu xêr hatî, filan kes. Lê te çima bo rûn zehmet kir! Xwedê qebûl ke û ji te û zar û zeçê te razî be...

Mirîd himber vê gotinê şaş dibû û dima. Gelo, şêx çawa dizanî ku wî rûn anîye? Piştî jî bawerîya xwe pê danî ku ew xwedî hêkmet e, ji keybê dizane...

Bi vî awayî, bimbarekîya şêx, her ku çû, di nav millet da fireh bû. Her usa jî, ew roj bi roj dewlemendtir bûn.

Her sê bran, bi vê qezenca mezin li hêla Bidlîsê û Mûşê erdê freh kirîn. Li gundê Gizanê baxçeyek mezin serrast kirin. Di orta bêxçe da qonaxekî modern û çarqafî danîn. Qatên wê freh in, ji dûr va mîna qesreke bilind û freh xuya dike. Gundîyên reben di avakirna bêxçe û qonaxê da, di anîna elatrîkê da belaş, bi dil û can xebitîn. Şêxan û hempayên wan digotin: "Kî di karê şêxan da bixebite sewabek mezin distîne û diçe bihûştê!" Bona vê yekê, şêxan bo karkerîyê tu mesref ne kirin û serda jî, ji mirîdan gelek pere komkirin.

Di Gizanê da şêxan medrese vekirin. Di vê medresê da qasî 70-80 suxte, ango feqî dixwînin. Şêxan, bo xercên medresê ji gundan gele tiştên xwarinê, cil, nivîn û pere komdikin. Ewana bo medresê li deşt û bajarên nêzik aş çêkirin û dan şuxulandin. Lê qezencên medresê, piranî dikeve berîka şêxan.

Di medresê da şêx Îzeddîn ders dide. Lê karên berhevkirina xelat û bêşên mirîdan, îdara a şû karxanên din di dest Şêx Tahir da ye. Ango ew li karên aborî dinêre...

Şêx Nûreddîn li mektebên tirkan û zanîngehên frengan xwendîye. Ew bi çend zmanan dizane. Her usa jî, panzdeh sala e ku li parlamentoya Tirkîyê endam e. Çar salan da carê hîlbijartina parlamentoyê çêdibe û ew tim tê hîlbijartin. Îro rayên gundîyan jî mîna bêşekî şêxîyê ye, wek milkê wan e.

Rûmeta şêxan li derê hukumetê jî gelek bilind e. Gava memûrek mezin tê gund, li wan dibe mêvan. Mabeyna wan û hukumeta Tirk gelek xweş e. Çima xweş ne be, mafê şêxan û ya hukumeta Tirk yek e, herduyan jî gelê Kurd kirine bende û heyîyên wî didizin. Hukumet destê Kurdan girê dide, şêx jî çavê wan...

Li karê şêxan yê derê hukumetê Şêx Nûreddîn dinêre. Hin kesên hişyar, bo wî "wezîrê şêxan yê dervayî" dibêjin.

Şêx bo medresê têr genim, ard, sawar, rûn penîr û pez komdikin. Lê feqî tim birçî ne; zikê wan têr nabe û piştê wan germ nabe. Par partîya Edlayî bo medresê qamyonek qumaş şand, lê ew ne ghişte destê feqîyan! Şêxan ew li der frotin û pere kirin berîka xwe. Feqî niha van tiştan fêhm dikin, lê nikanin ji şêxan ra tiştêkî bêjin. Ger dengê xwe bikin şêx wan dikin der.

Pez û dewarên şêxan zehf e. Ew pezê xwe di nav mirîdan da belav dikin. Her gundîyek çend pez û dewarê şêxan xwedî dike. Dîsa jî çend salan berê, şêxan dest avêtin çiloyê gundîyan, ew ji wan girtin. Gundî tirsîn û dengê xwe ne kirin. Wê salê gundîyek, di ciwanîyê da çû heqîye xwe. Gelek pez û çend zevî ji jina wî ra ma. Şêx Tahir got ku ji wî ra "emrê îlahî" hatîyê, divê ew vê jinikê ji xwe ra bîne û milkê wê jî bistîne. Şêx Tahir usa kir û gundîyan deng ne kir.

Gundî himber teda û kedxwarîya şêxan deng nakin. Ji ber ku ew nezan in, ji şêxan ditirsin. Dibêjin, heke em dijî şêx derkevin devê me xar dibe, an belayek tê serê me.

Pir kesên nezan usa bawer dikin ku şêx dikanin nexweşan xweş bikin. Li pir cîyan gundî, nexweşan, dinan, jinên bê zaro dibine ocaxa şêxan. Hin kes jî lingê şêxan dişon û ava qirêj vedixwin.

Li gele cîyên Kurdistanê hal û rewşa gundîyan usa ye. Lê ev nezanî heya kîngê bi vî awayî diçe?

Îro gelê Kurd dijî xirabîya axa û şêxan bi lez hişyar dibe. Roj bi roj hejmara merivên zana zêde dibe. Xelk hîn dibe ku gotinên şêxan hemû vir û derew in.



Tu hêkmet di wan da tune. Ew jî mîna me meriv in, lê aqlê xwe li xirabîyê digerin. Ew, gundîyên reben dixapînin, heyîyên wan didizin û wan di karê xwe da belaş didin şuxulandin.

Hêl	: Taraf, yöre
Ocax	: Ocak, tekke
Wekî tê zanîn:	<i>Bilindiği gibi</i>
Bimbarek	: Mübarek
Hesibandin:	<i>Varsaymak, öyle düşünmek</i>
Dia	: Dua
Pî	: Ayak
Hêkmet	: Hikmet
Hikyat	: Hikaye
Nijad	: Soy, ırk
Ereb	: Arap
Erebîstan	: Arabistan
Qamçî	: Kamçı
Nifûz	: Nüfuz, etki
Mirîd	: Mürid
Hersê	: Her üç
Oî	: Din
Stûr	: Kalın
Xiyar	: Salatalık
Şaş bûn	: Şaşırmak
Çav girtin	: Göz kapamak
Newal	: Dere
Gûz	: Ceviz
Civîn	: Toplantı
Pêtag, kewar:	<i>Kovan</i>
Pêtaga mêşan:	<i>Arı kovanı</i>
Şuxul	: İş, çalışma
Bêhay	: Habersiz
Çille	: Kışın en soğuk 40 günü, kış ortası
Camekan	: Camekan, sera
Nas	: Tanış
Veşartîn	: Saklamak
Xelat	: Armağan
Meş	: Kilim
Lê dan	: Dövmek
Mêvan	: Konuk
Mikrofon	: Mikrofon
Dizî	: Gizli
Xeber dan	: Haber vermek
Xal û xatir	: Hal - hatır
Nav lê dan:	<i>Adını vermek,</i> <i>adıyla çağırmak</i>
Beroş	: Bakraç

Wiha	: Byle
Xr	: Hayır
Filan	: Filan
Qebl	: Kabul
Zar  z	: oluk- ocuk
Raz	: Razi
Bawer p	: nanmak
ann	
Xeyb	: Gaip
Qezenc	: Kazan
Serrast	: Kurmak
kirin	mejdana getirmek
Modern	: Modern
Kalorifer	: Kalorifer
Elatrik	: Elektrik
Ron kirin	: Aydnlatmak
Germ bn	: Isınmak
Qesr	: Kasr, saray
Bela 	: Bele
Bi dil  can	: Gnlden, fedakarlıkla
Hempa	: Hempa, rafaftar
Sewab	: Sevap
Hildan	: Kaldrmek
Biht	: Cennet
Serda j	: stelik
Medrese	: Medrese
Suxte	: ğrenci
Feq	: Medrese ğrencisi
Xerc	: Masraf
Nivn	: Yatak
Berik	: Cep
B	: Vergi
dare	: dare
Abor	: Ekonomik
ore 	: Devrim
Cribandin	: Denemek
uxulandin	: alıtırmak
Freng	: Frenk
Hilbijartin	: Seim
Rmet	: Saygnlık
Memr	: Memur
Mabeyn	: Ara, iliki
Maf	: ıkar
Bende	: Kle
Wezr	: Bakan, vekil
Wezr	: Dileri bakan
dervay	
Ard	: Un

Edlayî	: Adalet
Partî	: Parti
Qamyon	: Kamyon
Qumaş	: Kumaş
Şandin	: Göndermek
Giniştin	: Yetişmek, varmak
Deng kirin	: Seslenmek, itiraz etmek
Belav kirin	: Dağıtmak
Çilo	: Meşe yaprağı
Emrê îlahî	: Kutsal emir
Jin ji xwe ra	: Evlenmek
anîn	
Teda	: Zulüm, teda
Ked	: Emek
Kedxwarî	: Sömürü
Dijî yekî	: Birine karşı çıkmak
derketin	
Nexweş	: Hasta
Xweş	: İyi, hoş
Dîn	: Delî
Qirêj	: Kirli
Xirabî	: Kötülük
Hejmar	: Sayı
Vir û derew	: Yalan
Ciwan	: Genç
Xapandin	: Aldatmak
Dawî	: Son
Derewîn	: Yalancı
Tizirûg	: Sülük
Qirnî	: Kene
Zewicîn	: Evlenmek
Çûn heqîyê	: Ölmek

**Rûniştin:** Oturmak

**Dan rûniştandin:** oturtmak

Mêvan li ser kursî rûniştin

Xwediyê malê mêvan li ser kursî dan rûniştandin.

**Xwendin -dan xwendin**

Elo dixwîne

Bavê Elo ew da xwendin.

**Bawer kirin -bawerî pê anîn**

Xelîl merivek teral e, bawer nakim ku ji xwe ra karekî bibîne.

-Tu bawer dikî, em jî rojekî wê bigihên azadiyê?

-Belê, min bawerîya xwe bi şoreşê anîye; rojekî şoreş wê çêbibe û em ê azad bin.

Gundîyan bawerîya xwe bi şêx danîn; ji ber ku şêx ew xapandi bûn.

### Serrast kirin

Gundî xebitîn û ji şêx ra baxçeyek serrast kirin.

Di Oktobra mezin da, sala 1917`an li Rusîya karker û gundîyan sazûmana kevnare û zordest hilweşandin û sazûmana xebatkaran serrast kirin.

### Bi dil û can

Dersdar ji zarokan ra digot:

- Zarno, bi dersa xwe mijûl bibin, bi dil û can bixebitin; zanîn we ji tarîyê xilas dike.

Li welatên sosyalîst karker û gundî bi dil û can dixebitin. Ji ber ku pavîke jî yê wan in, zevî jî. Li wir patron û axa ne mane.

### Jin ji xwe ra anîn

Elo îsal havînê zewicî. Elo jinek ji xwe ra anî.

### Dawî anîn

Me sibê da dest pê kir û heya êvarê dawîya kar anî.

Emê dawîya zordestiyê jî bînin.

*Kanîn ve xwestin* yardımçı fiilleri

Hesen	dixwaze	ji xwe ra cotek sol	bikire		
Özne		Y.fiiil		tümleç	esas fiil

Toxtor	dikanin	nexweşan xweş bikin			
Özne		Y.fiiil		tümleç	esas fiil

### Örnekler:

-Tu dikaniê bersîva van pirsan bidî?

- Belê ez dikanim bidim.

- Meriv dikane ji çêmer derbas bibe?

- Na, av pir e.

- Tu dikaniê du kilo tirî di carê da bixwî?

- Nizanim, min ne cêribandîye.

Şahan dixwaze ji xwe ra jinekê bîne, lê qelen buha ye.

Ez dixwazim biçim Stembolê

## Ödev:

I. Her iki yardımcı fiil kullanarak beşer cümle yapın.

II. Bersîva pirsên jêrîn bidin:

- 1- Li gundê Gizanê çi heye?
- 2- Li hêla we jî ocaxa şêxan heye?
- 3- Gundî şêxan çawa dihesibînin?
- 4- Hûn jî bawerîya xwe bi hêkmeta şêxan tînin?
- 5- Şêxên Gizanê, bi nîjad xwe digihînin kê? Hûn çawa bawer dikin, gotina wan rast e, yan derew e?
- 6- Gora hikyatê, bapîrê wan çawa hatîye Kurdistanê?
- 7- Şêxên Gizanê çend bra ne? Mezinê wan kîjan e û bi çi karî mijûl dibe?
- 8- Li newala gundê Gizanê xiyar û temetêz kê veşartî bû?
- 9- Kê ew xiyar û temetêz ji şêx ra anî bû?
- 10- Li zivistanê hêşînayî di ku da dibin?
- 11- Mirîdên ku bona dîfina şêxê xwe tînin, jê ra çi tînin?
- 12- Şêx çawa hîn dibû ku mirîd jê ra çi xelat anîye? Di saya çi da?
- 13- Şêx bi rastî ji xeybê dizanin?
- 14- Şêxên ku dewlemend bûn, çi kirin?
- 15- Qonaxa şêxan çawa ye? Çend qat e, çawa germ dibe û bi çi tê ronî kirin?
- 16- Çima gundî di avakirina qonaxê û bêxçe da belaş xebitînin?
- 17- Di Medresa şêxan da kî dixwînin?
- 18- Qezenca medresê çi dibe?
- 19- Komkirina xelat û bêşên mirîdan bi destî kîjan brayî dibû?
- 20- Şêx Nûreddîn bi rayê kê tê hilbijartin?
- 21- Şêx ji gundîyan ra yar in, an neyar in?
- 22- Çima şêx û hukûmet yekîfî dikin?
- 23- Pezê şêxan kî xwedî dike?
- 24- Xewna şêx Tahir rast bû yan derew bû?
- 25- Çima gundî ji şêxan ditirsin?
- 26- Şêx aqlê xwe li çi digerînin?
- 27- Dawîya şêxan çawa wê bê?

## SAZBENDÊN BREMENÊ

Waxtekî li gundekî nêzikî Frankfurtê kereke pîr hebûye. Kerê ciwanîya xwe bi karên giran derbaz kirîye. Êzing kişandîye, bar birîye êş û anîye. Û roj hatîye pîr bûye, ji teqet ketîye. Xwedîyê wê gotîye "va kera pîr, êdî tiştêkî ra nebe. Ez çima ce û gîyê bidimê..." û ker kirîye der.

Kera beredayî ya pîr, ji bêbextîya gundî gelek qehirîye. Gotîye "Ez herim welatek din, ji xwe ra karekî bibînim.." Û derketîye rê. Li ser rê rastî seyekî hatîye. Se melûl melûl dimeşîye, wekî derdekî wî heye. Kerê silav lê kirîye, gotîye:

- Me û xêr dî, heval, çima usa difikirî, derdekî te heye?

- Xêr hatî silamet, gotîye seyî. Ez nefikirim kî bifikire! Xwedîyê min ez kirime der. Ez êdî kal bûme, nikanim wek berê birêm û bi dû guran bibezim. Duh ez di xewê da bûm, rovî kete pînê û koka mirîşkan anî. Xwedîyê min jî bi hêrs ket, du ço li min xistin û ez avêtim der. Nizanim ku niha şunda çi bikim?

Kerê gotîye:

- Ez jî wek te me. Xwedîyê min jî ez kirim der. Min jî terkî welat kir û diçim. Tu jî min ra were. Em biçin li welatekî sazbandîyê bikin.

Ew gotin li se xweş hatîye, xwe ra gotîye: "Ez ku li vira dimînim û ji birçîyan dimirim, kerê ra herim baştir e."

Herdu hevra bi rê ketine çûne. Di rê da rastî pisîngeke beredayî hatine. Silav lê kirine û pirsîne:

-Hevalê, tu li van çolan li çi digerî?

Pisîngê bi rûyekî poxzîn li wan vegerandîye:

- Ji ber ku ez êdî pîr bûme û nikanim mişkan bigrim, xwedîyê min ez kirim der. Got "ez çima badilhewa nîn bidim te!"

Herdu hevalan jê ra gotine:

- Em jî wek te ne. Xwedîyê me jî em kirin der. Niha em diçin ku li cîkî sazbandîyê bikin. Ku dixwazî tu jî bi me ra were.

Pisîng tev li wan bûye û hersê meşîne çûne. Di rê da rastî dîkekî hatine. Dîk li ser sergoyekî bi dengekî zirav bang dikirîye. Rêvingîyan jê pirsîne:

- Hevalo, derdekî te heye? Çima usa dikî qîrîn?

Dîk li wan vegerandîye:

- Ez ne qîrim, kî biqîre! Xwedîyê min qise dikir, min bihîst. Digot: "Êvarê mêvanê min tê. Vî dîkî şerjêkin û biqelînin.."

Hersê heval jê ra gotine:

- Ku usa ye, tu çima li benda mirina xwe disekinî? Em hersê jî diçin welatê xerîbîyê, ku sazbandîyê bikin. Tu jî me ra were.

Dîk şabûye û tev li wan bûye. Herçar heval meşîyane çûne. Nêzikî bajarê Bremenê ro çûye avan û dinya bûye tarî. Gotine, em şevê li vira derbaz bikin û sibê bi rê kevin...

Herçar heval jî birçî bûne. Sermê jî dest pê kirîye. Pisîngê gotîye:

-Tu dibê, li vê dorê em cîyekî nabînin ku tê da sitar bin û tiştêkî xwarinê bi dest xinîn?

Se gotîye:

-Bîhna goştê qelandî tê pozê min...

Li qiraxê daristanê malek hebûye û di pençirên wê da ronî xuya dikirîye. Nêzikî malê bûne, lê der û dora wê girtî bûye. Pençirên wê jî bilind bûne, ne dikanîne ku hundir da çî heye, çî tune bibînin. Se gotîye:

-Ku em derkevin ser piştê hev, dikanin hundir bibînin.

Bi gotina wî qayîl bûne û ker çûye li ber pençirê sekinîye. Se derkefiye piştê wê. Pisîng hilkişîye piştê se û dîk jî li piştê pisîngê hêwirîye. Hingê dik, di hundir da çî heye eşkere dîfiye. Di hundir da sê kes li dora sifrekî rûniştine, bi kêf dixwarine. Sifre bi goşt, sawar, hêşinayî û fêkî tijî bûye. Di şûşan da şeravên sor û spi hebûne.

Kerê, bê sebr, pirsîye:

-Tu li hundir çî dibîni?

Dîk gotîye:

-Deqqekî sebir bike!

Hingê merivên dor sifrê di nav xwe da xeber didane. Yekî ji yên din ra digotîye:

-Me dîsa dizîyek xweş kir. Xwedîyê malê pê ne hesîn.

Yê din gotîye:

- Mirîşkên qelandî jî qismetê me bûne!

Dîk hîn bûye ku ewê hundir diz in. Bi lez hatîye xwar û di hundir da çî ku dîfiye û bihîstîye ji hevalên xwe ra gotîye.

Sazbendên me rûniştine ji xwe ra planek çêkirine. Hemûyan dest pê kirine û sazê xwe kutane. Ker dizirîye, se direye, pisîng mirnaw dikirîye û dîk jî bang dikirîye...

Dizên hundir himber vê şematê xwe şaş kirine. Gotine: "Dor li me hat girtin!" Û bazdane der, ber bi daristanê revîyane. Ji malê gelek dûr sekinîne û bîhna xwe girtine.

Piştî çûna wan, sazbandên me ketine hundir, di ser sifrê da girtine. Têrî xwe xwarine û vexwarine. Piştê pisîng çûye di pêxêrîgê da, ser xwelîya germ glor bûye. Se li ber dêrî vezelîyaye. Ker li tûrtê dirêj bûye û dîk jî derkefiye ser xênî. Ji ber ku gelek westîyayî bûne, çire vemirandine û hema di xew da çûne...

Bila ew li wir razên, em bêne cem dizan. Wana dîtine ku li malê çire hat vemirandin, di nav xwe da qise kirine, gotine: "Yek biçe binêre baş e. Li malê çî bû, çî ne bû?"

Hevalekî xwe şandine. Meriv hatîye, ji dêrî bêdeng derbaz bûye, ketîye hundir. Kesî xuya ne dikirîye. Di pixêrîgê da çevên pisîngê ronî didaye. Diz bi xwe û xwe gotîye: "Xuyaye agir venemirîye, ezê cixara xwe vêxim.." Û nêzî pixêrîgê bûye. Lê çawa destê xwe dirêj kirîye, pisîngê pencê xwe avêfiye. Diz jî tirsan gotîye "eman!" û ber bi dêrî bazdaye. Bi qîrîna wî hemû sazbandên me hişyar bûne. Di dêrî da se pê girtîye. Di tûrtê da kerê bi pîhnên xurt lê daye. Dîk jî li ser xênî kirîye qîre-qîr.

Meriv, çîqa jê hatîye revîyaye heya cem hevalên xwe. Ewana bi mereq jê pirsîne:

-Çî bû, çî di ser te da hat?

- Qe mepirsin! Gotîye meriv. Cinan di ser min da girtin. Cinê pixêrîgê hindik ne ma çavê min derxe. Yê ber dêrî ez kêr kirim. Yê tûrtê du çî li piştê min xistin, hindik nema piştê min bişkê. Dîsa jî ez rind xilas bûm. Yekî jî li ser xênî gazî dikir, digot: "Bernedin, heya ez bêmin!.."

Tirs jû xof ketîye dilê dizan, Bawerî pê anîne ku cinan di ser malê da girtine. Wê rojê şûnda cardin nêzîkî vê malê ne bûne. Mala terikî ji herçar hevalan ra maye û wana gora dilê xwe bi serfirazî li wê derê jîne..

Wextekî	: Bir zamanlar
Pîr	: Ya şli
Ciwanî	: Gençlik
Teqet	: Takat
Der kirin	: Kovmak
Beredayî	: Ba ş boş
Bêbext	: Kalle ş, nankör
Qehirîn	: Kizmak
Melûl	: Üzgün
Silav lê kirin	: Selam vermek
Kal	: Ya şli
Reyîn	: Havlamak
Dû	: Arka, gerî, kuyruk
dû ketin	: çzlemek, kovalamak
Dûra	: Sonra
Pîn	: Kümes
Hêrs ketin	: Öfkelenmek
Terk kirin	: Terketmek
Lê xweş hatin	: Hoşuna gitmek
Poxzîn	: Üzgün, kederli
Mişk	: Fare
Badilhewa	: Boşuna
Dîk	: Horoz
Rêvingî	: Yolcu
Sergo	: Gübre yığını
Zirav	: nce
Bang kirin	: Ötmek, çağırmaq
Qise kirin	: Konuşmak
Şerjê kirin	: Kesmek, boğazlamak
Xerîb	: Yabancı
Welatê xerîbîyê	: Gurbet
Sazbend	: Çalgıcı
Sitar	: Korunak, barınak
Sitar bûn	: Barınmak
Qelandin	: Kavurmak
Qelandî	: Kızartılmış
Benda yekî	: Kirini beklemek
sekinîn	
Qirax	: Kıyı, kenar
Girtî	: Kapalı
Hilkişîn	: Tırmanmak
Hêwirîn	: Konmak (kuş)
Eşkere	: Açıkça
Sawar	: Bulgur pilavı



Şûşe	: Şişe
Şerav	: Şarap
Bê sebr	: Sabırsız
Deqqe	: Dakika
Xeberdan	: Konuşmak
Pê hesîn	: Farkına varmak
Plan	: Plan
Pixêrîg	: Baca
Xanî	: Ev
Tûrt	: Avlu
Derxistin	: Çıkarmak
Glor	: Toparlamak
Saz	: Çalgı
Saz kutan	: Saz çalmak
Sazbend	: Çalgıcı
Zirîn	: Zırlamak
Mirnav	: Miyavlamak
kirin	
Şemate	: Şamata, gürültü
Xwe şaş	: Şaşmak
kirin	
Dor lê girtin	: Kuşatmak
Vemirandin	: Söndürmek
Agir	: Ateş
Vêxistin	: Yakmak, tutuşturmak
Penc	: Pençe
Pê girtin	: Tutmak, yakalamak, ısırma
Pîhn	: Tekme
Bîhn girtin	: Soluk almak
Cin	: Cin
Di ser da	: Baskın
girtin	
Serfirazî	: Başarı
Vezelîn	: Uzanmak

## Şimdiki zamanın rivayeti

### 1- Geçişli fiillerde

a) Sesli harflerle biten fiillerde:

Örnek: *Dan*

Kök: *Da*

**Ön ek**

**Takı**

Min didaye

di

ye

Te didaye

di

ye

Wî,wê didaye	di		ye
Me didaye	di		ye
We didaye	di		ye
Wan didaye		di	ye

b) Sesiz harfle biten fiillerde:

Örnek: **Kirin**

Kök: **Kir**

**Ön ek**

	<b>takı</b>		
Min dikirîye (yapıyomuşum)		di	îye
Te	"		"
	"		"
Wî	"		"
	"		"
Wê	"		"
	"		"
Me	"		"
	"		"
We	"		"
	"		"
Wan	"		"
	"		"

2- Geç işsiz fiillerde

Örnek: **Çûn**

Kök: **Çû**

**Ön ek**

	<b>takı</b>		
Ez diçûme (gidiyomuşum)		di	me
Tu diçûyî			
	yî		
Ew diçûye		di	
	ye		
Em diçûne		di	
	ne		
Hûn diçûne			di
	ne		
Ew diçûne		di	
	ne		

**Ödev I-** Aşağıdaki fiillerin şimdiki zamanının hikayesini ve rivayetini çekiniz.

*Xwarin, lê xistin, dizîn, hatin, bûn, kirîn, ketin, anin*

Örnek: *Xwarin*

Şimdiki zamanın hikayesi

Şimdiki zamanın rivayeti

Min dixwar  
Te dixwar  
Wî, wê dixwar  
Me dixwar  
We dixwar  
Wan dixwar

Min dixwarîye  
Te dixwarîye  
Wî, wê dixwarîye  
Me dixwarîye  
We dixwarîye  
Wan dixwarîye

Not: Geçişli fiillerin (min, te, wî, wê, me, we, wan) geçişsiz fiillerin ise (ez, tu ew, em, hûn, ew) grubu zamirlerle çekildiğini hatırlayalım.

### Ödev II- Aynı fiillerin;

- Diî geçmiş zamanının,
- Diî geçmişin hikayesinin,
- Mişli geçmiş zamanının çekimini yapınız.

Örnek: Ketin

**a**

Ez ketim (düşüm)  
Tu kefi  
Ew ket  
Em ketin  
Hûn ketin  
Ew ketin

**b**

Ez keti bûm l(düşmüştüm)  
Tu keti bûyî  
Ew keti bû  
Em keti bûn  
Hûn keti bûn  
Ew keti bûn

**c**

Ez ketime (düşmüştüm)  
Tu kefiyî  
Ew kefiye  
Em ketine  
Hûn ketine  
Ew ketine

### (î) eki ile sıfat türetmek

Kürtçede isim ve fiillere î eki getirilerek sıfat türetilir.

terikîn (terk etmek) : Terikî (terk edilmiş)  
Av (su) : Avî (sulu)  
Girtin (tutuklamak) : Girtî (tutuklu, kapalı)  
Berdan (Bırakmak) : Berdayî (salınmış, ba şbo ş)  
Xerîb (yabancı, garip) : Xerîbî (yabancılık, gariplik)  
Ve şartin (saklamak) : Ve şartî (saklı)

### Silav lê kirin

Meriv gava hev û du dibîne, silavê li hev û du dike. Kurd, gava silavê li yekî dikin, jê ra dibêjin:

- Me û xêr dî!  
Ewî ku silavê distîne jî usa lê vedigerîne:  
- Xêr hatî silamet!  
Herçê xwendî jî hev û du ra "rojbaş" dibêjin...  
Heke êvarê ji hev û du vediqetin, dibêjin "şevbaş!"

### **Li benda yekî sekinîn - Li benda yekî bûn**

- Du êvarê ez li benda te bûm, çima ne hatî?  
- Mêvanê min hat, êdî ji mal derneketim.  
Rêvingîyan ji dîk ra gotin: "Tu çima li benda mirinê disekinî?"

### **Lê xweş hatin**

Gava em behsa azadîyê dikin, li hukumeta Tirk xweş nayê.  
Stranên me pir li min xweş tên.

## **KERA PÎR**

Kalekî li kera xwe sîyar bû, diçû  
Li cîyekî mêrg û avî sekinî,  
Hefsar ji ser derxist, berda mêrgê.  
Kera reş dev kir nav gîyayên ter  
Berekî va dixwar, berekî va distrand,  
Raza, rabû, xwe xurand,  
Gevz da, pîhn avêt têrî xwe.  
Kêf kêfa wê...  
Lê nişkava  
Ji himber ser wan da qol hat.  
-Mesekin, em birevin! got kalo.  
-Çima? Got guhdirêj;  
Ewî ku tê du palanan li min dixê,  
Çar çalan li min bardike?  
- Na, bar nake, digot kalo û direvîya...  
- Ku usa ne, jî min ra çî, got kera reş;  
Ha ya te bim, ha ya wî.  
Tu birev, gora min mêrg delal û xweş!  
Him jî ger tu dixwazî,  
Te ra bêjim Kurmancî:  
Kî ye xwedîyê min  
Ew e dijminê min.

## **LA FONTA·NE**

Hefsar : Yular  
Ter : Taze (ot için)  
Berekî va : Bir yandan  
Strandin : Türkü söylemek

Xurandin	: Kaşınmak
Gezdan	: Debelenmek
Nişkava	: Ansızın
Qol	: Çete, eşkiya
Guhdirêj	: Uzunkulak
Palan	: Semer
Çal	: Çuval
Ger	: Eđer

## XXV

### MEYRO

Meyro jineke Kurd e, sîh û pênc salinîye, li gundekî Qerejdaxê dijî. Meyro bî ye. Mêrê wê, Ezo pênc salan berê mir. Ezo gundîyek bê milk bû. Di vir û wê da xebîfî; roj bû, pezê xelkê çêrand û roj bû çû li Edenê pembu kom kir. Hevalên wî diçûn bin xetê dihatin. Ezo jî tev li wan bû. Ewana hin caran bi kirê pezê dewlemendan derbazî wî alî dikirin û hin caran diçûn ji wî alî bona frotinê tişt û tore danîn: Cixarên bîyanî, îbrîşim û hwd.. Karê wan gelek bi xeter bû. Li dora xetê mayîn rawestî ye û qereqol mîna bendê morîyan bi dû hev dirêj dibin, cendirme dikelin. Şev tune ku li ser xetê tîfing ne teqin, di nav zevîyê mayînan da mirî dirêj ne bin.

Kîngê Ezo bona qaçaxê ji mal dûrdiket dilê Meyro teng dibû, çavê wê li rê diman. Rojekî xebera xirab gihîşte mal. Ew û çend hevalên xwe keti bûn dafika cendirman û hatibûn lêxistin.

Zabitên ser sînor pir caran ji xelkê berfîl distînin û dihêlin ku derbazî wî alî bin. Zabit bi vî awayî di demek kurt da dibin dewlemend. Lê hin caran karên merivan rast naçe. Zabit him pere distîne, him jî alîkarî nake. Hin zabit jî dijminê Kurdan in, li xirabîya wan digerin.

Gotin, di mabeyna wan û cendirme da şer çêbûye. Çawîşek hatîye kuştin. Ji qaçxaxçîyan jî sê mirî û çend hew jî birîndar... Gundî ji tirsan ji mirîyan ra xwedî derneketin. Meyîtên wan di zevîyên mayînan da man, bîhn û bex kete wan, teyr û tûran ew xwarin.

Meyro, cendekê mêrê xwe ne dît. Û gora wî jî tune..

Wexta mirina Ezo bi navê Zeyno û Ehmo du zaroyên wan hebû û Meyro nexweşa zaroyan bû. Çar meh şunda kurek anî dinê û navê wî jî Çeto danîn. Piştî mirina mêrê xwe Meyro cardin mêr ne kir û li ser zaroyên xwe ma. Ewana gelek zehmet kişandin. Meyro bona ku zaroyên xwe birçî û tazî nehêle şev û roj xebîfî. Pez xwedî kir, karê xelkê kir, teşî bada, merş, gore û lepik çêkirin.

Zeyno û Ehmo jî sal bi sal mezin bûn û alîkariya wê kirin.

Zeyno, îsal ket panzdeh salî. Niha wê dixwazin, ewê heya salekî du salê din mêr bike. Ehmo jî kete yanzdeh salî. Ew diçe dibistana gund û di sinifa çaran da ye.. Bavê wî bê xwandin bû û pir dixwast ku xwendin û nîvisandin bizanîya.

Digot: "Ezê Ehmo bidim xwendinê. Em nezan man, qe nebe bila ew bixwîne, bibe meriv. Heke ez xwendî bûma, minê xwe ra karek baş bidîta û em ji vê rezîlîyê xilas bibûna."

Dersdara gund jî keçik e. Navê wê Seyran e. Jinên gund berê ecêb man, gotin "Çawa keçikek dikare dersdarîyê bike?" Seyranê ji wan ra got: "Çima, hûn tevî mêrên xwe hemû karan nakin? Hûn dasê diçinin, kulbe dikin, berfa xênî dimalin, hemû karên giran dikin. Li bajarên jin hemû karên mêra dikin. Ji wan toxtor, mihendîz hene. Aqlê jinan ji yê mêran ne kêmtir e. Jinan guh dane wê û gotin "rast e, wekî gotina Seyranê ye".

Meyro, car caran diçe cem Seyranê, hal û rewşa kurê xwe li dibistanê çawa ye, jê dipirse û hevra rûdinin mihbetê dikin. Seyran behsa bajarên û rewşa dinê dike. Wê bajarên mezin dîtiye û gele tiştan dizane. Gele pirtûkên wê hene, tim dixwîne û li dinê çî dibe, çî nabe hîn dibe.

Seyran dibêje ku, welatê me gelek paşda ma ye, welatên xelkê zehf pêşva çûne. Li wan deran axatî, şêxtî, eşîrtî ne maye. Gundî ji bend û qeydên hanî kevnare rizgar bûne. Jin jî wek mêran azad in. Mêr nikarin li jinan xinin, mêr û jin ji hev û du ra wek heval in. Seyran dibêje, li wan deran rê û olax gelek zehf in. Her derê trê, teyare, keştî û otoboz tê û diçe. Malên wan fireh in, bilind in, ronak in, germ in. Kes ji birçîyan namire, kes pêxas nine. Meriv têrî xwe dixwin û li xwe dikin. Li wan deran cendirme li gundîyan tedayê nakin.

Seyran behsa welatên sosyalîst dike. Dibêje di wan welatan da şoreş çêbûye, ango karker, gundî û hemû bindest rabûne ser pîyan, sazûmana axan û mîran, sazûmana dewlemendan hilweşandine, dawîya zordestîyê anîne. Ji xwe ra sazûmanek nû çêkirine. Êdî li welatên sosyalîst tu zordestî, tu kedxwarî ne maye. Hemû gundî bûne xudan erd. Li welatên sosyalîst birçîyî û betalî, tirs û xof ne maye. Dijminahî, dizî, her texfît xirabî rabûye, meriv ji hev û du ra bûne wek xwîşk û bra.

Gora ku Seyran qal dike, Meyro xwe û xwe dibêje: "Ew dezgeyê han wek bihûşt e! Çî dibû, li welatê me jî dezgeyek han çêbûya.."

Seyran dibêje: "Belê welatê me jî rojekî wê usa bibe. Kîngê ku karker û gundî hişyar bûn, dest dan hev û yekîfî çêkirin.. Hingê ew dikarin zora zordestan bibin, welat ji bin nîrê dijminan xilas kin, kolonyalîstan bikin der, dawîya axatî û şêxtîyê bînin û dezgeyek nu serrast kin.."

Meyro jî bîr û bawerîya xwe bi gotina wê fîne, hêvî dike û li benda rojên usa xwe şîşekine ...

Qerejdax : *Karacadağ*

Bî : *Dul*

Xet : *Hat (Suriye sınıırı)*

Derbaz kirin : *Geçirmek*

Tişt û tore : *Eşya, çeşitli şeyler*

Biyânî : *Yabancı*

Xeter : *Tehlike*

Mayin : *Mayin*

Raxistî : *Döşenmiş*

Qereqol : *Karakol*

Bend : *ip*

Morî : Boncuk  
Kelîn : Kaynamak  
Mirî : Ölü  
Qaçax : Kaçak  
Çav li rê : Gözü yolda  
Dafik : Tuzak  
Sînor : Sınır  
Berfil : Rüşvet  
Rast çûn (kar): için yolunda gitmesi  
Çawîş : Çavuş  
Brîn : Yara  
Brîndar : Yaralı  
Meyîf : Ölü  
Bîhn û bex : Kokma, çürüme  
ketin  
Teyr û tûr : Kurt-kuş anlamında  
Cendek : Ceset  
Gor : Mezar  
Nexweşa : Hamile  
zaroyan  
Nav danîn : Ad vermek  
Mêr kirin : Evlenmek (kadınlar için)  
Teşî : iğ  
Badan : Bükme  
Teşî badan: iğ eğirmek  
Merş : Killim  
Lepik : Eldivan  
Xwezî : Keşke  
Ecêb man : Hayret etmek  
Das : Orak  
Das çinîn : Ekin biçmek  
Kulbe : Çapa  
Mihendiz : Mühendis  
Guh dan : Dinlemek  
Mihbet : Sohbet  
Paşda manGeri kalmak  
Pêşva çûn : İleri gitmek, gelişme  
Qeyd : Engel, bağ  
Kevnare : İkel  
Otoboz : Otobüs  
Keşî : Vapur  
Teyare : Uçak  
Pêxas : Yalınayak, Lumpen  
Derman : ilaç  
Rabûn ser : Ayaklanma  
pîyan  
Sazûman : Düzen  
Hilweşandin: Yıkma

Kedxwarî	: Sömürü
Zordestî	: Zorbalk
Betalî	: İşsizlik
Xof	: Korku
Qal kirin	: Bahsetmek
Bihûşt	: Cennet
Dezge	: Düzen
Yekîfî	: Birlik
Zor birin	: Üstün gelmek
Nîr	: Boyundruk
Bîr û bawerî:	(nanç, görüş)
Hêvî	: Umut

### **Bersîvên pirsên jêrîn bidin:**

- 1- Meyro kî ye?
- 2- Ezo çi kar dikir?
- 3- Ezo çima diçû bin xetê?
- 4- Çima karê wan bi xeter bû?
- 5- Ezo û hevalên xwe ketin dafika kê?
- 6- Çima gundî ji mirîyên xwe ra xwedî derneketin?
- 7- Cendekê mirîyan çi bûn?
- 8- Navê zaroyên Ezo û Meyro çi ne?
- 9- Çeto kîngê hate dinê?
- 10- Piçfî mirîna mêrê xwe Meyro çima nu va mêr ne kir?
- 11- Meyro bona çi şev û roj dixebifî?
- 12- Meyro çi kar dikir?
- 13- Ezo bo xwendinê, çi digot?
- 14- Jinên gund çima bi dersdarîya Seyranê ecêb man?
- 15- Seyranê ji wan ra çi got?
- 16- Seyran çima pirtûkan dixwîne?
- 17- Seyran derheqa welat ta çi dibêje?
- 18- Welatê me çima paşda maye?
- 19- Bona rizgarîya welat çi lazim e?
- 20- Şoreş çawa dibe?
- 21- Li welatên sosyalîst zordestî û kedxwarî heye?
- 22- Li welatên sosyalîst birçifî û betalî heye?
- 23- Li welatên sosyalîst tirs û xof heye? Cenderme li gundiyan, polêz li bajarîyan tedayê dike?
- 24- Meyro, bo welatên sosyalîst çi digot?
- 25- Welatê me çawa wê xilas bibe? Bona wê divê karker û gundî çi bikin?

### **Dilek kipinin hikayesi**

Ezo pir dixwest ku xwendin û nivîsandin *bizanîya*.  
Xwezî mêrê Meyro xweş *bûya*, ew yek bi çavê xwe bidîta.



## Geçişli fiillerde

a) Son harf sessiz ise fiil (**a**) takısı alır.

Örnek: 1- Dîtin Kök: **Dî**  
2- Kirin Kök: **Kir**

Min bidîta  
Te bidîta  
Wî, wê bidîta  
Me bidîta  
We bidîta  
Wan bidîta

Min bikira  
Te bikira  
Wî, wê bikira  
Me bikira  
We bikira  
Wan bikira

b) Son harf sesli ise fiil (ya) takısı alır.

Örnek: 1- Dan Kök: **Da**  
2- Zanîn Kök: **Zanî**

Min bidaya  
Te bidaya  
Wî, wê bidaya  
Me bidaya  
We bidaya  
Wan bidaya

Min bizanîya  
Te bizanîya  
Wî, wê bizanîya  
Me bizanîya  
We bizanîya  
Wan bizanîya

## Geçişsiz fiillerde

Son harfi sesli ise fiil şahıslara göre, sıra ile (**ma, ya, ya, na, na, na**) takılarını alır.

Örnek: 1- Bûn Kök: **Bû**  
2- Çûn Kök: **Çû**

Ez bibûma  
Tu bibûya  
Ew bibûya  
Em bibûna  
Hûn bibûna

Ez biçûma  
Tu biçûya  
Ew biçûya  
Em biçûna  
Hûn

biçûna

Ew bibûna

Ew biçûna

Son harf sesiz ise takı (a) ile başlar: Ama, aya, ana...

Örnek: *Hatin, hat*

Ez bihatama  
Tu bihataya  
Ew bihataya

Em bihatana  
Hûn bihatana  
Ew bihatana

### Şart kipinin hikayesi

Heke ez xwendî bûma, emê ji vê rezîfîyê xilas bûna.

Kürtçe de şart kipinin hikayesinin birden çok biçimi var.

1- Ştek kipiye ku, heke, ger gibi şart bildirir sözcükler eklenerek:

Heke ez biçûma- Gitseydim

Ku ez bûma- Ben olsaydım

Ger tu nehata- Gelmeseydin

2- Ez xwendî bûma- Okumuş olsaydım (okusaydım)

Tu kefî bûya- Düşseydin

Ew kirî bûya- Yapsaydı

3- Şahıs zamirlerine eklenen gelecek zaman takısının (ê) yardımıyla yapılır.

Ezê biçûma- Gidecektim

Hûnê bihatan- Gelecektiniz

Emê xilas bûna- Kurtulacaktık

Roja şemîyê ezê biçûma Diyarbekerê, lê perê min tune bû.

Minê xwendina Kurdî bizanîya, lê di gundê me da dibistana Kurdî tune bû.

Heke welat û milletê me azad bûya, emê usa xizan û nezan nemana.